Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê "Tirkiye û tercîhên welatên rojava" ('94) û ji Jean-François Pérouse "Xaka şewitandî ya Kurdistanê" ('95) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Sibat 2012 - Hejmar 27 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Josef Sassoon**
Gelo Beşar Esad dê bikaribe rejîma xwe ji krîzê derxe, yan ewê jî serî li dek û dolabên din bide da ku li ser pîyan bimîne û paşê lê hay bibe ku wek Sedam Husên hesabên pûç kirine?
▶ R. 5

**Anne Dufresne**
YE, bi boneya krîza aborî dixwaze êdî li ser dewletên endam siyaseta alman a mûçeyên kêm ferz bike. Gelo li hember vê yekê daxwazên reformîst û yên radîkal ên civakên ewropî çi ne?
▶ R. 6

**Navid Hassanpour**
Gelo di şoreşa Misirê de *Facebook, Twitter û Google*ê roleke çawa leyistin û hîn dileyizin? Argumenta "Heger dixwazî civakekê azad bikî, hema Înternetê bide wan" çiqas rast e?
▶ R. 14

**Felix Stalder**
Salên derbasbûyî li ser navê azadîya xwe derbirînê û dadmendîya civakî li dij şirketên navnetewî û hikûmetan bi bikaranîna remza "Anonymous" erişên dîjîtal ên bi bandor pêk hatin…
▶ R. 19

**Aurelien Barrau**
Kozmolojî zanisteke tevahîya gerdûnê ye ku hewl dide kozmozê ji destpêka wê heta dawîya wê, heger tiştekî wisa hebe, terîf bike. Ango ketiye dû serpêhatîya "vesazîya gerdûnê"…
▶ R. 20

LÊBORÎNA DÊRSIMÊ, KOMKUJÎYA ROBOZKÊ...

# Rûdanên dawî li Kurdistanê

ISMAIL BEŞIKÇI

Di vê nivîsa xwe de ez dê hewlê bidim behsa pêvajoyên civakî û siyasî bikim, ku di van mehên dawîyê de rû dan. Ez dê li ser sê pêvajoyan rawestim. Gengeşîyên li ser Dêrsimê, lêborîna ji bo Dêrsimê, qanûna li ser nijadkujîya ermenîyan ku li parlamentoya Fransayê hat pejirandin û li Qilabanê komkujîya Robozkê.

## 1. Gengeşîyên li ser Dêrsimê û daxwaza lêborînê

Pişavtina kurdan tirkkirin ji destpêka komarê re bû polîtîkayeke girîng a dewletê. Ev polîtîkaya ku bi Îttîhad û Teraqqîyê re dest pê kiribû, piştî komarê bi awayekî sîstematîktir hat sepandin. Mebesta rast a **Teza Dîroka Tirkan** *(li gor vê tezê nijada hemû rengsipîyan ji Asya Navîn yanê ji welatê tirkan tê-redaksîyon)* û **Teorîya Zimanê Rojê** *(li gor tirkan teorîya kana zimanan e ku mebest jê tirkî bingeha hemû zimanan e-redaksîyon)*, ku di salên 1930ê de hatin bi lêv kirin, meşrûkirina vê pişavtinê bû. Di vê serdemê de gelek raporên li ser pêwîstîya pişavtinê hatin amade kirin. Ev bêhtir raporên nepenî bûn. Di van raporan de herweha planên bi detay jî hatin danîn ka ew pêşnîyar çawa werin sepandin. Ji alîyê rayedarên dewlet û hikûmetê ve gelek caran hat bi lêv kirin ku li dijî kesên ku li hember asîmîlasyonê li ber xwe bidin; an ku wekî kurd bimînin, dê her cure zext û zor bihataya bi kar anîn.

***Di warê gengeşîyên li ser Dêrsimê de, hin dêrsimî dibêjin 'zext û zora ku li Dêrsimê hat meşandin ji bo tunekirina elewîtîyê bû.' Herweha hin ji wan kesan ku behsa Dêrsimê dikin, belgefîlman çêdikin bi zanîn hewlê didin ku navê "kurd" bi kar neynin...***

Komkujîya kurdan ya di 1937-1938ê de li Dêrsîmê rû da, divê di vê çarçoveyê de were nirxandin. Dersimî kurd û qizilbaş (elewî) bûn. Di pişavtina kurdan de diviyabû kurdên qizilbaş bibûna misilman jî; lewma kurdên elewî tûşî du awa pişavtinê bûn.

Di warê gengeşîyên li ser Dêrsimê de, hin dêrsimî dibêjin 'zext û zora ku li Dêrsimê hat meşandin ji bo tunekirina elewîtîyê bû.' Herweha hin ji wan kesan ku behsa Dêrsimê dikin, belgefîlman çêdikin bi zanîn hewlê didin ku navê "kurd" bi kar neynin. Ew zordestîya li hember bawerîya elewîtîyê derdixin pêş. Ev yek têgihiştineke rast nîne. Ji ber ku li Dêrsimê piştî 1937-1938ê gelek kes hatin mişext kirin jî. Ên ku ji qirkirinê filitîn, bo bajarên wekî Çorum, Tokat, Balıkesir, Aydın, Denizli û Mereşê hatin sirgûn kirin. Lê belê li van bajaran jixwe qizilbaş (elewî) dijîyan. Heger mebesta zext û zorê tunekirina elewîtîyê bûya, kurdên elewî yên ji Dêrsimê dê bişandana van bajaran yên ku elewî lê dijîn? Ji alîyê din de jî, azîneyek ku dixwest elewîtîyê tune bike dê bi tenê li Dêrsimê pêk bihataya? Gelo li deverên din ên Anatolyayê, ku elewî lê dijîn, kiryarên bi vî rengî jî nehatana meşandin? Mebesta sereke ya wan operasyonan helbet tunekirina kurdîtîyê bû. Operasyonên wekî vê yekê li herêmên din ên kurdan jî hatibûn meşandin. Dêrsim mabû dora dawîyê.

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

DÎROK DIJÎ

# Hewldana çareserîya dîrokê ji bo lihevhatin û demokratîzekirinê

PROF. DR. ILHAN KIZILHAN

Şideta bi motîvasyona siyasî, bi gelek formên cuda, li her deverên cîhanê derdikeve holê. Îşkence, kujerî û şerên ku ji alîyê dewletê organîzekirî, her diçe hîn zêdetir dijberî beşên gelê sîvîl pêk tên, jîyana gelek mirovan bi dawî tê. Kesên ji taqîbatên bi vî awayî ku hîn li jîyanê mane û nifşên piştî wan, hîn piştre, bi piranî piştî gelek salên din jî, di bin bandora fîzîkî û derûnî ya (psîkolojîk) şidetê de êşê dikşşînin. Rewşeke gelemperî ya tirsnak û çavtirsandî dikare di dewletên bi vî awayî de bibe gumanbarîya têkilîya nav mirovan. Dezgehên dewletê wek metirsî û tehdîd tevlî jîyanê dibin. Li ba pirsgirêkên etnîk ên mîna kurdan li Tirkiyeyê, di navbera komikên etnîk de berjewendî û cihêtî derdikevin û ew birêvebirina pêvajoya aştîyekê dijwar dike, welew ku bi gelemperî daxwazeke polîtîk di vî warî de hebe jî.

Ji damezirandina Tirkiyeyê û pê ve, mirov dikare behsa şideteke motîvekirî ya siyasî di gelek beşên cuda de li dijî gelê kurd ê sîvîl bike (hêrişa rasterast a leşkerî, girtin û îşkencekirina sîstematîk a çalakvanên siyasî, xirabkirina gund û zevîyan, rev, koçbarîya bi zorê, dîskrîmînasyona etnîk bi rêya qedexekirina çand û zimanê kurdî ûwd.). Van tecrûbeyan li ba kesên di jîyanê de mayî, ne bi tenê êşeke tund a gîyanî peyda kir, herwiha derizandina civakê û înkara komikên etnîk û dînî jî; helbet dervayê yên tirk û sunî. Di têkilî û pêwendîyên fermî de mijara kurdan di nav raya giştî ya tirkî de, wek mijareke cihêxwazî û terorîzm hat gengeşî kirin. Mirov, kurd an tirk, li ser hebûna kurdan û li ser arîşeyên wan ên şexsî û kolektîv nedipeyivîn. Peyivandin û hewldana çareserîya li ser van bûyerên zextbar ên rabirdû, îro jî hîn gelek sînorkirî pêk tê *(Kizilhan, 2008)*, mîna ku pirsa ermenîyan û gengeşîya Dêrsîmê jî vê yekê şanî dide.



ZORO METTINI: **Ji Rojhilat heta Rojava**, kartona cîwarbûnê, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihev, 60 x 60 cm

## Neçareserîya dîrokê û encamên wê

Di gelek lêkolînan de mirov dikare analîza bîyografîyên mirovan, ên tecrubeyên şer, pêşveçûna şidetê û pê ve girêdayî trawmayên "hêsan" heta girift tesbît bike *(Kielson, 1979, Peltzer, 1999; Rasekh, Bauer, Manos & Iacopino, 1998; Somasundaram & Sivayokan, 1994)*.

Reaksîyoneke tîpîk a civakê li hember zordarîyên tund ên siyasî, veşartin û girîngîpênedana şidet û encamên wê ne. Di demên zordestîya siyasî de mirov dikare vê bêdengîyê fêhm bike, tehdîda berbiçav a rejîma serdest û leşkerî heta salên 90î û îro hîn jî, rewşa gelemperî di civaka kurdî de çavtirsandin e. Herçiqas em di salên dawî de derbarê mafên mirovan, hewldana demokratîzekirinê û axaftina eşkere li ser pirsa kurd li Tirkiyeyê, pêşketin bibînin jî, mexdûrên vê taqîbata dewletê yên hîn dijîn, ji vê yekê gelek kêm elaqe dibînin. Çareserîyeke bingehîn a rabirdûyê, mîna berê hîn jî, bi xilasbûna ji kirdaran ve girêdayî ye. Heta gelek siyasetmedar destpêkirina mijara demokratîzekirinekê, ji alîyê rabirdûya tawanbar ve di xeterê de dibînin. Li gor wan, birînên kevin dikarin civakê hîn bêhtir biderizînin, ev jî li ba kurdan tê wek maneya gumanbarî û hewldana ji nû ve înkarkirinê.

Mînak *Hamber* (2000) ê ku pêvajoya lihevhatinê li Afrîkaya Başûr a piştî dema nijadperestîyê analîz dike, wiha

▶ R. 4

www.arsivakurdi.org

*EDITO*

# Piştî Tobin

SERGE HALIMI

Di 1997ê de, rojnameya me fikra têkildarî baceke li ser livûtevgerên diravî têra xwe bi xwendevanên xwe re parve kir. (1) Ev livûtevgerên diravî hingê bi qasî panzdeh qatên hilberîna salane ya seranserê cîhanê bûn. Îro ew bûye tam heftê qat. Berî panzdeh salan kesî zêde behsa kredîyên *subprime* nedikir û xeyal jî nedikir ku wê krîzeke deynên dewletan li Ewrûpayê rû bide. Piranîya sosyalîstên ewropî, yên zêde di bin tesîra **Anthony Blair** de, bi navê "venûbûna diravî" sond dixwar. Li Dewletên Yekbûyî, serok **William Clinton** xwe amade dikir ku cesaretê bide bankayên bazirgan da ku ew jî bikevin nav karûbarê spekulasyona bi pereyên mişterîyên xwe. **Nicolas Sarkozy** jî li ber modela amerîkî gewî dibû û têr nedibû ji pesindana siyaseta (avis bi felaketeke li ber derî) Rezerva Federal. (2) Û ji xwe re xeyala kredîyên *subprime* ên alafranga dikir …

Bes e mirov bibêje ku di 1997ê de, baca **Tobin** nebû xebereke xweş: Hertişt pir baş dimeşiya! Wezîrê fransî yê aborî û diravan, **Dominique Strauss-Kahn**, ev cure bac bi carekê weke tiştekî pêkanîna wê nemumkin nirxand. Û Sarkozy jî ev nirxandina tûj kir: *"Mijara baca Tobin tiştekî tewş e* [...]. *Her cara ku em li afirandina dewlemendîyên li ser axa xwe cezayan dibirin, em afirandina dewlemendîyên li welatên din teşwîq dikin"*. (3) Û jixwe ew çawa bû serokê komarê, wî wezîra xwe ya aborîyê û diravan **Christine Lagarad**, bi rakirina Baca Borsayê wezîfedar kir. Gerînendeya giştî ya niha ya IMFê jî ew bi vî awayî teyîd kir: *"Ev tedbîr wê bike ku cazîbeya Parîsê weke navendeke diravî xurttir bibe"*. Wê ev hişyarî dikir: *"An na, bicihanîna rêzek fermanên ji deverên bîyanî yên ji zû ve bacên wisa ji holê rakiribûn* [wê pêk bihata]*"*. (4)

Ji hingê ve, bûyer bûn sedemê afirandina xemsarîyekê li cem berpirsîyarên siyasî yên ku hêvî dikirin ew ê bi werimandina bacan, ji "venûbûna diravî" qezenceke mezin bi dest bixin. Dewletan ji xeynî feydeyên hê jî têra xwe mezin bêyî ku berdêlekê ji wan bixwazin, banka rizgar kirin. Lê belê ji ber ku ti biryarek li dijî diravê nehatiye wergirtin, kî li dijî "qral dirav" dengê xwe hindikî derxe, ew ê bi ser bikeve. Li Amerîkayê, namzedên komarger ên zêde kevneperest jî niha *"laşxurên" **Wall Street** yên ku "dest datînin ser hemû pereyê şirketa we, we li iflasê dixin û bi mîlyonan bi xwe re dibin"* rexne dikin.

Îca, wê zêde ne surprîz be ku çar meh berîya bidawîbûna wezîfa xwe, **Sarkozy** îdîa bike ku *"ew ê finansê bide bi kar anîn ji bo dabînkirin û telafîkirina zirarên ku finans bûye sedem"*. Wê di bîra wî de nemabe *"tewşîya"* baceke pala xwe dide livûtevgerên diravî; û ji hişê wî firiyabe xetereya ku li welatên bîyanî hêkên zêrîn ên spekulasyonê çîçikan derînin.

Em ê jî karibin têr bibin, ji qewlê aborîzan **James** ve, bi *"qûmavêtina nav tekerên finansê"*. Lê belê, madem êdî rewşeke berbiçav e ku finans tê wateya temsîla şênîyeke mezin û jîyanî ku hîsedarên wê dikarin kollektîvîteyê bikin rehîne, divê em jî bi pêş ve gav bavêjin. Û bixwazin ku banka êdî nebin aîdî berjewendîyên arizî...

1 Binêre li nivîsa Ibrahim Warde, ya bi navê "Projeya bacê ya Tobin, xewnereşka spekulatoran", û ya Ignacio Ramonet, ya bi navê "Bêçek-kirina bazaran", *Le Monde diplomatique*, ya pêşî di sibata 1997 û ya din jî di kanûna 1997ê de hatin weşandin

2 Ji rojnameya Les Echos a roja 23yê hezîrana 2004ê re ew wiha rave dike: "*Eger min ji xwe re kesek kiribaya nimûne, ev ê Alan Greenspan bûya. Ew hertim bi serwextî û nefsbiçûkî tevgeriya*"

3 France 2, 7 hezîran 1999

4 Guftûgoya li Senatoyê, 23 mijdar 2007

Wergera ji fransî: Baran Nebar

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal


**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris, France



# JI ÇAPEMENÎYÊ



## Erdogan, edalet û dewleta hiqûqê

Rojnameya karsazîyê ya brîtanî Financial Times roja 11ê çileya paşîn di serenivîsa xwe de cih da helwesta serokwezîrê tirk Recep Tayyip Erdoğan û prensîpa dewleta huquqê. Rojname şiroveyeke balkêş dike û dibêje 'serokê Tirkîyeyê her ku diçe dibe rêveberîyeke otorîter.' Herweha tê nivîsandin ji roja ku Erdoğan hatiye ser kar, wî pêşengîya demokrasîyeke vekirî û lîberal kiriye, lê belê wekî ku raporên dawî yên Konseya Ewropayê radigihîne, ev pêşveçûn niha rawestiyaye. FT wekî din dîyar dike ku rapora Konseyê gavên ku Erdoğan di warê rêzgirtina mafên mirovan de avêtine, nabîne. Hevdem dilxwazîya Tirkîyeyê ya ji bo endametîya Yekîtîya Ewropayê qels dibe û Tirkîye her ku diçe nîşaneyên rejîmeke otorîter dide. Rojname bi bîr dixe ku li Tirkîyeyê zêdeyî 100 rojnameger di girtîgehê de ne û weha dirêjahî pê dide: "Divê Erdoğan soza xwe ya destûreke nû, ku ji mêj ve ye tê payîn, bi cih bîne û di destûra nû de tenê cih bide mafê xwe derbirînê û azadîyên din, lê belê mafên hindikahîya kurdan jî ewle bike".

Di gotarê de tê gotin ku Erdoğan ji ber kuştina 13 hezar kurdan a salên 1930ê lêbûrîn xwestiye, ku heta niha serokekî tirk nexwestibû, lê belê ew hîna jî ji ber kuştina 35 sîvîlên li Robozkê lêbûrînê naxwaze û bang li Erdoğan tê kirin ku "divê ev nakokî ji holê were rakirin." Rojname herweha lê zêde dike ku hikûmeta tirkî piştî bihara erebî di warê demokrasîyê de wekî model tê nîşan dan, lewma gavên wê yên demokratîk yekser girîng in.

Gotar weha bi dawî dibe: 'Bi rawestîna aborîyê re rejîm ber bi otorîterîyê ve diçe, ku ev jî alozî û tengezarîyan bi xwe re tîne. Da ku pêşî li vê yekê were girtin, divê Enqere di wê rêyê de berdewam bike, ku Erdoğan di 2002ê de dabû ber xwe".

## Stenbol: Kurdistana Piçûk

Kovara amerîkî Time di 10ê çileya paşîn de kurdên li Stenbolê ji xwe re kir mijar. Di kovara Piotr Zalewski de tê dîyar kirin ku li Stenbolê dora 4 mîlyon kurd dijîn û ew ji ber kuştina 35 sîvîlan a ji alîyê firokeyên şerî yên artêşa tirk ve, derketine kolanan. Kovar taxa Gazîyê, ku gelek kurd lê dijîn û lê gelek xwepêşandan pêk tên, wekî Kurdistana Piçûk bi nav dike û dîyar dike ku her ku rewşa li herêmên kurdan xerabtir dibe, kurdên li Rojava jî nerazîbûnê nîşan didin û ev yek jî dikare rê li pevçûnên etnîkî veke.

Rojname wekî din dinivîse ku niha bi tenê şer dijwartir nabe, lê belê xeterek jî heye ku şer berbelav bibe, nemaze li bajarên rojava: "Her ku li seranserî welêt tengezarî û pevçûn zêde dibin, bajarên tirkan ku bi mîlyonan kurd lê ne, dikarin bibin enîyên nû yên şer".

Nûçegihan, dîmenên li taxa Gazîyê jî weha radigihîne: "Li ser wê rêyê ku diçe qereqola taxê, bankayên dewletî di encama xwepêşanan de, ku tê de kurd, çepgirên tundrew û anarşîst beşdar bûne, hatine wêran kirin. Qereqola ji cihekî kaş li taxê dinihêre û alayeke qirase ya tirk lê ye, wekî kelehekê xuya dike. Nivîsên li dijî hikûmetê li ser dîwaran hatine nivîsandin. Xelk dibêje ji pevçûnan, şaredarî otobusên modern nema dişîne vê taxê.' Şaredarî herweha hewlê dide ku geceqondîyan, ku kurd lê dijîn, xera bike û di şûna wan de avahîyên mezin lê bike.'

## Siyaseta derve ya Tirkîyeyê û ciranên wê

27ê çileya paşîn kovara Economist di gotareke xwe de têkilîya Tirkîyeyê ya digel cîranên wê rave kir û nivîsî ku divê Enqere bi wan kêşeyan serî derxe, ku ji ber siyaseta wê ya derve peyda dibin. "Davutoğlu ji ronamegeran re got ku wî di xewna xwe de Sûrîye dîtiye û paşê nikaribûye dîsa bi xew re here. Derdê mîmarê siyaseta 'digel cîranan pirgirêka sifir' Ahmet Davutoğlu ne bi tenê xwînrijîya li Sûrîyeyê ye, lê herweha muzakereyên endametîya Yekîtîya Ewropayê ye, ku di 2005ê de dest pê kiribû, dikin rawestin. Di vê yekê de muxalefeta Sarkozy jî xwedî roleke mezin e. Serdema xitimî ya li Qibrisê jî kêşeyeke mezin e. Lê belê yên pirsgirêkê derdixin ne bi tenê ewropî ne"

Rojname herweha dibêje piştî ku Tirkîye li dij pêkirinên Neteweyên Yekgirtî yên li dij Îranê derket, ew li wê yekê tê tewanbar kirin ku wê pişta xwe daye Rojhilat.

Rojname derbarê helwesta Tirkîyeyê ya li hember Îranê jî weha dinivîse: "Da ku bandora Îranê sînordar bike, Davutoğlu hewlê dide ku blokeke sunnîyan ava bike. Ên ku weha difikirin, dîyar dikin ku Tirkîye piştgirîyê dide sunnîyên dijberî Esad û nemaze jî Birayên Musulman ên Misirê. Tirkîye aşkere piştgirî dide sunnîyên iraqî û têkilîyên xwe digel kurdan baştir dike. Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malikî, ku bi xwe şîî ye, Tirkîyeyê tawanbar dike ku tengezarîyên mezhebî yên li Iraqê pîj dike. Erdoğan û Davutoğlu jî Malikî bi cudagerîya mezhebî tewanbar kir. Şirovekarê siyaseta derve Soli Özel dibêje, duelloya zimên a digel Malikî nîşan da ku Tirkîye derbarê serdema piştî vekişîna leşkerên amerîkî ya ji Iraqê ne xwedî bernameyekê ye".

Sebaret bi alîgirên îslamî yên Erdoğan jî dibêje ku herçend Tirkîye têkilîyên xwe yên digel Îsraîlê dabe rawestandin jî îslamî ji sîstema radaran ya NATOyê ne razî ne û Tirkîyeyê tawanbar dikin ku ew bûye maşeya Amerîkayê. Ji ber ku ew bawer dikin ku tenha armanca radarê ew e ku di êrişeke pêkan a îranî de berevanîya Îsraîlê bike. "Davutoğlu dibêje hedefa radarê ne Îran, ne jî Rusya ye, lê bi awayekî ku mirov pê matmayî dimîne, dibêje ew di warê têkilîyan de bi Amerîkayê re serdema zêrîn dijîn".

Nivîsa Economist weha bi dawî tê: "Gelek kesên li Sûrîyeyê hêvî dikin ku Tirkîye dê were wan rizgar bike. Tirkîye dikare vê yekê bi tenê di çarçoveyeke koalîsyona dilxwazan de bike. Ji ber ku hilbijartinên serokatîyê nêzîk dibe, Amerîka naxwaze ku di warê siyaseta derve de bikeve macerayên nû. Mudaxeleyeke ji NATOyê jî pêkan naxuye. Lê belê heger li Sûrîyeyê qetlîamek pêk were dê çi bibe? Serbazên tirk dê sînor derbas bikin? Îran dê li hember vê yekê çawa tev bigere? Bersivên Davutoğlu yên van pirsan ne amade ne. Lê belê tiştek heye ku teqez e. Davutoğlu dê gelek şevên din bêxew bimîne".

## Qibris û Rusya vs. Tirkîye

Her sebaret bi mijara cîranên Tirkîyeyê rojnameya brîtanî Guardian jî di heman rojê de têkilîyên baş ên Rusya û Qibrisa Başûr rave kir. Rojname balê dikişîne ku li bajarê Limasol a Qibrisê bi hezaran rûs dijîn, dibistan û radyoyên wan hene û bi dikanên malên rûs, bajar wekî parçeyekî Federasyona Rûsyayê xuya dike, ku xelk jê re Limasolgrad jî dibêjin.

Nivîs herweha balê dikişîne ku Qibrisê di keştîyeke rûsî de 60 ton cebilxane peyda kiriye û di şûna desteserkirinê de hiştîye ku keştî here Sûrîyeyê. "Ev yek binpêkirina ambargoya li dij rejîma Esad bû. Mirov dikare fêm bike ka Qibris çima naxwaze dilê Putin bihêle, ji ber ku Kremlin da ku Qibris bikaribe ji krîza aborî derkeve, soza kredîyeke 2.5 mîlyar euroyan daye. Rusya herweha di Civata Tenahîyê ya Neteweyên Yekgirtî de piştgirîya Qibrisê dike û li dij KKTC *(Komara Tirkî ya Qibrisa Bakur)* tev digere'.'

www.lemonde-kurdi.org

# Rûdanên dawî li Kurdistanê (Dewama rûpela 1)

***Ew di Muharremê de ji bo Husên li xwe didin. Di 981ê de li Kerbelayê 72 kes hatin kuştin. Dêrsimî vê yekê ji bîr nakin. Di 1937-1938ê de li Dêrsimê zêdetirî 50-60 hezar kurdên elewî hatin kuştin. Lê belê dêrsimîyan ev yek ji bîr kiriye.***

Hin dêrsimî, dema behsa nasnameyê vere kirin elewîtîya xwe bin xêz dikin û qala kurdbûna xwe nakin. Hewlê didin ku ji kurdbûnê dûr bisekinin. Hin ji wan, da ku dûrî kurdan bisekinin wekî ku ew ji kurdan cihê ne, dibêjin ew zaza ne. Dibêjin *"Ez ne kurd im, zaza me*."

Ez di wê bawerîyê de me ku polîtîkaya pişavtinê ya dewletê, li **Dêrsim**ê bi ser ket. Helwesta dêrsimîyan ku bi israr xwe dûrî kurdîtîyê digirin berbiçav e. Ew di ***Muharrem***ê de ji bo **Husên** li xwe didin. Di 981ê de li ***Kerbela***yê 72 kes hatin kuştin. Dêrsimî vê yekê ji bîr nakin. Lê belê di 1937-1938ê de li Dêrsimê zêdetirî 50-60 hezar kurdên elewî hatin kuştin. Lê belê dêrsimîyan ev yek ji bîr kiriye. Ev yek aşkere ye ku qirkirinek e. Jixwe, Kerbela di dîroka Îslamê de şerê desthilatê ye. Têkilîya wê bi kurdîtîyê re nîne. Aşkere ye ku elewîtî şîîtî nîne. Şîîtî helbet Îslam e. Şîîtî çawa ketiye serê kurdên qizilbaş ên Dersîmê, çawa bandor li ser wan kiriye û ev pêvajo çawa pêk hatiye, pirsên girîng in ku mirov li ser wan raweste. Ên ku dibêjin *"Li Dêrsimê serhildan nebû, lê qetlîam hebû"* tu caran balê nakişînin ser nerazîbûnên li hember polîtîkayên tirkkirinê ya dewletê. Behsa nameyekê tê kirin, ku di 1937ê de ji alîyê **Seyîd Riza** ve ji bo hikûmeta îngîlîz hatiye nivîsandin. Tê gotin ku *"**Seyîd Riza** ev name nenivîsî, **Nûrî Dêrsimî** ji devê wî nivîsîye'.*

Ma **Seyîd Riza** ji kiryarên tirkkirinê razî bû? Gelo hin dêrsîmî dixwazin weha bêjin? Bifikirin. Hûn li jêr zext û zoreke dijwar de dijîn. Li hember ziman, çand û bawerîya we pêkutî heye. Nijadkujî tê kirin. Hûn hewlê didin ku pêşî li vê yekê bigirin. Li hember teknolojîya neyarê we, ku li cem we nîne, hûn naçar dimînin. Di rewşeke weha de mirov da ku dawî li vê zulmê were dikare ji her derê alîkarîyê bixwaze. Jixwe, normal e ku ji Îngîltereyê alîkarî xwestiye û hewl daye ku ji hêza wê ya siyasî ya li ser Tirkîyeyê sûdê werbigire. Wekî mînak ma Tirkîye di warê şerê xwe yê li dij PKKê de di serî de ji DYE, ji dewletên din alîkarîyê naxwaze? Di navbera salên 1985-1988ê de Tirkîye ji ber guhertina navên tirkî ji dewletên din nexwest ku zorê bidin Bulgaristanê?

Li vê derê pirsgirêk alîkarî xwestina ji Îngîltereyê nîne. Pirsgirêk bêdengmana Fransa, DYE, Yekîtîya Sovyetan û ya dewletên din a li hember vê qirkirinê ye. Dibe ku name li ser navê **Seyîd Riza** ji alîyê **Nûrî Dêrsîmî** ve hatibe nivîsandin. Aşkere ye ku ev her du kes li hember wan bûyeran xwedî hestîyarî û fikrên wekhev bûne.

## Lêborîna li ser Dêrsimê

Lêborîn derbirîna çi ye? Kesê ku daxwaza lêborînê dike, dibêje *"Tiştên ku di rabuhîrîyê de qewimîn tiştên xerab bûn. Divîya weha nebûna lê bûn. Em ji ber vê yekê lêborîna xwe dixwazin. Careke din pêk nayê."* Lê belê lêborîna serokwezîr **Recep Tayyîp Erdoğan**, ku di kombûna koma parlametoyî ya *Partîya Dad û Geşedanê* de kir, helwesteke rêk û pêk nîne. Helbet kêmanîyek e ku ew xeberdan di kombûna giştî ya parlamantoyê de nehat kirin. Lê jê girîngtir, bûyerên wekî salên 1937-1938ê hîna jî pêk tên. Wekî mînak tê zanîn ku di çirîya paşîn a 2011ê de li ***Çelê***, li ***Gelîyê Teyarê***, li hember gêrîlayên kurd çekên kîmyayî hatin bi kar anîn. Dîsa di dawîya meha çileya pêşîn de li gundê ***Robozkê*** ya ***Qilabanê*** gundîyên ku bi 'qaçaxçîtîyê' re mijûl dibûn ji alîyê firokeyên tirk ve bi zanîn hatin bombebaran kirin.
Ji van hemûyan girîngtir jî ev e: Dema ku serokwezîr ji dêrsimîyan doza lêborînê xwest, di bersiva xwe ya pirsekê de peyva ermenî wekî heqaretek, wekî çêr bi kar anî. Îdeolojîya fermî civakek weha afirand ku peyvên ermenî û kurd wekî çêr têdigihîjin. Ev yek, yek ji taybetmendîyên komarê ye û bi me nîşan dide ku divê Tirkîye bi dîroka xwe re bi giştî hesabê bibîne. Ne bi kurdan, ermenîyan, asûrî-suryanîyan, rûman, elewîyan cuda cuda lê belê bi wan gişan rû bi rû bibe. Lê belê dîsa jî lêborîn tiştekî erênî ye. Mirov dikare vê yekê wekî lêborînekê bibîne, ku serokwezîr li ser navê xwe xwestiye.

## 2. Rûdanên li Fransayê derbarê qirkirina ermenîyan

Di rûniştina xwe ya 23.12.2011ê de Parlamentoya Fransayê qanûnek qebûl kir ku înkarkirina qirkirina ermenîyan wekî sûc ceza dike. Vê qanûnê li Tirkîyeyê gelek deng veda. Him dewlet û hikûmet, him jî rojnameger, rewşenbîr, rêxistinên civaka sivîl dîyar kir ku ev qanûn li dij azadîya xwe derbirînê ye. Lê belê di heman rojan de li Tirkîyeyê 47 rojnamegerên çapemenîya kurdî, hatibûn girtin û zêdeyî 40 rojnameger bi giştî şandibûn girtîgehê. Ên ku ji Fransayê doza azadîya derbirînê dikin, li hember zulm û zordestîya li ser rojnamegerên kurd xwe kerr û lal dikin.

Ev qanûn li gor Biryara Çarçoveyê ya Komîsyona Dad û Karûbarên Nevxweyî ya Yekîtîya Ewropayê bû, ku di 19 nîsana 2007ê de hatibû qebûl kirin. Yekîtîya Ewropayê di 28ê çirîya paşîn de ev biryara xwe weşandibû. Yekîtîyê di çarçoveya vê biryarê de bang li endamên xwe dikir ku li dij nijadperestî, dijminahîya li hember bîyanîyan û li dij înkarkirina nijadkujîyê têbikoşin û li gor vê gavên huquqî biavêjin. Divê ev qanûna navgotî jî di vî warî de were rave kirin. Di qanûnê de ji bo wan kesan ku nijadkujîyê înkar dikin, ceza tê dayîn.

Li hember vê hewldana qanûnê, Fransa bi mêtîngerî û qirkirina li Cezayîrê hat tewanbar kirin. Serokwezîr **Recep Tayyîp Erdoğan**, serokkomarê Fransayê **Sarkozy** bi van gotinan rexne kir: *"Ji bavê xwe Sarkozy bipirse û jê hîn bibe ka Fransayê li Cezayîrê çawa mêtîngerî û qirkirin meşandin."* **Paul Sarkozy** jî di bersiva xwe ku heman rojê da, got ku ew di emrê xwe de neçûye Cezayîrê.

Lê belê ji van hemûyan girîngtir ew e ku di salên 1954-1961ê de di pêvajoya Têkoşîna Rizgarîya Neteweyî ya Cezayîrê de Tirkîye hertim piştgirî daye Fransayê û di Şerê Rizgarîya Neteweyî ya Cezayîrê de di enîya li dijî rizgarîxwazên Ceyazîrî de cîh girtîye... (1)

Serokwezîrê Cezayîrê **Ahmed Uyahya** jî di heman rojan de Serokwezîr **Erdoğan** bi siyasetkirina li ser xwîna cezayîrîyan rexne kir û binxêz kir ku Tirkîye di dema têkoşîna neteweyî ya Cezayîrê de hertim li cem Fransayê bû û wê tucaran piştgirî neda têkoşerên rizgarîya neteweyî.

Mebesta wê qanûnê, ku înkarkirina qirkirinê ceza dike, ew e ku rêz li êş û jana wan gelan were girtin û bi şîna wan henek neyê kirin. Têkilîya vê yekê bi azadîya derbirinê re nîne. Ji ber vê yekê, helwesta wan ermenîyan ku digotin serê pêşîn em dê vê qanûnê li naverasta Parîsê bin pê bikin, ne helwesteke rast e. Ev yek dolabgerî ye.

## 3. Qetlîama Qilabanê

Qetlîama ku di 28.12.2011ê de li ***Qilaban***ê hat pêk anîn, vê yekê tîne bîra mirov: 34 kesên ku bi bombebarana firokeyên tirk hatin qetl kirin bi 'qeçaxçîtîyê' mijûl dibûn û 19 ji wan hîna zarok bûn ku alîkarîya debara malbata xwe dikirin.

Qeçaxçîtî, karek e ku li ser sînor bi awayekî ji dewletê bi dizî tê meşandin. Lê belê divê ev pirs were kirin: Wateya wê yekê çi ye ku kurd li ser axa xwe bi dizî diçin û tên û wan sînoran derbas dikin, ku li dij vîna wan hatine danîn? Rastîya bûyera Robozkê ev e: Dema ku di salên 1920ê de hêzên emperyal ên wekî Brîtanyaya Mezin û Fransayê û hevkarên wan ên li Rojhilata Navîn ên wekî tirk, ereb û fars ev sînor danîn, wan malbat û eşîr kirin du beş. Hin malbatên eşîrekê li hêla Tirkîyeyê, hin ji wan jî li hêla Brîtanyayê (ku paşê bû Iraq) man. Hin malên eşîrekê li Tirkîyeyê, hin jî li hêla Fransayê (ku paşê bû Sûrîye) man. Malbat naçar mane ku bi dizî seredana hevdu bikin. Divê ev parçekirin, ev jihevxistin çawa hat sepandin kûr û dûr werin lêkolîn. Ev yek di dîroka Rojhilata Navîn û yên Tirkîye, Iraq û Sûrîyeyê de yek ji rûdanên herî girîng e.

Kesên ku li Qilabanê di encama bomberanê de hatin kuştin, an ku ew kesên ku qeçaxçîtî dikirin, di heman demê de notirvanên gund bûn. Ji ber ew qoricî bûn, dewletê çav û guhên xwe li karê wan ê qaçaxçîtîyê digirtin. Wekî ku di vê qetlîamê de jî tê dîtin, qoricîbûn nayê wateya dûrketina ji kurdbûnê. Lê belê dewlet dixwaze ku ew kesên ku dibin qoricî bi giştî ji kurdbûnê dûr kevin û ji ber ew ji kurdbûnê dûr neketin, tûşî vê qetlîamê bûn. Aşkere ye ku ev qetlîameke bi zanîn û ji berê de hatiye plan kirin. Bi vê yekê tê gotin ku *"Aqûbeta wan kesan ku nabin tirk û di kurdîtîyê de israr dikin, ev e."*

***Her ji ber vê yekê ji bo kurdan hewcedarîyeke gelek mezin e ku ew doza birêvebirina bi destê xwe bikin. Birêvebirina xwe-bi-xwe, dîyarkirina dahatûyê û têkoşîna di vê rêyê de divê ji bo kurdan bibe prensîpa bingehîn.***

Daxuyanîyên **Bahoz Erdal**, ku di 04.01.2012ê de li ser malpera www.gelawej.net hatin weşandin hêjayî bawerkirinê ne. **Bahoz Erdal** digot: *"Ji sala 1999ê û vir ve li Robozkê tu şer neqewimîn. Ew der rêgeha gêrîlayan nîne. Dewlet jî, hikûmet jî pir baş bi vê yekê dizanin."* Da ku ispat bike ku ev qetlîameke plankirî ye, Bahoz Erdal pênc xal dîyar kirin. Ew hemû jî hêjayî bawerkirinê ne. Bahoz herweha got, "heger sê kes ji vê qetlîamê nefilitîyana û wan rasterast negotana ka çi qewimîye, wê ev qetlîam biavêtana stûyê PKKê." Bûyerên bi vî rengî berê jî pêk hatibûn.

28 ji wan kesan ku di vê qetlîamê de hatibûn kuştin, ji malbata **Encü** bûn. Qismek ji malbata **Encü** jî li alîyê Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê dijîn. Weha xuya dibe ku endamên malbata **Encü**, ku li Başûr dijîn dilxwazên Partîya Demokrat a Kurdistanê ne. Di navbera xizman de têkilîyên nêzîk hene. Lewma, ev qetlîam bi awayekî çewsandinek e ji bo PDK û serokê Îdareya Herêmî ya Kurdistanê **Mesûd Barzanî** ye. Şiroveyeke weha jî pêkan e.

Qetlîam di roja 28.12. 2011ê de pêk hat, an ku du-sê rojan berî sersalê. Vê qetlîamê ne tenê nîştecihên ***Robozk***ê yan ***Qilaban***ê herweha hemû civaka kurdî xist nav êşeke mezin. Ew şîna kurdan ne di xema wan kesan de bû, ku li rojavaya Tirkîyeyê, li Stenbolê, li Îzmîrê, li Enqereyê û hwd. dijîn. Hin kesan henekên xwe bi êşa kurdan kirin. Hinan got "musteheq e." Dema ku kurd li Kurdistanê di nav kerbeke mezin de bûn, xelkên herêmên rojava di sersalê de jîyana xwe ya bi şahî berdewam kir.

Çapemenîya tirk hewl da ku qetlîamê veşêre. Hikûmetê jî 12-13 saet piştî qetlîamê daxuyanîyek da. Çapemenîyê jî encax piştî daxuyanîya hikûmetê û li gor vê daxuyanîyê nûçe weşandin. Di daxuyanîya serfermandarîyê de tu şopeke mirovahîyê nîne. Ev hemû nîşan didin ku kurd û tirk di warê dêrûnî de ji hev qetîyane. Careke din derket holê ku gotina *"Em di êş û serbilindîyê de jî yek in"* gotineke çawa derewîn û durû ye. Mirov dikare bi sedan, bi hezaran bûyerên din nîşan bide ku vê gotinê derew derdixin.

Hevdem, divê mirov li ser gotina hikûmetê jî raweste ku digot: *"Heger xetayek hebe..."* Ev gotin nîşan dide ka hikûmet li hember êş û jana kurdan çiqas xemsar e. Herçend tiştên ku rû dane ewqas aşkere ne jî, hikûmet hîna jî dibêje *"heger xetayek hebe..."* Lê belê, helwesta hikûmetê, ya serokwezîr li hember filistînî û somalîyan weha ye? Kurd divê bi vê yekê têbigihên. Nemaze jî kurdên oldar, kurdên îslamî di vî warî de haydar bin. Îro xwîn ji pozê filistînîyan were serokwezîr li hember vê yekê nerazîbûnê nîşan dide û ew ji ber xemsarîya Ewropayê ya li hember somalîyan rexne li wan digire. 34 gundîyên kurd ji alîyê firokeyên şerî yên tirk hatine kuştin, lê belê ew hîna jî dibêje heger xetayek hebe. Hevdem, divê filistînî jî bi vê yekê baş têbigihin. Hikûmetek, ku li kurdan zulm û zordestîyê dike, ji şov kirinê pêvetir nikare guh bide filistînîyan. Heger tiştên ku ji bo filistînîyan tên xwestin ji bo kurdan nayên xwestin û daxwazên neteweyî yên kurdan bi zordestî tên tepisandin, wê demê baldarîya ji bo filistînîyan ji şovê pêvetir tiştek nîne.

Ev hemû vê yekê nîşan dikin. Mafê gelan ê xwe-bi-xwe birêvebirinê û dîyarkirina dahatûya wan a bi destê wan mafekî xwezayî ye. Ev helbet ji bo kurdan jî mafekî xwezayî ye. Jixwe deshilatdarî li hember kurdan gelek xerab e, kurd bi qetlîam û qirkirinan tên bi rê ve birin. Dewlet li dij kurdan şerekî giran dimeşîne. Mebesta vî şerî ew e ku kurd werin xizan kirin û ji taqetê bikevin. Şewitandina gundan, wêrankirina çavkanîyên debara kurdan, şewitandina daristanan û bi demê re helandina kurdan a bi rêya qirkirinê, parçeyên vî şerî ne. Ev yek ne tenê li Tirkîyeyê lê herweha li Îran û Sûrîyeyê jî pêk tê. Di dema **Sedam Husên** de li Iraqê jî weha bû. Kurdên li Qefqasyayê jî xerab hatin bi rê ve birin. Her ji ber vê yekê ji bo kurdan hewcedarîyeke gelek mezin e ku ew doza birêvebirina bi destê xwe bikin. Birêvebirina xwe-bi-xwe, dîyarkirina dahatûyê û têkoşîna di vê rêyê de divê ji bo kurdan bibe prensîpa bingehîn.

1 Binihêrin: Melek Fırat-Ömer Kürkçüoglu, Têkilîyên digel Rojhilata Navîn r. 785, Baskın Oran (ed.) Siyaseta Derve ya Tirk, ji Dema Şerê Rizgarîyê heta Roja Îro, Rûdan, Belge û Şirove **Cild I** Istanbul, Weşanên Iletişimê, 2001, r. 621, 634,

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya



ZORO METTINI: **Kêmasîya hevjînek**, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihev, 80 x 60 cm

# Hewldana çareserîya dîrokê ji bo lihevhatin û demokratîzekirinê

(Dewama rûpela 1)

tîne ziman ku helwesteke redkirinê ya dijberê mexdûrên taqîbata dewletê bûne û hîn di jîyanê de ne, hebûye. Li ba piranîya gel û pêşengên siyasî, piştî pêkanîna *"komîsyonên rastîyê"*, pêwîstî peyda bûye ku rabirdûyê wek çarebûyî bipejirînin û daxwazên mexdûran piştî nasîna, edalet û telafîya zîyana berfireh, di gengeşîya eşkere de, jê re êdî hew cî bê veqetandin.

Rewşa gelemperî ya bêdengîyê li alîyê mexdûrên hîn dijîn bi meylên xweparêzî, rê li ber wan asteng dike ku tiştên jîyane ragihînin û bi civakê re par ve bikin. Hinek ji wan xwe sûcdar dibînin ji ber ku ew ji şidetê xilas bûne û dijîn; gava kesên din bêsûc zalimane hatine kuştin, wan bêçare temaşe kiriye. Hestên bênirxbûnê û şerm jî, bêdengîyê, tenêtîyê û depresyonê kûrtir dikin. Bi ser de jî, pirî caran difikirin ku tiştên tirsnak ên jîyane, jixwe nikarin bi yekî ku elaqeya wî pê re tunebûye, zelal bidin fêhm kirin. *Frankl (1946, r. 13)*, vê helwesta ku di nav mexdûrên ji *Holocaust* (tevkujî) zîndî mane de gelek zêde ye, jê digire:

"*Em hez nakin derbarê serboriyên xwe bipeyivin: kî bixwe di kampekê de bûye, pêwîst nake em ji wî re tiştekî rave bikin; û kesê li wê derê nebûye, emê tu caran nikaribin bi wî bidin fêhm kirin, hundirê me çawa bûye û hîn çawa ye*."

Bi bêdengîya serboriyên jîyayî yên şexsî, ji alîyekî ve çarebarîya serboriyên trawmatîk ji bo mexdûran dijwar dibe, ji alîyê din ve, encama bêdengîyê rejîmên heyî zexim dike, yan jî astengan datîne ber civakê ku li ser rabirdûyê ji nû ve bixebite û kirdaran peyda bike û ceza bide wan.

Li ser bingeha bêdengîya gelemperî hin mexdûrên *Holocaust* (tevkujî) ên dijîn û mexdûrên din ên şideta siyasî, mînak wek li Şîlîyê, biryar dan ku bîranînên xwe yên bîyografîk binivîsin. Çîrokên wan ên li ser serboriyan bi motîvasyonên ji hev cûda ne. Pir caran, hem pêwîstîya bikaranîna tiştên jîyayî yên şexsî, hem jî daxwaza belgekirina şideta jîyayî rolekê dilîze *(Bettelheim, 1986)*.

## Belgekarî wek nasîn û nîşana jibîrnekirinê

Gelek mexdûrên trawmabûyî yên şideta bê hempa bixwe nikarin serboriyên xwe bi berfirehî binivîsin û bigîjînin kesên din. Armanca vegotina şexsî û kolektîvî di rewşên cûr bi cûr de (komele, medya, civînên taybetî ûwd.) ew e ku rabirdû, wek nîşana jibîrnekirinê û nasîna serboriyên zalimane yên mirovan bê belge kirin (*Tonkin, 1995)* û ji alîyê din peydakirina nêzîkahî û bawerîpêdanek di navbera mirovên kurd û tirk û rêxistinên wan de.

Mîna berfirehkirin, terapîya şahidî *(Testimony-Therapie)* ji Amerîkaya Latîn dikare bê fêhm kirin, tê de ne bi tenê yek bi yek takekes serboriyên xwe belge dikin, herwiha civak jî di vê pêvajoyê de cîyê xwe digire *(Cienfuegos & Monelli, 983)*.

Ger bîranîn, berîya her tiştî şexsî û kolektîv, bên bin pê kirin, tabûkirin an guhertin, çanda civakekê jî, ji vê yekê nikare bireve, xwe diguherîne.

## Dîroka devkî li Tirkiyeyê

Di nav tirkan de gengeşîya li ser dîroka devkî hema bêje tuneye, bi danberheva navnetewî mirov dikare bibêje gelek dereng maye *(Dabag, 1998)*. Li vê derê dikare behsa dijrawestanekê bê kirin ku sedemên wê di nav heyama dîrokê de, yan bi wê heyamê ve girêdayî, dijberê wê dîroka kanîyên şexsî û objektîv rawestî ne ku ew jî bi dîrokniviserîya fermî ya îro di nav mixrikê de ne. Şikestinên heyî yên dîroka şexsî û objektîv diviyabû ji alîyê nifşê îro, yan hîn ji alîyê nifşên berê bihatana çareser kirin. Li gor qaîdeyê pêwîst e ku du nifşên li pey hev bi wan şkestinan bilî bin, li ser bixebitin da ku bi vê dîroka bargiran re girêdaneke rasterast û nerasterast hebe. Ji ber ku ev niha li Tirkiyeyê çênabe, divê bê zanîn ku ev bûyerên girîng ên bargirane bi tenê ji alîyê hin kesan ve, mînak nivîskar, ronakbîr, hunermend ûwd. dibin behsa mijarê, lê nagihîjin hemû gel *(Dabag, 1994)*. Ev yek dikare bi têkilîya nêzîk a pêşketina demokrasîya Tirkiyeyê ve bê nirxandin. Li ser bingeha kevneşopîya feodal a osmanî-milîtarîst ev yek jî tê ser ku bawerî bi şexsan nayê û ew heta îro jî ji zanistîya dîrokê bi dûr tê hîştin. Nûnerên şerê rizgarîya 1923 û dijberên serhildanên kurdî heta roja îro jî, elaqe şanî mijarên wiha nadin, ji ber dibe ku alîyê din ê şer eşkere bibin û mirov pêwîst e bipejirîne ku li gelek komên hindikayî neheqî hatine kirin.

Pir bi haydarî hewl hatin dan ku bûyerên cûr bi cûr ên dîrokê û trajedîyên wan ji gelê tirk bên veşartin, wiha ku ev gel îro bi gelek mijarên tabû dijî.

## Gengeşîyên rûbirû

Ev gengeşîyên rûbirû bi rabirdûyê re gihîştîbûn, perwerdeya kesayetî û wêrekî dixwaze ku ev ne bi tenê li Tirkiyeyê, lêbelê di hemû Rojhilatê Navîn de jî hîn bi têra xwe nayê dîtin. Lê daxwaza axiftinê li ser van mijaran wisa dixuyê zêde bûye, ev jî dibe ku bi berfirehîya agahdarîyan ve girêdayî be; li cîyên gelek asê jî, mirov dikare bi rêya satelîtê *"hemû cîhanê bîne gundê xwe"*. Bendeke duyem jî, wisa dixuyê ku elaqeya wê bi nêzîkbûna Tirkiyeyê ber bi Yekîtîya Ewropayê ve û têkoşîna zirav a veguherîna îdeolojîk a li Tirkiyeyê ve girêdayî ye. Têkoşîna "îslamîstên lîberal" a ku ji alîyê AKPê ve sembolîze dibe û ya leşker wek parêzvana kemalîzmê, bûyerên rabirdûyê radixînin ber bîrûraya giştî ku ew hemû civakê bi giştî dihejînin. Belkî jî pêbawerî zêde bûye ku vekirî li ser tabûyan dikarin bipeyivin, mînak li ser trajedîya ermenîyan a 1915ê, an jî, çalakîya leşkerî li dijî kurdan, mînak 1925, 1938 ûwd.

Nivîsên rexneyî li ser dîroka tirkan di rojnameyên tirkî de û gengeşîya arîşeya kurdî di medyayê de jî şanî didin ku hinek amadebûn di derbarê vekirina van mijaran de heye. Hişmendîya dîrokê di herêmên kurdan de ya li Tirkiyeyê, Îraqê, Îranê, Sûrîyeyê û dîasporayê, bi rêya tevgera kurd û gêşedanên siyasî di Rojhilatê Navîn de bi hêztir bûn.

## Xanîyekî bibîranînê

Bi rêya guhertinên siyasî û civakî, reforman, pêvajoyên demokratîzebûnê ûwd. di herêmên kurdan de "motîvasyon"a bibîranînê bi hêztir bû *(Welzer, 2005)*. Ev xebata bibîranînê û nivîsandina wê yanî belgename divê ji alîyê hemû komên etnîk û dînî ve bên çêkirin. Pirs ne ew e ku pirtûkeke dîrokê ya zanistî bê nivîsandin. Pirs ew e ku mirov guh bide mirovan, dîyalogeke aşt û bi wê yekê jî pêvajoyeke aştîyê ya sîvîl bîne holê. Herçiqas bi awayekî behsa xilasîya ji tabûyê, mijara peyvê ye jî, divê mirov dijwarîyên hevtêgihîştina dîyalogê di navbera alîgirên komik û nifşên cihêreng de (tirk, kurd, ereb, asûrî, sunî, elewî, êzdî, xiristîyan ûwd.) ji bîr neke. Veguherîna civakî bi gelemperî û serûbinbûna civakê bi taybetî, xebata li ser perspektîveke hevbeş hem pêwîst, hem jî dijwar dike.

Bi rêya pêkanîna platforman, înstîtûtan û bi vê yekê nivîsandina dîroka jîyayî ya devkî ji alîyê kesên di jîyanê de mayî û şahidên wê demê dikare rabirdûye çêtir bide fêhm kirin. Bi belgekirina dîroka jîyana wan, dê rûmet û şanazî bo kesên di jîyanê de mayî û şahidên wê demê re bê dayîn. Mexdûr dê bi rêya belgekirinê neyên ji bîr kirin. Nifşên li pey, bi vî awayî wesiyetnameya bav û kalên xwe werdigirin û gelek valahîyên dîroka xwe dadigirin. Ev pêvajo eger ne zêdetir be jî, dê herî kêm du nifş berdewam bike. Ji bo vê yekê sembolîk ***xanîyekî bibîranînê*** gerek e ku tê de her kes, her dem bikare bi rabirdûya zindî re bikeve pêwendîyê. Ne bi rêya jibîrkirinê, lê bi rêya bibîranînê û helwesta rast belkî hinek aramî bikeve gîyanê mirovan. Ev tê wê maneyê ku ji hemû etnîk û dînan mirov dest pê dikin bawerî bi hev bînin û bi hev re jidil bipeyivin. Bi tenê wisa û bi pêvajoyeke wekhev û rûmetdar mirov dikare zimanekî nû yê aştîyê bibîne.

**Çavkanî:**

**Bettelheim, B**. (1990). Erziehung zum Überleben. Zur Psychologie der Extremsituation *(Perwerde û li jîyanê mayîn, li ser psîkolojîya rewşa bê hempa)*, München: dtv.

**Cienfuegos, J., & Monelli, C**. (1983). The testimony of political repression as a therapeutic instrument *(Şahidî li ser zordarîya siyasî wek alavê terapîyê). American Journal of Orthopsychiatry, 53*, 43-51.

**Dabag, M.** (1998). Jungtürkische Visionen und der Völkermord an den Armeniern *(Xewnên Jontirkan û Tevkujîya Ermenîyan).* In: Genozid und Moderne, Bd. 1, Strukturen kollektiver Gewalt im 20. Jahrhundert. Opladen: Leske und Budich.

**Dabag, M., Platt, K.** (1994). Diaspora und das kollektive Gedächtnis, in: Identität in der Fremde (*Dîaspora û Mejûyê Kolektîv di Nasnameya di Bîyanîbûnê de*). Bochum: Universitätsverlag Dr. Brockmeyer.

**Frankl, V**. (1946). Ein Psycholog erlebt das Konzentrationslager *(Psîkologek ji Komekampê zindî derdikeve)*. Wien: Verlag für Jugend und Volk.

**Hamber, B.** (2000). Wahrheitskommission und Selbsthilfegruppen in Südafrika. Manuskript präsentiert auf der Tagung Psychosoziale Arbeit nach Krieg und Diktatur, (*Komîsyona Rastîyê û Komikên Alîkarîya xwe bixwe li Afrîkaya Başûr. Destnivîs di civîna karê psîko-sosyal piştî şer û dîktator de hatiye pêşkêş kirin*) Mainz.

**Kizilhan, I.** (2008). The Past in the Presence (*Rabirdû di Kêlîka Niha de*). Berlin: Regener Publisher.

**Köstlin, K.** (1989). Erzählen vom Krieg - Krieg als Reise II (*Vegotin li ser şer-şer mîna rêwîtîyê*). BIOS Zeitschrift für Biographieforschung und Oral History, 2/89, 173-182. Opladen: Budrich.

**Rasekh, Z., Bauer, H. M., Manos, M. M., & Iacopino, V**. (1998). Women's health and human rights in Afghanistan (*Tendurustîya jinan û mafê mirovan li Afganistanê*). *JAMA, 280*(5), 449-455.

**Somasundaram, D. J., & Sivayokan, S**. (1994). War trauma in a civilian population (*Trawmaya şer di civaka sîvîl de*). *British Journal of Psychiatry, 165*(4), 524-527.

**Tonkin, E.** (1995). Narrating our Past. The Social Construction of Oral History *(Rabirduya me vebibêje. Avahîya civakî ya dîroka devkî )*. Cambridge: Cambridge Unversity Press.

**Welzer, H**. (2005): Kriege der Erinnerung (*Şerên ji bo bîranînê*). In: Magazin für Psychologie und Hirnforschung, Gehirn und Geist, Nr. 5/2005. Heidelberg: Spektrum.

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

## Dîroka devkî

Bi wergera peyv bi peyv, maneya *Oral History* "dîroka devkî" ye. Dîroka devkî metodeke afirîner a lêkolîna nûjen e ku dîroka aborî, civakî, jîyana rojane û bingehîn, bi dîroka angajeya civakî re berkêşî navenda elaqedarîyê dike. Bingeha kanîyên xwe di kêlîka lêpirsîna xwe de hildiberîne ku dirêjahîya wê ya dîrokî bi şahidên di jîyanê de mayî yên bûyerekê, yan pêşketinekê bi sînor dike. Metod bi taybetî berbihev e, ger pêvajo mijara lêkolînê bin, li ser zemînekê ve biherikin ku rê nedin tesbîtkirina nivîskî, yan jî ev yek bê îmkan be. Ger komikên çalak bi dîroka xwe bixwe, ne hişmend bin, wê demê ev yek heye. Ji ber ku li vê derê avahîyên civakî serboriyên ku bi rêya jîyana şexsî hatine bi dest xistin, didin der, dîroka devkî berîya her tiştî li wê derê perspektîvên nû vedike, li wî cîyê ku guhertinên zîhniyeta kolektîv li tenişta veguherîna aborî û civakî tên holê, divê wek zemînê sêyem bê dest nîşan kirin. Ev metod ji bo lêkolîna çandên niştecîyên eslî (îndîgen) jî xwedî mane ye, ji ber ku ev çand bi piranî ne xwedîya zimanê nivîsandinê ne û dîroka xwe bi rêya vegotinên devkî vediguhezînin. Ev metod dikare, mînak bi xebata bîyografîyê, rê ji şewqvedanekê re bê vekirin ku di dema halîhazir de ber bi guhertinên erênî ve bibin. Ger mirov vê metodê rast bi kar bîne, dikare tesîreke siyasî ya aştîyane jî bide. Dikare wek alavê veguherîna şexsî û civakî, zelalî û birêkxistina kanîhêzên xwe bi xwe û komikên cûrereng bê fêhm kirin ku ew wekî din nikarin bigihîjin zanistê *(Köstlin, 1989)*.



ZORO METTINI: **2mîn ez**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 90 x 90 cm

# Çerxên zextkar li Iraq û Sûriyê

# Zordar çawa biryarên xwe werdigirin

JOSEPH SASSOON *

Pêvajoya gelek dehsalan, li Iraqê û Sûrîyê, Sadam Huseyn û Hafiz Al-Esad –dûre jî kurê wî Beşar–bêyî ku bi kesî re parve bikin, deshilatdarîya xwe domandin. Wan hemû cûre dijberî şikandin, hefsar kirin, û di nav deshilatê de jî hemû dengên cihêreng fetisandin, û bi vî awayî rê li ber her cure guftugoyeke jidil a der barê tercîhên stratejîk de jî birîn. Ev zordarên ku ji alîyê medyaya xwe ya piştgir ve pesnê wan hat dayîn, hem di mijara populariteya xwe, hem jî di mijarên dîyardeyên navneteweyî de hatin kor kirin. Û ev yek jî bûn sedem ku ew her carê biryarên herî kambax wergirin.

Hertim dijwar e ku mirov pêvajoyên girtina biryarên siyasî yên du welatên cuda, ku her yek ji wan xwedî meseleyên xwe yên taybet e, bide ber hev. Lê belê, ji ber ku Sûrîye û Iraq her du jî li jêr desthilata Partîya Beasê ne û bûn (Li Iraqê ji 1968ê heta 2003ê û li Sûrîyeyê jî desthilatdarîya Esadan ji 1970yê û vir ve) (1), gelek mekanîzmayên biryarstendinê bi awayekî dişibin hev. Her du rejîmên li Sûrîye û li Iraqê burokrasîyeke navendî afirand, ku di navenda wê de ***Serok*** heye û hêzên ewlekarîyê jî parçeyeke navxweyî ya wê sîstemê ne. Ne li Iraqê, ne jî li Sûrîyeyê, liqên Partîya Beasê wekî wan dezghan tev gerîyan, yên ku ji alîyê girseyan ve hatibûn hilbijartin. Belgeyên serokatîya herêmî ya Beasa Iraqê û tomarên dengî yên rûniştinên Lijneya Serokatîyê ya Şoreşê (LSŞ), ku serokatîya wan **Sedam Husên** dikir, awirekî bêhempa dide, ka biryar li Iraqê çawa dihatin stendin. Bi giştî, sîstem bi tenê bi çend fermanên nivîskî dihat bi rê ve birin.

Herçend biryar ji alîyê endamên LSŞê ve û di navbera leşkerên pilebilind û serokên partîyê de dihatin gotûbêj kirin jî, aşkere bû ku heger **Sedam Husên** bi argumanên din 'qayil' nebûya, wê demê biryara serê ewilî dihat sepandin. Pêvajoya biryarstendinê yên ji jorê ber bi jêrê ve yekser har dibû, dema ku biryarên leşkerî ji alîyê **Sedam Husên** ve dihat dayîn, ku wî tu perwerdehîya leşkerî nedîtîbû (**Beşar Esad** jî, ji bavê xwe **Hafiz Esad** cudatir, xwedî paşxaneyeke leşkerî nebû û di rewşa şer de tu caran biryar neda). Encameke aşkere ya pêvajoyê ew bû ku nerazîbûna wî heger zêde bibûya, dibû nûçeyên nebaş (û di vê rewşê de **Sedam Husên** wekî heman tîranên li cîhanê bû). Di sempozyûmeke li ser Şerê Kendavê yê 1991ê de, ku tê de efserên pilebilind ên artêşê beşdar bûbûn, **Sedam Husên** bi wan kesan re, ku dîmeneke çilmisî ya artêşa Iraqê nîşan dida, xeyidî û got: *"Ez destûrê nadim nihêrînên reşbîn, lê bi tenê yên xweşbîn".* (2)

Li Iraqê û heta radeyekê li Sûrîyeya **Beşar Esad**, şexsperestîyê [kulta şexsiyetekê] risteke weha lîst ku li dij derketina nihêrînên Serok yekser dijwartir bû. Tomarên dengî yên rûniştinên lijneya serokatîyê nîşan didin ku şelafî dibû sedem ku derbarê mijarên heyatî de gotûbêjên cidî neyên kirin. Rûniştinan li gor kêfa serok reng digirt û pir guh nedidan rojeva rasteqîn, ji ber ku **Sedam Husên** pirî caran tiştê ku di serê wî de bû nîqaş dikir. Şexsperestî bûbû sedem ku Serok xwe hertim mezin bibîne û pê bawer bike ku nav xelkê de tê hez kirin û ev yek çarenivîsa wî ye ku peyameke taybet *(rîsaleyekê)* bigihîne xelkê. Balkêş e ku **Esad** di van demên dawîyê de ji rojnamegerekî re got ku: *"Ez jiyaneke asayî dijîm. Ji ber vê yekê ez têm hez kirin".* (3) Encameke din a şexsperestîyê jî ew e ku serok, çi **Sedam** be çi **Esad,** xwe weha dibînin ku ew tu caran nikarin werin rexne kirin: Ne xem e çiqas biryarên nebaş hatibin stendin jî, teqez kesekî din berpirsîyar e. Alîyekî xerab a vê pêvajoya biryarstendinê jî ew e ku ev serokên tîran ji ber wê elaqaya ku ji çapemenîyê distînin û pesndanên bênavber ên ji hevkar û xebatkarên berdestên wan, her ku diçe ji rastîyê dûr dikevin, diqetin. (4)

### Rekoreke şahane

Him li Iraqê, him jî Sûrîyeyê û him jî li Lîbyayê xofa mezin a dilê xelkê, ku tu caran nediçilmisî, di warê dirêjahîya van rejîmên otorîter de qisasa bigehîn bû. Di 1987ê de di kombûneke digel serbazên pilebilind de **Sedam Husên** di warê bikaranîna şideta li dij muxalîfên xwe de gelek bi biryar bû, ku wî di gotûbêja xwe ya digel Serokê Ewlekarîya Giştî (*al-amn al-Şam)* de gotibû: *"Em li vê derê ne da ku xizmeta gelê xwe bikin, ne ku em wan bikujin. Lê belê kesên ku divê werin kuştin dê werin kuştin. Em dê wan ser jê bikin da ku xizmeta 15 mîlyon [Iraqîyan] bikin".* (5) Li Sûrîyeyê weha xuya dike ku her ku zordestî zêde dibe tirs û xofa nav jî kêmtir dibe. Wekî ku yek ji çavdêran ragihandibû: *"Guleyan tirs kuşt"* û ev rastî ji bo rejîmê gelek dijwar dike ku hikûm li xelkê bike. (6)

Berdêla ku van serokan ji qelehandina koka muxalefetê dan, ku hin ji wan navxweyî bûn, ev bû ku ew guh nadin rastîyên ku ji alîyê serok artêş û muxaberatê dihatin gotin. Di tomarên dengî yên sala 1992ê, ku tê de dagîrkirina Kuweytê û raperîna li dû wê ya sala 1991ê (7) dihat rave kirin, em dengê zavayê **Sedam Husên, Husên Kamil** dibihîsin, ku wê demê hevkarekî nêz bû. Ew dibêje:

**Husên**: Rastîya ku divê em ji te re bibêjin ew e ku ji bilî du sê heban piranîya serbazan revîyan.
**Serok**: Kesên bi şeref di rewşên weha de rengê xwe yê rastîn nîşan didin.
**Husên**: Ji ber gelek sedeman, ên wekî tirs, me wêneya rast a rewşê nîşanî te neda. Me nexwest tu bifikirî ku em dê têk biçin. Em gelek li ser fikirîn ka me çima rastî ji te re negotin. Wekî mînak Kuweyt: Moral di asta herî jêr de bû, lê belê dema ku [General] hatin da ku bi te re bipeyivin me nikaribû rastîyê bibêjin, yan jî te der barê rewşa ku em tê de bûn agahdar bikin. (8)

Him **Sedam Husên** û him jî **Beşar Esad** li hember raperînên li welatên xwe gelek heyirîn û li her du welatan hat dîtin ku kesên derdora wan wekî lijneya şêwirmendîyê rast nexebitîne. Kesên ji vê derdora nêzîk ji endamên malbat û eşîran pêk dihatin. Li her du rejîman, bira û pismaman, ku bi keçikekê ji malbata serok zewicîne, şov bi rê ve dibir. Li alîyekî, vê yekê rê li çembereke hevgirtî û piştgir vekir, ku heman berjewendî parve dikirin û wan dizanî ku heger serok bikeve, ew jî dê pê re bikevin û hêz û pereyê xwe wenda bikin. Ji alîyê din de jî ev yek bû sedema nebûna nîqaşên durust û vekirî. Li Iraqê, her ku dem çû, piranîya biryaran bêyî ku bi awayekî cidî bi serokatîya bilind were şêwirîn, rasterast ji alîyê **Sedam Husên** ve hatin girtin. Wekî mînak, di sala 1990ê de berîya dagîrkirina Kuweytê derbarê vî kiryarê hema bêjin tu nîqaş nehat kirin, lê belê di salên 1979-80yê de di dema şerê Iran-Iraqê de çendîn nîqaşên siyasî û serbazî hatibûn kirin.

Li Iraqê domdarîya rejîmê dikare bi van sedeman were rave kirin: Biryardarîya serokatîyê ya di warê jiholêrakirina muxalefetê de, him serbazî him jî sivîl; dilxwazîya rejîmê ya bikaranîna şidet û tirsê ji bo hikûmkirina gel; pergala wê ya berfireh a xelatkirinê, serkeftina wê ya bi hejmarên zêde berhevkirina dilxwazan, herçend piranîya wan ne çalak bûn jî; fêrisa wê ya di warê mêtina zîrekî û jêhatîbûna iraqîyên perwerdekirî ji bo avadankirina welêt û dewamkirina pergala xwe de; û ya dawî jî keleşî û fenekîya **Sedam Husên** ya di warê tepisandina dijber û reqîbên xwe de. Wî herweha tu caran nehişt ku kurên wî **'Uday** û **Qusay,** hêzdar bibin ku li hember wî rabin. **Sedam Husên** têkçûn û têkoşînan xwe bi sergiranî û kontrol pêşwazî kirin. Sedema vê yekê him karaktera wî ya hêzdar û him jî bîr û fikra wî ya xeyalî bû. Wekî mînak, wî xwe (û gelê xwe) îqna kiribû ku ew di şerê li dij Îranê de bi ser ketibû, herçend welêt gelek însan û gelek çavkanî ji dest dabûn. Balkêş e ku Esad jî idîa kiribû krîza heyî nabe sedem ku ew bi şevê ranekeve û wî ji rojnamegerekî re gotibû: *"Ez kesekî sakîn im..., ez bi hestîyarî nêzî krîzan nabim. Ez bi sergiranî nêzî wan dibim. Ev yek min berhemdartir dike û bi vî awayî dikarim çareserîyan bibînim".* (9)

**Sedam Husên** li nav welêt xwedî kontrola li ser hêzên sereke yên desthilatdarîyê bû. Ne di nav partîyê de ne jî di nav derdora nêz de reqîbekî cidî hebû, ne jî yek xwedî bandor bû ku li hember wî rabe. Piştî ku ew bû serok **Sedam Husên** bi awayekî aşkere ji wezîrên xwe re gotibû ku berpirsîyarîya wan ew e ku ew *"ji Lijneya Serokatîyê ya Şoreşê fermanan bistînin û bi destûrmendîyeke nizim wan bi cih bînin, heta ku ew bi giştî werin pêk anîn".* (10) Heman rewş li Sûrîyeyê jî heye, ku li vê derê jî burokrasî *"dezgeheke bi hêza piçûk e".* (11)

Jê wêdetir, hêz û demdirêjîya **Sedam Husên** dikare bi zîrekîya wî ve jî were girêdan, ku dikarî xwe zûka li gor rewşê biguherîne. **Sedam** guherbar bû û carna, dema ku bidîta ku wî tiştek xelet hesab kiriye, wî dê fikra xwe biguheranda, herçend wî tu caran qebûl nedikir ku wî di biryara xwe de xeletî kiriye. **Sedam Husên** li hember pêşketinên siyasî re bi dorê de di warê eşîrî, ol û rewşa jinan de guhertinên berbiçav pêk anîn (12), ku vê yekê dema wî dirêjtir kir. Lê belê vê desthilatdarîya mutlaq pêvajoyeke derizandî ya biryarstendinê ava kir, ku wê jî rê li hesabkirinên şaş vekir. **Sedam Husên** nerazîbûna li hember dagîrkirina Kuweytê ya sala 1990ê û cidîbûna îdareya amerîkî ya dagîrkirina Iraqê ya sala 2003ê piçûk dîtin û lewma ji ber van biryaran berdêleke mezin da.

Li Sûrîyeyê ji ber ku **Beşar Esad** serokatî wekî mîrat wergirt, (ji bavê xwe û ji **Sedam Husên** cudatir, ku ew herdu jî mecbûr bûn ji xwe re bingeheke zexim a siyasî ava bikira) ew bêhtir muhtacî malbata xwe ye, nemaze jî birayê xwe **Maher Esad**ê serokê Berevanên Komarê. Bi giştî mîratwergir wekî damezirînerên rejîman, mayînde nînin. Ji **Esad** jî, di serokatîya wî de ev yek dijwarîya mezin a pêşîn e û dê dem nîşan bide ka hîzba naxweyî dê ji bo vê krîzê çareserîyekê bibîne, yan jî ew dê li jêr zexta navxweyî û ya ji derve, ku her ku diçe mezintir dibe, ji hev keve.

Ezmûna dem ya ji bo her du serokan dilsozîya wan kesên nav serokatîyê ye/bû. Herçend reva ji serbazîyê ya li Iraqê, nemaze jî piştî raperîna 1991ê, ji bo rejîma Iraqê bû dijwarîyeke mezin jî, vê yekê tu caran gef li demdirêjîya rejîmê nexwar. Beasa Iraqî çawa ku serî bi pirsgirêkên din derdixist, wisa jî bi vê pirsgirêkê derxist: Xelat da wan kesên revok îxbar kirin û revokên girtî jî ceza kir. Lijneya Serokatîyê ferman da ku ne bi tenê guhên revokan dê were jê kirin, herweha yên wan kesan ku alîkarîya wan jî kirine. Balkêş e ku **Sedam Husên** ji desteya wezîran re weha gotibû: *"Min gelek caran hewl da ku fikra lijneyê ya di warê jêkirina guh û destan de biguherînim, ji ber ku ez dizanim ku bi vê operasyonê dora pênc şeş hezar kes dê werin kuştin... Lê talîyê ez jî digel wan hevbîr bûm."* (13) Hîna pir zû ye ku mirov guman bike ka revên ji artêşa Sûrîyeyê bibe nakokîya hizbên nav partîyê rê li cudabûnan veke yan na, lê belê meyla rejîmê ew e ku xwe bispêre hejmareke hindik a yekîneyên dilsoz û hêzên ewlekarîyê da ku li dij muxalefetê şer bike.

### Redkirina heqîqetê

Heger rista navendî ya serokatîyê û faktorên li jorê ku bandorê li ser mekanîzmeya biryarstendinê dikin, li ber çavan werin ragirtin, serokên wekî **Sedam Husên** û **Esad** ji bo pirsgirêkên xwe çareserîyên dembûrî dibînin, ku bi vî awayî ji bo manevrayên wan cih vedibe. Ew bi bawerîyekê weha tevdigerin ku ew rast in û di maweya dûr û dirêj de dem dê bi wan re be. Di salên 1980yê de, di dema şerê Îran-Iraqê de **Sedam Husên** red dikir ku qebûl bike ku rejîma **Xumeynî** hilnaweşe û Îran bi awayekî hêsan nayê têk birin. Dema ku şer qedîya, **Sedam Husên** ev yek wekî serkeftinekê ragihand û got*: "Em [ez] ferman didin ku gelê Iraqê pîrozbahîyan li dar bixe. Divê ji iraqîyan re were gotin."* (14)

Di salên 1990ê de, Neteweyên Yekgirtî gelek jest kirin lê ji bo çend salan bernameya neft-ji-bo-xwerek qebûl nekir ji ber ku wî hêvî dikir ku teklîfeke baştir were.. (15) Bi vî awayî ew di vê serdemê de bû sedema êş kişandana gelek iraqîyan. Herweha, peymana **Beşar Esad** a ji bo avakirina komîteyekê ji bo lêkolîna guhertinên destûrî, yan jî ji bo dawîleanîna şidetê qebûlkirina bernameya *Cema'eta Dewletên Ereb* hemû rêyên derengxistina tawîzan e ku ew pê hêvî dike ku ev taktîkên derengxistinê wê talîyê bi kêrî wî werin.

Digel hemû wekhevîyan, ku li jorê hatin gotin, di navbera herdu rejîman de cudatî hene: **Sedam Husên** sîstemeke du-tercîhî ava kir û toreke berfireh a cezakirin û xelatkirinê pêk anî ku bi vî awayî, li hember şer, raperîn û mueyyîdeyên giran, rejîmê 35 salan ajot.

**Sedam Husên** herweha ji xwe re bingeheke dilsoz jî kom kir, ku heta dawîyê pê re ma û şik û guman heye ku heger dagîrkirin pêk nehataya, **Sedam Husên** dikaribû wê demê ji karê xwe were dûr xistin. **Beşar Esad** rejîm û bingehên wê yên hêzê wekî mîrat wergirt. Lê belê bingehên wî yên hêzê ne eskerîyeke xwedî rehên kûr e, ne jî wekî ya **Sedam Husên** siyasî ye. Wekî din, Iraq welatekî dewlementtir e û aborîya wê ji ber mueyyîdeyan pirtir bûbû navendî, ku bi vî awayî rejîma Iraqê karibû bandora xwe ya li ser karsazên Iraqê girantir bike. Lê belê aborîya Sûrîyeyê vekirîtir e û hilweşîna aborîya Sûrîyeyê dikare piştgirîya navxweyî ya ji bo **Esad** bixe xeterê. Biryara rakirina qedexeya li ser malê îthal a meha cotmehê, bandora karsazan a li ser rejîmê nîşan dide. Herweha, reva pereyê Sûrîyeyê ber bi derveyî welêt, nemaze bo Lubnanê, ji bo rejîmê elameteke baş nîne.

Pirs ev e: Gelo **Beşar Esad** dikare rejîma xwe ji vê krîzê derxe, yan na û gelo ew û hizbên navxweyî dikarin piştî krîzê her hebin, yan ew jî serî li dek û dolabên din bide da ku rejîma wî li ser pîyan bimîne û wekî **Sedam Husên** paşê lê hay bibe ku hesabên wî pûç in?

* Profesor, li Unîversîteya Georgetown (Washington, DC) û nivîskarê pirtûka ''*Saddam Hussein's Ba'th Party: Inside anAuthoritarian Regime,* Cambridge University Press, 2012.

1 Baas (peyva ku tê wateya "vejîn") ku ji sûrîyî bêhtir weke partîyeke ereb dihat dîtin û armanca wê pêkanîna yekîtîya neteweya ereb bû, di 1943ê de li Sûriyê ji alîyê komek ronakbîr ve bi pêşengîya xiristîyanekî bi navê Michel Aflak, û misilmanekî sûnî ê bi navê Salah Al-Dîn- Bîtar ve hat ava kirin

2 Hevpeyîna digel generalekî ku di kombûnê de amade bûye. Gotinên Sedam Husên bi erebî: "*La-asmah lil jawanab al-sawdawiyya illa al-jawanab al-mushriqa*." Semînar di 27ê çirîya paşîn 1995ê de bi rê ve çû

3 *The Sunday Telegraph*, 30 cotmet, 2011. Hevpeyvîna digel Beşar Esad, ji alîyê Andrew Gilligan

4 Hevpeyvîna rojnamevana amerîkî Barbara Walters ya li gel Bachar Al-Assad, ABC, 6 kanûn, 2011

5 Tomarên dengî yên civîna Lijneya Serokatîyê, gulan 1987, Navenda Lêkolînê ya Tomarên Pevçûnê- *Conflict Records Research Center (CRRC)*, SH-SHTP-A-000-958

6 Alain Gresh, "Rojên Aloz ên li Sûrîyeyê," *Le Monde Diplomatique*, Tebax 2011, r. 6

7 Serhildaneke li dijî rejîmê, bi taybetî li herêmên şiî û kurd, hema piştî têkçûna Iraqê li Kuweytê, pêk hat

8 Kombûna Sedam Husên digel alîkarên wî yên payebilind, 1992 [n.d.], *CRRC*, SH-SHTP-D-000-614. Husên Kamil di havîna 1995ê de ji Iraqê revîya çû Urdunê û piştî vegerê digel birayê xwe hat kuştin

9 *The Sunday Times*, 20 çirîya paşîn, 2011. Hevpeyvîna digel Beşar Esad, ji alîyê Hala Jaber

10 Gotûbêja Sedam Husên digel desteya wezîran, 31 tîrmeh 1979, *al-Mukhtarat*, cild. 7, r. 54. [*al-Mukhtarat* koleksîyoneke 10 cildî ya axaftin û hevpeyvînên Sedam Husên e.]

11 Raymond Hinnebusch, *Hêza Otorîter û li Sûrîyeya Beasê avabûna dewletê: Şoreşa Sûrîyeyê ji jorê de (Authoritarian Power and State Formation in Ba'thist Syria: Revolution from Above)* (Boulder, CO: Weşanên Westview, 1990), r 190

12 Di destpêka desthilata xwe de, piştî meşandina şerekî li dijî eşîrîyê û têkoşînek ji bo kêmkirina tesîra dîn û pêşxistina mafên jinan, wî ji vê siyaseta xwe çerx kir, bi taybetî jî di dema şerê li dijî Îranê de

13 Tomara dengî ya kombûna desteya wezîran, 21 sibat 1994, *CRRC*, SH-SPPC-448

14 Tomara dengî ya kombûna meha tebaxê 1988, *CRRC*, SH-SHTP-A-000-816

15 Bernameya ji alîyê RNYê ve hat bi cih anîn, ji bo ku derfetê bide Îraqa ku piştî dagîrkirina Kuweytê di 1990ê de ambargo li ser hat danîn, ku heta radeyekê bikaribe îxracata petrolê bike û di berdêla wê de qût, derman û berhemên ji bo jîyanê zarûrî, wergire. Iraqê wê heta gulana 1996ê jî îmzeya xwe neavêta ser vê peymanê

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

## DESTESERKIRINA MÛÇEYAN

# Lihevkirina Berlînê

ANNE DUFRESNE *

Bi bahaneya krîzê, Yekîtîya Ewropayê êdî dixwaze li ser dewletên endam siyaseta alman a mûçeyên kêm –hema tiştê ku sedema sekanîya aborî ya herêma euroyê ye ferz bike. Li hemberî vê êrişê sendîkayên ewropî di bipêşxistina stratejîyeke koordonekirî de zehmetîyan dikişînin. Weke gelekên din karker û mûçegirên ewlekarîyê yên balefirgehan ên fransî jî ji siyaseta aborîya şidandî û xirabkirina şert û mercên kar derb xwarin; wan bi grevê bersiv da. Di vê çarçoveyê de daxwazên kevin ji nû ve derdikevin holê. Daxwaza reformîst a mûçeyekî herî zêde. Daxwaza şoreşger a civakeke ku tê de yên ku dewlemendîyan hildiberînin wê herweha xwedîyên hêza aborî bin.

Nîsana 2010ê, "Troîka" ya ku ji Komîsyona Ewropayê, Bankeya Navendî ya Ewropî (ECB) û Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) pêk tê, dest werdide pêvajoya hevdîtinên li ser peymanên kar ên giştî li Yewnanistanê. Ew doza qederê % 25 daxistina mûçeyan di sektora dewletê û herweha doza kêmkirina mûçeyê herî kêm dike. Meha hezîranê heman sêserîyê ferman da hukûmeta Romanyayê "*qanûneke kar a sererastkirî û qanûneke li ser hevdîtinên peymanên kar ên giştî qebûl bike da ku buhayê îstîxdamê kêm bike û fleksîbîlîteya mûçeyan jî çêtir bike.*" (1) Salekê piştre Komîsyona Ewropayê di dawîyê de bang li Belçîkayê kir da ku sîstema xwe ya endekskirina mûçeyan reform bike, argumana wê jî "buhayên yekeyî yên heqdestê karker [y] ji yên li sê welatên cîran (Franse, Almanya, Hollanda) bileztir zêde bûne" ye. (2)

Yewnanistan, Romanya, Belçîka... ji çend mehan û vir ve Brukselê beridîna mûçeyan li navenda stratejîya xwe ya çareserîya krîza ku Ewropayê dihejîne, datîne. Ya ji vê jî çêtir ew e ku Komîsyon otorîteyên neteweyî hişyar dike da ku mûçeyan kêm bikin. ***Peymana Maastrichtê*** ya ku 1ê çirîya paşîn a sala 1993ê kete meriyetê, digirte ser xwe ku "*Yekîtîya Ewropayê der barê kirinên wan ên pêwendî mijara heqdestan de, ne zextê li dewletên endam dike, ne jî pişta wan digire*" (xala 2.6), ev xal di Peymana Lîzbonê de jî hat parastin.

Erê pirsa mûçeyan di destpêkê de li derveyî îmtiyazên Yekîtîyê hat hiştin, belê şertên ku Yekîtîyê ferz kirin –ji kontrola li xwe kêmkirina budceya dewletê heta bi ya deynan– armanca wan ew bû "nermkirina mûçeyî" misoger bikin. Lê belê ev birêvebirin ji dûr ve tê pêk anîn, bêyî destwerdaneke yekser. Êdî rewş weke berê nîne. Û li gor serokê Komîsyona Ewropayê tu alîyê anektodîk ê beridîna dawî ya kirina Brukselê nîne. **José Manuel** Barroso îdîa dike "*ya ku niha diqewime, şoreşeke bêdeng e, bi gavên piçûk, ber bi birêvebirineke aborî ya xurttir ve. Dewletên endam ev yek qebûl kirin –û ez hêvî dikim ku wan qenc fêmkiribin – di warê kontrolê de hêz û erkên girîng bidin saziyên ewropî*". (3)

Hikûmetan biryar da ku bi hev re di nava koordînasyonê de bin da ku di asta ewropî de siyaseteke hevpar a kêmkirina mûçeyan bi rê ve bibin. Peymana "euro plus"ê ya ku adara 2011ê hat pejirandin, berepaştandina modelên hevdîtinên li ser peymanên kar ên giştî bi leztir dike. Ji sînordarkirina deynan û lihevderneketina budceyên dewletan –ku dixwaze di qanûnên her welatî de nivîsîbin– û wê de Yekîtîya Ewropayê êdî dixwaze têkilî bi hevdîtinên neteweyî bike da ku têgeha xwe ya disîplîna mûçeyî ferz bike. "Paketa li ser birêvebirina aborî ya ewropî (six-pack)" ya ku Parlemana Ewropayê di çirîya pêşî ya 2011ê de erêkirî, li peymana –angajmaneke besît a di navbera dewletan de –ferzên huqûqî jî tê anîn.

Ev amûra ku ji şeş kirinên huqûqî ên ewropî pêk tê, bi lezgînî û bi tevahî bi dizî hat erê kirin. Yên ku vê amûrê bi rê ve dibin Birêveberîya Giştî ya Karûbarên Aborî û Malî (BGKAM), wezîrên aborîyê û ECB ne, ya pêş tê dîtin ev e: Heke "*nelihevkirina makroekonomîk*" yan jî "*newekhevîyên hevrikîyê*" ku li Brukselê weke zêde tê nirxandin, hebe "paneleke kontrolê" wê li zengilê hewarê bixe. Heke welatek xwe li gor pêşnîyazan eyar neke, hingê mirov wê bikaribe cezayên malî li ser ferz bike. Heçî mûçe ne, nîşana mîqdara wan ku weke amûra pîvana vê mîmarîyê hatiye hilbijartin, ne tesadûfek e: Buhayê yekeyî yê kedê (BYK) li şûna dewlemendîya para mûçeyan hatiye tercîh kirin. (4) Nîşana pêşî beridîna heqdestan bi nisbet a li Yekîtîya mayî dide nîşan, ya diduyê dabeşkirina dewlemendîyê di navbera kar (mûçe) û sermayeyê (kara ji hilberandinê) dide nîşan. Peyva "behredarîya hevrikîyê" cewherê projeyê baş venaşêre: Dijwarkirineke hevrikîya di navbera mûçegirên ewropî de di nav Yekîtîyekê de ku plankerên wê îdîa dikirin ku ev yekîtî wê hevkarîya di navbera endaman de li beramberî derve destek bike...

Modeleke nû jî zûzûka hate lêkirin: Almanyaya ku reformên **Gerhard Schroder** (1998-2005) veguherandî bêqusûrîya modernîteyê. 30ê adara 2010ê **Christine Lagarde** ya ku hingê wezîra aborîyê ya Fransayê bû ev çavdêrîya li jêr dikir: "*Almanyayê di nav deh salên dawîyê de karekî bêqusûr bire serî, pê behredarîya hevrikîyê çêtir kir, ev jî bi zexteke mezin a li ser buhayê kedê pêk anî.*" (5) Demekê piştre **Jean-Claude Trichet** yê ku hingê birêveberê ECByê bû, qenc îşaret bi vê yekê dikir: "*Ji şirketên alman hat ku xwe bi lez û bez li gor globalbûnê eyar bikin. (...) Pir baldarbûn û hestiyarbûna der barê bûhayê hilberandinê de û destpêkirina reformên ekonomîyê nerm û rewan dikin, dikare ji bo tevahîya cîranên wê bibe mînak*". (6)

Bi her halî navê "*rêhevalê patronan*" evqasî zû li **Schroder** hat kirin, lewra şerê wî yê ji bo behredarîya hevrikîyê bi têkçûn û derbxwarineke civakî bi encam bû. Jixwe em behsa wê nakin ku stratejîya alman a dezînflasyona hevrikîparêz – zêdekirina behredarîya hevrikîya ixracatan bi kêmkirina mûçeyan– mînakeke bêqusûr a li dijî hevkarîya ewropî pêk tîne. (7) Dawîya salên 1990ê Almanyayê ev siyaset bi xirabûna tewazûna xwe ya bazirganî û jidestdana kartêkerîya aborîya xwe di encama yekbûna Almanyayê de rewa dikir; halê hazir nîşanekên bi îmtiyaz ên bi ortodoksîyê heyî niha êdî keskê [rewşa baş, nota wergêr] nîşan didin. Lê belê buhayê vê yekê çi bû...

Li forumeke aborî ya cîhanî a li ***Davos***ê sala 2005ê, Schroder pê razî ye û xwe bi xwe pîroz dike "*me yek ji sektorên herî baş ên mûçeyên wê kêm li Ewropayê afirand*". Ji 2003yê ve siyasetên nerm û fleksîbilkirina bazara kar (qanûna Hartz) Almanya têra xwe xizan kir. Karê demî veguherî sektoreke bi serê xwe, hin alîkarîyên bêkarîyê yên ku li gor hatinîyê bûn bi tevahî jê hatin birin û "mini-jobs [karên piçûk, yan jî hûrik, nota wergêr]" (Karên fleksîbil ên ku mûçeyê wan mehê 400 euro ye) derketin holê. Sala 2011ê %40ê karkeran bi peymanên demî hatibûn îstîxdam kirin û 6.5 mîlyon mirov jî bi "mûçeyê kêm" (saetê kêmtirî 10 euroyan) (8) dihatin xebitandin. Peymanên kar ên giştî jî pir nazik bûn, di nava tevahîya welatên Rêxistina Hevkarî û Bipêşxistina Aborî (OECD) de Almanya ew welat e ku mûçe lê di navbera 2000 û 2009ê de herî hêdî zêde bûne. Di şertên bi rastî de (ango heke mirov înflasyonê li ber çavan bigire) mûçe % 4.5 kêm bûn, di heman demê de li Franseyê % 8.6 û li Fînlandîyayê % 22 zêde bûn. (9)

Dema mirov Almanyayê weke modeleke rizgarbûna ji krîzê nîşan dide, gelek kes hîç îşaret pê nakin ku Berlîn dikare berhemên xwe yên hilberandî bifiroşe, lewra hevparên wê jê dikirin. (10) Ango îxracatên alman girêdayî serfkarîya welatên din ên li herêmê ye, ew bixwe girêdayî hêza kiryarîyê ya xelkê û gelan e. Yan jî em bi rengekî din derbibirin: Lihevderneketina bazirganî ya hinan maye, lixwezêdekirinên yên din e. Heta wê radeyê ku li gor aborîzanê brîtanî û ji edîtorên *Financial Times*ê Martin Wolf ji bo hedinîna krîza heyî pêwîst e di vî warî de "*Almanya xwe kêmtir alman bike*". (11) Bi her halî, xweykerametên li Brukselê ji ya xwe nayên xwarê: Bang li paytextên ewropî hat kirin bi zarê Berlînê bikin.

Perspektîfeke ku serketina mentiqî ya dînamîkeke kevin pêk tîne.

Salên 1980yê Sîstema Pereyan a Ewropî (EMS) li endamên xwe siyaseteke xwegirêdana bi markê alman û serîtewandina li cot-ortodoksîyeke pereyî û budceyî ferz kir û otorîteyên alman in ên ku vê cot-ortodoksîyê ferz dikin. Hingê tedbîrên cihê destûr didan dewletan ku lêçûnên xwe yên elaqedarî hilberandinê baştir bikin: Devaluasyon (lîstika li ser rêjeya bihevguhertina pereyên dewletên cihê) û dezînflasyona hevrikîyê (lîstika li ser mûçeyan, bac û hwd.). Destpêka salên 1990ê pîvanên sererastkirinên strukturel ên ku Peymana Maastrichtê ew ferz dikirin bixwe xizmeta vebijarka koordînasyona lîberal a siyasetên aborîyê dikir, ku encama têkilîyên hêzê yên di navbera welatên mezin de ye.

Fransayê weke garantîya întegrasyona ewropî ya Almanyayeke hê nû yekbûyî doza pereyê yekbûyî û yekane dikir, serokwezîrê alman Helmut Kohl bixwe modela alman a bankeya navendî û fikra xwe ya sabît ya dij-înflayonîst ferz dike. Lihevderneketina budceya dewletê nabe ku % 3ê Hilberîna Nesafî ya Neteweyî (HNN) bibihure, deynên dewletê nabe ku % 60ê HNNê bibihure û hukûmet divê ji xwe re bikin armanc ku îstiqrara buhayan bigihînin asteke jortir (ango "*rêjeya înflasyonê divê ji navînîya rêjeya înflasyonê ya sê dewletên endam ên xwedîyên rêjeya herî kêm a înflasyonê bêhtirî 1.5 puwanan nebihure*"). Di wê qonaxê de hê heqdest nebûne mijara ti birêveberî û destwerdanên yekser.

Sala 1999ê jidayikbûna euroyê werçerxek e: Pereyê yekbûyî û yekane her awayê devaluwasyonê yan jî lîstikên din ên li ser rêjeya bihevguhertinê da ku behredarîya xwe ya hevrikîyê xurttir bikin li dewletan qedexe dike. Encama vê yekê: Mûçe vediguherin guherbera dawî mayî ya sererastkirinê ji bo ku lêçûnên têkildarî hilberandinê kêmtir, yan jî baştir bikin. Ev rewşek e ku zexteke misêwa li hêza kiryarîyê ya karkerên ewropî dike. Di vê demê de siyasetên lihevkirinên li ser şertên kar ên giştî ji binî ve guherîn û pir zêde ketin rewşeke xweparêz. Di bin zexta ji nû ve avabûna heyî û zêdebûna bêkarîya girseyî de gelek sendîkayên ewropî (di serî de yên alman) daxwazên xwe ji ber çavan re derbas kirin û kêm kirin. Ji ber ku di bin zexta tehlûkeya zirarkirina li behredarîya hevrikîya neteweyî de hevdîtinan dikin, mijara ku li pêş digirin ne zêdebûna mûçeyan, lê belê parastina kar û îstîxdamê ye.

Rêzeke direj a lihevkirinên şirketan ên ku qebûl dikin dema kar di berdêla parastina îstîxdamê de were zêde kirin, meyila bênirxkirina lihevkirinên li ser şertên kar a beşên pîşeyî li seranserê Ewropayê baş nîşan dide; sala 2004ê li Siemensê (Almanya) yan jî sala 2005ê li Boschê (Fransa). Dirêjkirina dema kar muqabilî kêmkirina buhayê kar û kedê ye. Jean Lapeyre ê ku wê demê sekreterê giştî yê Konfederasyona Ewropî ya Sendîkayan bû dibêje: "*Konfederasyona Ewropî ya Sendîkayan (CES)difikirî ku nermkirina siyaseta mûçeyan kêlîyeke pêwîst bû di demeke bêkarîya pir zêde (li Yekîtîyê % 12 heta % 13ê). Em difikirîn ku jî bo xêra wê bide îstîxdamê divê em vê tawîzê bidin.* (...) *Paşê me wisa his kir ku karbidestan em xapandine, xiyanet li me kiriye, lewra beşa mûçeyê her kêmtir dibe bêyî ku îstîxdam baştir bibe*". (12)

Di çarçoveyeke bi vî rengî de êriş tê ser cewherê mûçe bi xwe. Heta hingê mijara nîqaşa siyasî ya bêqusûr bû, êdî ew daxistin asta hêmaneke bêesl û pespaye ya zexta înflasyonîst, yan jî başkirina behredarîya hevrikîyê. Ev jî di encamê de rê li ber bi tevahî dana alîyekî ya pirsa heyatî ya ji nû ve dabeşkirina dewlemendîyan. Di asta Yekîtîyê de aktorên aborî yên ku bi vî awayî dest datînin ser mijarê, bi dilê xwe rola qada siyasî di tercîha vebijêrkên siyasî bêtesîr dikin. Li gor wan hevkarên civakî –yên ku banga berpirsîyarîyê li wan hatiye kirin– nabe ku ji bilî destûrdana kemkirineke hewce ya BYKyê pêve daxwazên wan ên din hebin: "*Hevparên civakî divê îsbatkirina heman hisa berpirsîyarîyê dewam bikin û li dewletên endam li ser mûçeyan lihevkirinan bikin yên ku li prensîpên giştî yên di meyildarîyên mezin ên siyasetên aborî de tên.*" (13)

Di teorîyê de mûçe ji qada karbidestîya civakî ya Brukselê derxistî ye, lê belê di rastîyê de ketiye nav qada siyasetên aborî ên Yekîtîyê. Jixwe qeyda makro-ekonomîk a Yekîtîyê tu rêya din vekirî nahêle ji bilî kêmkirina mûçeyan a organîzekirî. Ji ber ku di çarçoveya huqûqa ewropî de tu çarçoveya hevdîtinên li ser şert û mercên kar ên giştî yên ewropî, yan jî tu ahengdarkirina ji jor ve niha ne mewzûbehs e, hevdîtin ji bilî bi rengê.... kêmkirina mûçeyan nayê sêwirandin. Weke ku mirov nikaribe li koordînasyona hevdîtinên peymanên kar ên giştî ên ji bo zêdebûna mûçeyan bifikire.

* Sosyolog, wezîfedara lêkolînê li Fonds National de la Recherche Scientifique (FNRS) li Belçîkayê. Nivîskara *Le Salaire, un enjeu pour l'euro-syndicalisme. Histoire de la coordination des négociations collectives nationales* (Mûçe, mijareke sendîkalîzma ewropî. Dîroka koordînasyona hevdîtinên li ser peymanên kar ên neteweyî), Presses universitaires de Nancy, 2011.

1 Nameya niyeta hukûmeta Romanyayê ji IMFyê re, 16ê Hezîrana 2010ê

2 Komîsyona Ewropayê, "Evaluation du programme national de réforme et du programme de stabilité 2011 de la Belgique (Nirxandina bernameya neteweyî ya reform û bernameya îstîqrarê ya Belçîkayê ya sala 2011ê)", Bruksel, 7ê hezîrana 2011ê

3 Guftûgoya li Institut européen de Florence, 18ê hezîrana 2010ê

4 Bixwîne François Ruffin, "Partage des richesses, la question taboue (Dabeşkirina dewlemendîyan, pirsa tabû)", *Le Monde diplomatique, çile* 2008

5 "Lagarde au Conseil des ministres allemand (Lagarde li Desteya Wezîran a Alman)", *Le Figaro,* Parîs, 30ê adara 2010ê

6 "Les pays de la zone euro doivent faire des efforts (Welatên herêma euroyê divê tawîzan bidin)", *Le Figaro,* 3ê îlona 2010ê

7 Bixwîne Till Van Treeck, "Victoire à la Pyrrhus pour l'économie allemande (Serketina qelp a aborîya alman)", *Le Monde diplomatique,* îlon 2010

8 Ji bo bêhtir agahdarî û tefsîlatê bixwîne Bispinck Reinhard û SchultenThorsten, *Trade Union Responses to Precarious Employment in Germany (Bersiva sendîkayan dayî îstîxdama xizan û perîşan a li Almanyayê)*, belgeyên guftûgoyê yên *WSIyê* hejmar 178, kanûn 2011

9 Rêxistina Navneteweyî ya Kar (ILO), "Rapport mondial sur les salaires 2010/2011. Politiques salariales en temps de crise (Rapora cîhanî li ser mûçeyan 2010/2011. Di dema krîzê de siyasetên mûçeyan)", Cenevre, çirîya paşî 2011

10 Qederê % 60 îxracatên Almanyayê diçin welatên herêma euroyê

11 Martin Wolf, "A disastrous failure at the summit (Li civîna bilind têkçûneke felaketwarî)", *Financial Times,* London, 14ê kanûna 2011ê

12 Hevpeyvîna bi nivîskêr re

13 Pêşnîyaza Konseyê a der barê meyildarîyên siyasetên aborî yên mezin de, 15ê hezîrana 2001ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Xizanî çiqasî nerazîbûneke yekdengî pêk bîne –divê mirov li dijî wê têbikoşe da ku dinyayê bike cihekî adiltir- jî, dewlemendî pir kêmtir weke pirsgirêkekê tê dîtin. Lê belê bi bahoz û firtoneya malî re, têkilîya di navbera herduyan de ji nû ve derkete holê. Di wê demê de berîya bêhtirî sedsalekê fikrek li Dewletên Yekbûyî (Amerîka) ji dayik bû: Bisînorkirina hatinîya yên herî dewlemend.

VEJÎNA DAXWAZEKE FERZKER

# Tesbîtkirina sînorê jor ê hatinîyê

SAM PIZZIGATI *

Ji gelek daxwazên ku milîtanên tevgera ***Wall Streetê Dagîr Bike***, yek heye ku reh û rişên xwe heta bi kurahîya dîroka Dewletên Yekbûyî (Amerîka) berdide: Bicihkirina sînorekî jor ji bo hatinîyên bilind. Ji serdema zêrîn a piştî şerê navxweyî yê amerîkî û vir ve, seferberîyên mezin ên ji bo edaleta aborî timî ev daxwaz jî di nav daxwazên xwe de dijimartin, îro navê "mûçeyê herî zêde" lê tê kirin. Di nav vê formulê de, ne bi tenê mûçe hene, belê tevahîya hatinîyên (deramed) salane jî dihewîne; ew dike ku mirov wê û "mûçeyê herî kêm" bişibîne hev û bi vê jî têkilîyekê di navbera her duyan de bibîne.

Fîlozof **Felix Adler** –nexasim jî pê navdar ku destpêka sedsala 20ê *National Child Labor Committee* damezrand û serokatîya wê kir– ew kes e ku pêşî ev daxwaz kir. Li gor wî çewsandina karkeran, çi ciwan û çi kal, dibe sedema pêkhatina dewlemendîyên pir mezin ên taybet ku "bandoreke bertîl û kurtêlxur" li jîyana siyasî a amerîkî dike. Ji bo sînordarkirina vê, ew pêşniyar dike ku baceke her ku diçe pir zêde dibe a ku dikare bigihêje heta bi sînorê bacdarîya % 100ê. Ev rêje wê "her tişta ku dikare bi kêrî pêkanîna jîyaneke mirovane were" ji ferd re bihêle û ya ku "ji bo xuyanîyê, pesndayînê û desthilatdarîyê ye" jî wê ji wî bistîne. (1)

Erê *New York Times*ê banga **Adler** gihand girseyên mezin, belê fikra "mûçeyê herî zêde" heta bi Şerê Cîhanê yê Yekem di qanûnan de cihê xwe negirt. Ji bo fînanskirina hewldanên ji bo şer, pêşverûyan hingê pêşniyar kir hatinîyên di ser 100 000 dolaran (dikin 2.2 mîlyon dolarên sala 2010ê) re heta bi % 100ê bacdar bikin.

### Tesbîtkirina sînorê jor ê hatinîyê, fikreke amerîkî

Koma ku destekê dide vê tedbîrê *American Committee on War Finance* e. Li seranserê welêt du hezar dildarên wê hene. Ew di rojnameyan de kûponên mirov dikare jê bikin, diweşînin. Armanc ew e ku xwendevanên rojnameyan bikaribin mohr bikin û pê bikevin nav doza "pêkanîneke bi lez a qanûnekê" li ser sînordarkirina hatinîyan: Komîte vê yekê weke "erkekî ferz ê dewlemendîyê" bi nav dike. Serokê komîteyê parêzer **Amos Pinchot** li pêşîya Kongreya Amerîkî got "*heke mafê dewletê hebe ku ji bo razîkirina berjewendîya giştî jîyana mirovekî desteser bike, hingê ji ber heman sedeman ew divê bêguman bikaribe dewlemendîya kesekî desteser bike.*" Wî piştre îşaret pê kir ku % 2ê amerîkîyan ji %65ê tevahîya dewlemendîya welêt di dest xwe de digirin. Encama ew digihêjiyê weha ye: "*Dewletên Yekbûyî ji dewletên din hemûyan bêhtir divê nikaribe şerekî bike yê ku hem bi kêrî berjewendîyên plutokratan tê û hem jî bi kêrî yên demokrasîyê. Heke şer xizmeta Xwedê dike nabe ku ew xizmeta xwedawendê îxtîrasê bike* (2)." **Pinchot** û rêhevalên wî yên pêşverû ya ku doza wê dikirin bi dest nexistin, lê belê kampanyaya wan bacdarîya neteweyî bi awayekî pir cidî guhert: Rêjeya herî bilind a li ser hatinîyên zêdeyî mîlyonek dolaran sala 1914ê % 7 bû û sala 1918ê ev rêje bû % 77.

"Tirsa sor [tirsa ji komunîzmê, nota wergêr]" a piştî Yekemîn Şerê Cîhanê (3) hêvîyên Amerîkayeke wekhevtir tune kirin. Dema rastgir dîsa bûn desthilatdar, ji Dewletên Yebûyî ji nû ve neteweyeke ku himbêza xwe li yên herî dewlemend vedike, çêkirin. Em di salên 1920ê de şahidîyê li pêvajoyeke bilez a danserheva dewlemendîyê dikin. Li Kongreyê demokrat û komarxwaz şer dikin da ku baca li ser dahatên zêde kêm bikin. Sala 1925ê rêjeya bacdarîyê ya herî bilind % 25 e.

Lê belê krîza 1929ê ya ku kir aborî were ber hilweşînê, ji nû ve rewş guherand. Sala 1933ê ji çar paran yekê karkerên amerîkî bê kar in. Daxwaza tesbîtkirina sînorekî dahatan ji nû ve xwe dide der. Li Louisianayê senatorê ciwan ê xwîna laşê wî dikele Huey P. Long tevgera Em Dewlemendîya xwe Parve Bikin da dest pê kirin. Ev tevger li seranserê welêt belav bû. Ew pêşniyaz dike ku sînorê dahata salane ji bo dahatên ferdî milyonek dolar be –ev mîqdar sala 2010ê teqabulî 15 mîlyon dolaran dike– û ji bo mîrasê jî sînorê 8 mîlyon dolaran were tesbît kirin.

Hezîrana 1935ê serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Franklin D. Roosevelt Amerîkaya dewlemend serûbinî hev kir, dema ku wî niyeta xwe eşkere kir ku dixwaze ji bo çareserîya krîzê "berdêlê bi dewlemendan bide dayîn". Hingê wî baceke % 79 li ser dahatên di ser 5 mîlyon dolaran (sala 2010ê ev mîqdar dike 78 mîlyon dolar) re çêkir. Vê biryarê -û kuştina Long di tebaxa sala 1935ê de– fikra dahateke herî zêde ji bo demekê dûrî çavan kir. Lê belê ev fikir nîsana sala 1942ê ji nû ve derkete holê. Rooseveltê ku gelek sendîkayan îlham dayê, pêşniyaz kir ku di dema şer de dahateke herî zêde biafirîne, ku dikarî salê herî zêde 25 000 dolaran (sala 2010ê ev mîqdar dike 350 000 dolar) bin. Ji ber ku dûrtir neçû sala 1944ê Kongreyê rêjeya baca li ser dahatên zêdetirî 200 000 dolaran li asteke berê nedîtî ango % 94ê dîyar kir.

### Di başbûna yên kêm dewlemend de berjewendîyeke şexsî û yekser a yên herî dewlemend wê hebe

Ji bo çîna navîn a amerîkî dewlemendîyeke mezin -rêjeya bacê ya bilind li derdora %90ê ye, wê di dema serokatîya Lyndon Johnson (ji çirîya paşîn a 1963ê heta çileyê 1969ê) de daketa kêmtirî % 70ê. Di dema Ronald Reagan de ev rêje wê hê biheliya heta ku sala 1981ê bi tenê % 50 bimaya, paşê sala 1988ê ev rêje daketa % 28ê. Îro ev rêje % 35 e, û li gor hinan ev rêje zêde ye. Lê belê heyf û mixabin ji bo dewlemendan piranîya kara ku ew didin zanîn ji karên ji sermayeyê, karên bi xêra kirîn û firotina hisse, temînat û hisseyên din e, ku baca ji wan tê standin bi tenê % 15 e. Statîstîkek vê beridînê bi kurtî rave dike: Sala 2008ê çarsed mukelifên herî dewlemend her yekî ji wan 270.5 mîlyon dolar kar kir û her yekî % 18,1 bac dan dewleta federal; sala 1955ê heman çarsedan 13.3 mîlyon dolar (weke dolarê sabît, bi rengê ku înflasyon li ber çavan hatî girtin) kar kir û % 51.2 bac dan.

Cihê nîqaşê guherî. Îro li navenda awirên paşîyên Adler, Pinchot û Long ji ferdan bêhtir şirket hene. Li gor wan astên cihê yên desthilatdarîyê (herêmî, eyaletî, federal) divê ji rastîya ku şirketên şexsî alîkarîya dewletê distînin –bi rengê îhaleyên dewletê, subvansîyonên ji bo "bipêşketina aborî" yan jî avantajên bacê– sûdê wergirin da ku ji wan doza siyasetên nû yên mûçeyî bikin. Divê yek dolara bi tenê ya ji bacê tê jî neçe ji kaseyên şirketên ku deh, bîst heta pêncî caran ji mûçegirên xwe bêhtir mûçe didin birêveberên xwe. (4) Raporeke Institut for Policy Studies vê texmîna li jêr dike: "*Dewleta federal halê hazir red dike bi wan şirketan re ku pratîkên wan ên nijadperest û cihêkarîya cinsî hene peymanên îhaleyan mohr bike. Mirov dikare serî li heman prensîpê bide ji bo ku peymanên bi wan şirketan re ku bi mûçeyên fehş ên birêveberên xwe newekhevîya aborî ya netewe zêde dikin, red bike.*" (5)

Armanca herî dawî çi ye? Mûçeyekî bi rastî yê herî zêde yê ku li gor mûçeyê herî kêm tê dîyar kirin, ku wê rengê wê mîna bacdarîyekê be ku her diçe pir zêde dibe, çawa ku Adler berîya sedsalekê pêşniyaz kiribû. Sînorê herî zêde wê weke çend qatên sînorê herî kêm were hesibandin û her dahata deh caran yan jî bîstûpênc caran ji vî sînorî herî kêm zêdetir e, % 100 bacdar be. Ev sîstem wê tavilê destekê bide aborîyeke piştgir û wê aborîyê têr bike: Ji bo cara yekem yên herî dewlemend wê di başîya yên kêmtir dewlemend de bibin xwedî berjewendîyeke şexsî û yekser.

Berîya tevgera Wall Streetê Dagîr Bike, awirekî bi vî rengî dişibiya xeyaleke siyasî. Êdî wisa nîne. Nîşanên demê: Du profesorên zanîngehê yên navdar ên amerîkî, yek jê li Yaleyê huqûqzan e, yê din li Berkeleyê aborîzan e, bi hev re di *New York Times*ê de gotarek bi awayekî pir bawerîyê bi xwe tîne nivîsand; ya alîgirîya reformeke bacê ya ku wê dahata navînîya %1ê amerîkîyên herî dewlemend wê sîhûşeş qatên dahata navînî sînordar bike. (6) Em îro mûçeyê herî kêm weke destketîyeke civakî dinirxînin, ji bo çi em mûçeyê herî zêde wisa nebînin?

* Lêkolîner li Institute for Policy Studies (Washington, DC) û serredaktorê Too Much (http://toomuchonline.org). Nivîskarê *The rich Don't Always Win: The Forgotten Triumph Over Plutocracy, 1900-1970, That Crea-ted the Classic American Middle Class* (Dewlemend her car bi ser nakevin: Serketina jibîrbûyî ya li dijî Plutokrasîyê, 1900-1970, ya ku çîna navîn a klasîk a amerîkî çêkir), Seven Stories Press, New York, wê di dawîya sala 2012ê de çap bibe.



ZORO METTINI: **Belevoka nepenî**, Li ser tuwalê teknîka tevlihev, 55 x 65 cm

## Heqê me ye em serî hildin

**Gelek grev bi destpêka şoreşên ereban re pêk hatin. Serkevtî jî bûn.**

**Misir**. Mûçeyê herî kêm hê ji sala 1964ê mabû; mîqdara wî 35 lîre bû. Sala 2011ê hukûmetê ev mîqdar weke 700 lîreyan (çileyê 2012ê dikir 89 euro) tesbît kir, tedbîreke ku pêşî li sektora dewletê û paşê li ya taybet hat pêk anîn. Tevgerên sendîkayî doza 1200 lîreyan dikir. Sala 2008ê mûçeyê navînî ji bo mêran 567 lîre û ji bo jinan 444 lîre bû. Ev xisleta demê ye, hukûmetê qanûnek erê kir ku ji bo xizmetên dewletê mîqdara mûçeyê herî bilind dîyar kir: Sîhûpênc caran ji mûçeyê herî kêm zêdetir e.

**Cezayîr**. Sala 2011ê ji bo aşkirin û sekinandina protestovanan, mûçeyê herî kêm ê ku 15 000 dînar bû, kirin 18 000 dînar (180 euro)

**Tûnis**. 1ê gulana 2011ê, mûçeyê herî kêm ji 272 dînaran derkete 286 dînaran (145 euro).

**Fas**. Hukûmetê biryar da ku mûçeyê herî kêm % 15 zêde bike: + % 10 di tîrmeha 2011ê de (gihişte 2 230 dîrheman, ango 200 euroyan), di tîrmeha 2012ê de wê % 5ê din jî lê were zêde kirin.

### Li Asyayê jî...

**Çîn**. Piştî tevgerên civakî yên havîna 2010ê li herêma pîşesazîyê ya Şenzenê, danezanên zêdebûna mûçeyan her zêde bûn. Li gor plana duwanzdehem a pêncsalan (2011-2015) mûçeyê herî kêm wê salê % 13 zêde bibe, piştî ku zêdebûneke navînî ya % 14 di sala 2010ê de –mîqdarên herî kêm di asta herêman de tên tesbît kirin. Bi her halî, tevî têkoşînên her diçe zêdetir dibin, karker dibe ku di bin vê mîqdara herî kêm a qanûnî re jî heqdestan bistînin û pirî caran heqdestên wan ên saetên zêde jî nayê dayîn.

Mûçeyê navînî yê karkerê bajarî bi xwe sala 2010ê % 12.4 û sala 2011ê %14.3 zêde bû. Sala 2010 gihişte 3030 yuanan (370 euro). Li Şangayê ev mîqdar gihişte 5510 yuanan û li herêma Heylongciyangê jî gihişte 2311 yuanan. (Çavkanî: *China Statistical Year Book*, 2011.)

**Japonya**. Ji çar salan û vir ve ji bo cara yekem mûçeyê navînî yê karkerên japonî yên ku roja sihê kar dikin, pir kêm jî be sala 2010ê zêde bû (+ % 0.5) û gihişte 317 092 yenan (3144 euro). Sala 2009ê ev mûçeyê navînî % 3.8 kêm bûbû, lewra saetên zêde hatin kêm kirin.

**Hindistan**. Mûçeyê herî kêm girêdayî hukûmetên eyaletan, ên herêman û kvalîfîkasyonan e. Li ***Delhîya Nû*** ev mûçe ji 93.77 euroyan (ji bo mûçegirên bêdîploma) digihêje heta bi 124.21 euroyan (ji bo yên bi dîploma). Sala 2011ê sînorê mûçeyê herî kêm di asta neteweyî de % 15 zêde bû û gihişt rojê 115 rûpîyan (1.77 euro).

1 Felix Adler, "Proposing a system of gradet taxation (Pêşniyarkirina Sîstemeke Backirinê ya Hêdî Hêdî Zêde Dibe)" *The New York Times*, 9ê sibata 1880ê

2 *The Public*, New York, 28ê îlona 1917ê

3 Salên 1919 û 1920ê, hesteke xurt a dijkomunîst mohra xwe li van salan xistibû

4 Dahata patronên sereke yên amerîkî halê hazir sêsedûbîstûpênc caran zêdetir ji mûçeyê heftane yê navînî ye

5 "Executive excess 2007: The staggering social cost of U.S. business leadership. 14th annual CEO compensation survey (Fehşîya Birêveberîyê 2007: Buhayê civakî yê mirovan metelmayî dihêle yê birêveberîya şirketan a amerîkî. 14 Anketa salane ya li ser mûçeyên CEOyan [birêveberên herî jor ên şirketan, nota wergêr])", Institute for Policy Studies, Washington, DC, 29 tebaxa 2007ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Gelo hevparkirina dewlemendîyê, daxwazeke xeyalî ye? Gelo projeyeke realîst e yan berevajî yeke ne realîst e: Bêyî ku em timî pê zanibin, bi xêra ferzkirinên bêşê yên civakî em jixwe beşeke mezin a mûçeyan berhev dikin.

# Ferzkirina bêşê, azadîya geh li jor û geh li jêr

BERNARD FRIOT *

Kî navgînên hilberandinê kontrol dike? Em çi hildiberînin û li ser hîmê kîjan terîfa nirxê hildiberînin? Ev pirsên dîyarker in, lê belê di nav guftûgoya raya giştî de nînin. Kengî mûçegir di bin barê siyaseta aborîyê ya şidandî de ditewin, ji wan kirina pirseke bi vî rengî hema hema weke luksekê xuya dike. Li alîyê din mûçe mijareke ku ji belgeya mûçe dibihure. Ew alaveke veguherandina civakî û azadîyê ye ku hêza wê bi fikrên heyî tê nixumandin. Li gor fikra pêşî mûçe wê bi kêrî peydakirin û razîkirina pêdivîyên karkeran were, çawa ku di peyva "buhayê hêza kar" de jî dîyar e. Ya diduyê ya heyî weke beramberê hilberînerîya karker û pê re jî buhayê berhemê karê wî. Bi vî rengî carinan bi dorê û carinan bi hev re mûçe geh weke buhayê karî û weke "hatinîya karker" tê terîf kirin. Kurt û kurmancî bidestxistina nên û tezmînkirina kedê. Ev her du pêşniyaz jî ber bi wir ve dibin ku bikin mûçe weke "hêza kiryarîyê" were nirxandin. Ji bo fikra pêşî ev jixwe dîyar e: Mûçe wê destûrê bide ew tişt were kirîn, a ku pê mirov dikare misêwa kar bike. Ji bo fikra duyem jî ev rast e: Heke mûçe heqê berhema kar dide, yê ku distîne jî "para xwe distîne". Tu mafê wî yê din li ser karê wî nîne, ji bilî jê bidestxistina dahatekê. Ango mûçe li gor karê hatî kirin, hêzeke kiryarîyê dabîn dike.

Em hilberîneran li gor çavkanîya ew ji "sermayeyê xweya mirov" û ne li gor jêhatîbûna wan biryardayîna nirxê aborî ("*peyvên kilît*" bixwîne) terîf bikin û di encama vê yekê de jî biryardayîna tişta wê were hilberandin, çawa û bi destê kê: Tişta ku kapîtalîzm hewl dide, ferz dike xuya bike, weha ye. Di sîstema heyî de, ya rastî nirx li gor dema kar tê pîvan -ev "nirxê kar" e. Ji bo ku em ji vê têgişşhê rizgar bibin, li ber destê me dezgeheke têra xwe hêzdar heye, ku bi xwe encama destketîyên civakî ye: Ferzkirina bêşê, ku yekê ji du alîyên azadker ên mûçe pêk tîne (1).

Di cih de ye ku em îşaretê pê bikin, ya ku em behsa wê dikin mûçeyê yekûn e û divê bi mûçeyê safî -mîqdara li jêra belgeya mûçe ye- re û bi mûçeyê nesafî re neyê tevlîhev kirin, lewra ew bi tenê beşeke ji mûçeyê yekûn pêk tînin. Ya rastî heke "nesafî" li "safî" tê zêde kirin, ferzkirinên bêşê yên ji wan re "yên mûçe" tê gotin, di nav wê de ferzkirinên bêşê yên "karbidest" nînin, tevî ku ev du caran ji yên karker bêhtir in ("*peyvên kilît*" bixwîne). Dema mirovekî siyasî behsa ferzkirina bêşê weke baceke li ser hatinîyê, yan jî weke jêbirînekê kir, yan jî dema nûnerên patronan gazinan ji "prîmên civakî" yên ku "buhayê kar" giran dikin, ya ku ew dikin ber lêpirsînê û jê aciz dibin beşek ji mûçeyê yekûn e. Hingê jî cemidandin û heta kêmkirina rêjeya ferzkirina bêşê çawa ku reformatorên rastgir û çepgir şîret dikin, ya ew di encamê de digihêjinê kêmkirina mûçe ye di wesfê mûçe yê garantîya paşerojê de .

Lewra ferzkirina bêşê ya civakî têgeheke dijkapîtalîst a nirx pêşniyaz dike. Razandina wê bi tenê zêdekirina nirxekî aborî ye li ne-bazirganan ên mîna alikarîya xizmeta tenduristîyê, perwerdeya zarokan, çalakîyên teqawîdbûyîyan. Bi vî awayî mûçeyê jîyanê yê teqawîdbûyîyan, mûçeyên xizmetkarên tenduristîyê, mûçeyê ji bo nexweş û bêkaran, karê dêûbavan ê ne-bazirganî, bazara kar û pîvana metayan li gor dema hilberandina wan serûbinî hev dike.

Ev ferzkirinên bêşa civakî ji ku tê? Bi eslê xwe ew para bêhtir encama înîsîyatîfên patronan in, înîsîyatîfên ku pê hewl didan xwe ji zêdebûneke mûçeyan a yekser xilas bikin, yên weke alîkarîyên malbatan ên ku heta bi salên 1950yê beşa herî girîng a ewlekarîya civakî pêk dianîn. Lê belê derket holê ku ev amûr azadker e, lewra piştî Şerê Cîhanê yê Duyem sazîyên muçeyî di bin zexta tevgerên karkeran de zexim bûn.

Ferzkirina bêşê çawa dewlemendî hat hilberandin pargirtina jê ye, bi vî rengê xwe ew ne berhevkirina sermayeyê ye û di encama wê de tu kar nayê bi dest xistin. Heta ku ew hat veditin, tevahîya rûdanên bandor li tenduristîyê dikirin li ser karker û malbata wî ferz dikir yan deyn bikin, yan jî bi prîmên xwe li karê hissedarên şirketên sîgortayê zêde bikin. Ferzkirina bêşa civakî ji nirxê lêzêdekirî ("*peyvên kilît*" bixwîne) pargirtin e da ku xizmetên tenduristîyê yan jî pîrûkalbûn were fînans kirin. Bi vê xisleta xwe jî piştrast dike ku deynkirin û milkê kar tîne ne lazim in. Berevajî baca ji hatinîyê tê standin, baca li ser karê ye, yan jî ya sîgortayeke tedbîrgir a biserhevde ya ji bo hatinîyeke guhertî, ferzkirina bêşa civakî mûçeyekî civakîkirî pêk tîne. Ev cihêtîya dîyarker ji ferzkirina bêşê qeraseyekî veguhertina civakî çêdike: Amûrek destûrê dide mûçegiran ku li ser aborîyê desthilatdarî û hêzê fetih bikin.

Ji bo mirov vê amûrê fêm bike, têrê dike ku mirov li firehkirina sîstema ferzkirina bêşê ber bi qada fînanskirina pererazandinê yekser ve bifikire. Çawa? Dema mirov li gor modela ferzkirina bêşa civakî ava bike, ev ê bibe "ferzkirina bêşa aborî" ku wê bikevin kaseyeke pererazandinê û "ferzkirineke bêşa mûçe" ya ku wê bikeve kaseyeke mûçeyan.

[Li Fransayê] Em halê hazir jixwe % 40ê mûçeyê yekûn bi ferzkirinên bêşa civakî û Beşdarîya Civakî ya Giştîkirî (CSG) civakî dikin. Li ser hîmê ya ku "jixwe heye" em dikarin civakîkirina tevahîya mûçe -pêkhênerên wî yên yekser jî di nav de- bidin ber xwe; bi rêya ferzkirina bêşekê ku wê bikeve şûna pereyên karbidestek dide û ewlebûna mûçeyê ji bo jîyanê misoger bike. Ev awayê nû yê ferzkirina bêşê wê tevahîya tişta ku halê hazir mûçeyê yekser ê mûçegirên şirketên taybet û sektora dewletê, yên ku tezmînkirina rojane ya tenduristîyê, mûçeyê ducanîyê, mûçeyê bêkarîyê, mûçeyê seqetîyê, tezmînkirina qezayên kar û nexweşîyên pîşeyî, mûçeyê teqawîdan û alîkarîyên civakî digirin nav xwe, bihewîne. Hemû bi hev re qederê nîvê Hilberandina Nesafî ya Neteweyî (HNN) pêk tînin. Ango ji bo dema dirêj, divê ferzkirineke bêşê ya hewqasî zêde were bi cih kirin.

Hingê wê patronên mûçe didin mûçegirên "xwe" nebin, belê wê birêveberîyên şirketan hebin ku li şûna ku wê mûçe bidin kesên dixebitînin, wê ferzkirineke bêşê razînin. Hingê mirov dikare bibêje têkilîya hêzê ya di navbera herduyan de wê bi awayekî radîkal jinûve ketibe tewazûnekê. Çawa ku ferzkirina bêşa civakî di rojekê de peyda nebû û rêjeya wê di nav gelek dehsalan de her çêde bû, ev formul jî wê hêdî hêdî were bi cih kirin. Bi vî rengî şirket dikarin avantaja ferzkirina bêşê li şûna mûçedana mûçegiran biceribînin, kaseyên dewletê dikarin xwe amade bikin; berîya ku vê çerxê li tevahîya civakê belav bikin, bandorên tewş û yên derketî holê dikarin werin sererast kirin û sûd ji wan were girtin.

Mijara duyem ferzkirina bêşa aborî ye. Li destpêka vê sedsala 21ê qederê % 20ê HNNya fransî ji pererazandinê re hatiye veqetandin; ev rêjeyeke pir kêm e. Weke mînak heke em bixwazin vê rêjeyê bikin % 30, em dikarin bidin ber xwe ku şirket % 15ê nirxê xwe yê lêzêdekirî ji bo xwefînanskirinê xerc bikin û ferzkirineke bêşê a ku wê hêdî hêdî heta bi % 15ê were zêde kirin jî biherike kaseyên pererazandinê. Ferzkirineke bêşê ya bi vî rengî ya ku pererazandinê fînans dike, ya ku ne divê lê were vegerandin û ne jî rêjeya faîzê li wan zêde dibe, wê destûrê bide ku hem birêveberên wê (birêveberên hilbijartî yên mûçegiran, lewra ew ê beşeke civakîkirî ya mûçeyê be) hem jî yên sûdê jê werdigirin vê sîstema nû fêr bibin, nas bikin: Berpirsîyarên şirketan wê bikaribin bi serbestî li berhev bigirin, lewra ew ê her du sîsteman biceribînin: Hem avantaja ferzkirineke bêşê ya li gor sedaneyeke ji nirxê lêzêdekirî û hem jî ya deynekî divê were dayîn.

Ji sedî 20ê HNNyê yê mayî bi xwe ew ê bi xêra ferzkirina bêşeke civakî bi kêrî fînanskirina para berxwurîya bêpere yên ku ne mûçe û ne jî pererazandinê zêde dikin -ji dibistanekê re, yan jî ji nexweşxaneyekê re weke mînak mesrefên xebitînê divên ên weke dabînkirina enerjîyê, kirîna materyalên piçûk û hwd. Firehkirina bêperebûna starê, çûnûhatinê, çandê (lîste bêkêmasî nîne) wê para HNNyê ya ku ji bo vê beşa civakîkirî ya mûçe wê bê veqetandin, zêde bike. Wekî din, ji ber vê yekê heqdestên yekser yên di navbera 1500 û 6000 euroyan de yên ku wê kaseya mûçeyan bide wê têrker bin.

Di rewşeke bi vî rengî de bac ji holê radibe. Alîyê wê yê xirab ew e ku ew ji nû ve dabeş dike û bi awayekî jî hatinîya ji milk û mûçeyên girêdayî bazara kar rewa dike, ev herdu jî sênîya ku ew jê dixwe pêk tînin. Sîstema bacê hêmaneke destjênabe ya jinûve dabeşkirinê ye di sîstemekê de ku tê de beşek ji dewlemendîyê kêlîya hilberandina wê bi xwe tê desteser kirin û ber bi karê ve diherike ku ji bo mûçegiran zirar e. Heke para bêhtir a HNNyê were civakî kirin, hingê bac wê li gor berê kêmtir bi kêr were.

Di dema dirêj de mirov tevahîya dewlemendîyê hilberandî bike, ber ferzkirina bêşê û pê re jî bike ber mûçeyê civakîkirî, ev yek wê bibe kirineke siyasî ya bingehîn: Terîfa nirx, hilberandina wê, milkiyeta wê ya bikaranînê û sedema wê, dê bi kêrî mûçegiran were, ango bi kêrî gel tê ku desthilatdar e. Ango mijara mûçeyî derfeta derketina ji kapîtalîzmê ye. Mesele ne guherandina cihê eyara dabeşkirina nirxê lêzêdekirî, li gor berjewendîya mûçe û li zirara sermayeyê ye, mesele di ser kapîtalîst û bazara kar qewaztin, kirina para mûçe ya tevahîya nirxê lêzêdekirî -beşa ku wê jî pererazandinê re jî biçe. Lewra di cewherê xwe de pêdivî ne bi karkirinê, ne bi karbidestan, ne bi deyndêran û ne jî bi hissedaran heye.

* Civaknas. Nivîskarê *L'Enjeu du Salaire (Mijara Mûçeyî)*, La Dispute, Parîs, wê 8ê Adara îsal were weşandin.

1 Yê din û kalîfîkebûn, mijareke sereke ku di Mijara Mûçeyî de hatiye bi pêşxistin

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

**Mûçeyê yekûn**: Heke li mûçeyê net tevahîya ferzkirinên bêşa mûçeyî û patronan were zêde kirin, mûçeyê yekûn pêk tê. Zêdekirina ferzkirinên bêşê teqabulî bêhtirî % 83yê mûçeyê net dike, heke mûçeyê net 1.6 caran ji mûçeyê herî kêm zêdetir be: Ango li 100 euroyên mûçeyê net 73 euro ferzkirinên bêşê û 10 euroyên Beşdarîya Civakî ya Giştîkirî (CSG), baca ji ewlekarîya civakî re veqetandî zêde dibin.

**Nirxê aborî**: Her berhem û xizmeta hilberandî nabin xwedîyên nirxekî, sedema vê yekê ne cewherî ye, lê belê têkilîyên civakî dabeşkirineke bi wî rengî bi rê ve dibin ku nirxê pereyan dide hin rengên hilberandinê. Bi vî rengî dayîk, yan jî bavê ku zarokekê mezin dike dewlemendîyekê hildiberîne, lê belê kapîtalîzm nirxekî aborî nade vê dewlemendîyê, heman kapîtalîzm nirxê aborî dide menejerê "planeke civakî" disêwirîne.

**Nirxê lêzêdekirî**: Nirxê aborî yê nû yê tê çêkirin. Nirxê aborî yê nû çêkirî yê di nav salê de Hilberandina Nesafî ya Neteweyî (HNN) ye. Dema ku em buhayê mesrefên navgîn (enerjî, madeyên xav) û barsivikkirina bi makîneyan ji buhayê berhemekî derxin, ya ku di dest me de dimîne, nirxê lêzêdekirî ye, ku di navbera karê û mûçe de tê dabeş kirin.



ZORO METTINI: **Bangewaz**, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihwev, 60 x 90 cm

Di pêncî salan de cara duyemîn Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, di 23yê kanûna 2011ê de butçeyeke kêmbûyî ji bo 2012-2013yê, pejirand. Eger krîza diravî vê kêmkirinê bi awayekî fermî piştrast bike jî, dewletên endam ên gelek caran bi dilsozî xwe dispêrin RNYê, vê carê bêdudilî xwe dûrî wê digirin. Rêxistin weke ku di nav jeopolîtîka hilweşiyayî de ketibe nav lêgerîna peydekirina rêyekê.

## NEBÛNA DERFETAN, PÊŞBIRKA G20AN

# Kî dixwaze RNYê bixeniqîne?

ANNE-CÉCILE ROBERT *

Bihura xirab devê derî ye: Navenda Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) ya li Viyanayê, bi "qesra camî" ya New Yorkê ku lê pirsên aştî û ewleyîyê tên gotûbêj kirin re tê muqayese kirin; gundekî piçûk ê şên û xîretkêş tîne bîra mirov. Çar hezar mirov lê dixebitin û li korîdorên bi berhemên hunerî yên hêzên newekhev (lê ji her derên dinyayê vehewîyayî) û wêneyên dêw ên Kaskşînên li ser kar xemilandî dibezin. "Em ji bo ajansên teknîk ên Neteweyên Yekbûyî dixebitin", bi awayekî çi bigire berevanîlixwekirinê dubare dikin, ku cudatîya di navbera xwe û karakterê bêtir siyasî yê meqamên Manhattanê de baş dîyar bikin.

Serbajarê awistiryayî, li gel New York, Cenevre û Nairobiyê yek ji biryargehên serekî yê RNYê ye. Bi çend îstasyonên metroyê ji avayîyên halxweş ên sîteya kevin a împeratorîyê dûr, di avayîyeke bi şiklê stêrkê avabûyî de ku bîhna xweş a salên 1960-1970yê jê tê, navenda navneteweyî ya Viyanayê (VIC) bikêmanî deh rêxistinan di nav xwe de dihewîne (çarçoveyê bixwîne). Di demeke ku piranîya welatên din xwe bi duduyan "bisînor dikin" de, ji bo hevkarî û ewlehîyê di navbera Ewropa û RNYyê de pêk bînin Fransayê sê balyozên xwe yên daîmî şandin Viyanayê -Awistiryayê, ji bo Rêxistinê.

Li nivîsîngehên CIVê her sal bi dehan peyman, bi hezaran biryar û raporên teknîkî tên gotûbêj kirin. Li wir, ji nêrîna çavan dûr, dîplomat û hiqûqnas carinan xwe didin nelihevkirinên ne piraloz ên di derheqê guherankarîyên nezelal, an mirov dikare -gelo divê mirov bêje *"pakkirina hatinîya tawanan"*, an jî *"sipîkirina perên reş"?* Lê carinan xeterên pir mezin derdikevin holê, weke gava ku mesele destnîşankirina kiryareke terorîstî be. Di 8ê îlona 2006ê de, Konseya Giştî ya RNYê stratejîyeke cîhanî ya têkoşîna li dijî terorîzmê ku xwe dispêre peymanên ji 1937ê vir de, di vî warî de hatibûn qebûl kirin, da ber xwe. Nivîsîngeha Neteweyên Yekbûyî ya li dijî tiryak û tawanê (ONUDC), ku li Viyanayê ye, berpirsa teşwîqkirina pêkanîna tedbîrên "alîkarîya teknîkî" pêk tîne: Şêwirmendîya hiqûqî, vatinîyên qada xebatê, perwerdekirina berpirsên bilind û hwd. e.

Cure parvekirineke vatinîyan li seranserê cîhanê derdikeve holê. Dewlet ji ajansên teknîkî ên RNYê dixwazin ku xeter an kiryarên li qadê (pêşketin, hevkarîyên zanistî û hwd.) zelal an rêkûpêktir bikin. Gelek welatên Sahelê bi vî awayî ji ONUDCê xwest ku bernameyeke pratîk a têkoşîna li dijî terorîzmê pêk bîne; hinên din li dijî gendelîyê daxwaza alîkarîya teknîkî dikin. Li hemberî vê, ji bo pirsên mezin ên siyasî, dewlet bi awayekî giştî dixwazin rêxistinên herêmî (Weke mînak, Yekîtîya Ewropî), an jî komên hêzên mezin, weke **G8** an **G20**ê seferber bikin. (1)

"G"yên ku bi awayekî nefermî ji alîyê welatên senayîya wan herî pêşketî ye ve hatin ava kirin, weke buroyên kar dixebitin. Ew derfetê didin endamên xwe ku ji bo qaîdeyên tu rewatîya wan tunebe, li ser mirov ferz bikin, bi serbestî di pêvajoyên RNYê re derbas bin. **Jean-Pierre Bugada** nerm dike û dibêje; *"Bi awayekî giştî agahdarî ne. Bi piranî encamên van civînan ên konkret tunene û RNY weke navgîna serekî ya civata navneteweyî dimîne".* Her çend birêveberê nivîsîngeha herêmî ya RNYê bixwaze li ser Parzemîna Kevnar bawerîyê bide mirovî ku her tişt baş diçe jî, ew bixwe jî qebûl dike ku rêxistin "negîhaştiye ser trêna krîza dravî, jê maye": Heke em rastîyê bixwazin yên ku meydan ji wan re maye, ji dervî derdora sîstema RNY, *Fona Dravî ya Navneteweyî* (FMI), *Banka Cîhanî û Rêxistina Cîhanî ya Bazirganîyê* (OMC) ya bi tevayî xweser e. Konferansa Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Bazirganî û Pêşketinê (CNUCED) yan Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Pêşketina Navneteweyî (ONUDI) çi dikin? Berevajîya sazîyên ***Bretton Woods***, ev rêxistin hîn jî di warê rîskên li ser riya pêşketinê de, bi taybetî jî li welatên Başûr derdikevin pêş; ew xwe ji dil nadin kiryarên guhastina-serbest, an jî dravî. Serekê servîsa *Komîsyona Neteweyên Yekbûyî ya Hiqûqa Bazirganîya Navneteweyî* (CNUDCI), **Renaud Sorieul**, tevî lobîyên karsazan ên pir aktîf û ne bi tenê ji ber rikeberîya hergav bihîstinê, ji ber marjînalbûna kar di dema "muzîka kurt" a hevkarîya navneteweyî de bêzar bûye. Ji bo eyarkirina demê, tarîxên konferansa cîhanî ya Neteweyên Yekbûyî li ser pêşketina berdewam (Rio+20), ji bo hezîrana 2012ê hatibû pêşbînî kirin, ji bo lihevkirina bi salnameya G20ê re dê panzdeh rojan bihata bi paş de xistin.

### Navîgasyona dîtbar

Ji bo ewleyîya navneteweyî, RNYê -bi navberkarîya Konseya xwe ya ewlekarîyê- pêşîya sahneyê digre, ev pênc welatên xwedî mafê vetoyê ne yên ku "A"yê didin biryaran cîbicî dikin û weke di bihara 2011ê de li Libyayê kirin, gelek caran tawsiyeyî *Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur* (NATO) dikin. *"Ji bo rêxistinên cîhanî demeke dijwar e, karmendekî payebilind ê fransî ku naxwaze navê wî bê eşkere kirin texmîna xwe dibêje. Dewlet li ber çavan weke rewrekê diçin û tên: Daxwaza xwe ji bo pirbendîyê dîyar dikin lê têkilîyên dubendî geş dikin û li riyên girêdanên di vî warî de digerin, weke berîya 1914ê, hevkarîyên katî derfeta kontrola brêveberîya pirsên deqîq yên weke tiryak û terorîzmê didin wan".* Di rastîyê de, budceyên ajansên RNYê yên li Viyanayê bi zorê dighêjin ji % 10ê çalakîyên wan. Ji bo yên mayî, divê ew ji bo her yekê ji wan alîkarîya danê bixwazin. "Em li ser daxwaza Dewletan an Konseya Giştî projeyan dest nîşan dikin û paşê jî em ji wan re li dravî digerin", **Mauro Miedico**yê ji ONUDCê berîya ku bi kurtebirî bibêje *"ev drav bi tenê yê giştî ye, da ku em cureyê wî tevlîhev nekin"* rave dike.

Hin ajansên RNYê di bin barê budceyê yê ewinde giran de ku mirov nikaribe ji bin derkeve, dinalin, û kadroyên wan li xwe mukir tên ku ew bixwe çûn û hatina xwe ya New Yorkê fînanse dikin... Kontratên ji bo demeke dîyar ên ji bo xebatkarên navneteweyî ku bi awayekî giştî pir kalîfîye ne, êdî bûne qaîde. Di 23yê çileya 2011ê de, rêxistinê ji bo budceyeke ji % 5 kêm ji bo 2012 û 2013yê (260 mîlyon dolar kêm ji budçeyeke 5 milyarî) dengê xwe da û qebûl kir. *"Dema mezinbûnê ya salên 1960 û 1970yê êdî ji me pir dûr ketiye, **Bugada** bi keser dibêje. Wê demê, pereyê pêşketinê weke lehîyê diherikî"* Bi wextê re, RNY bû makîneyeke mezin a burokratîk -Sekreterê giştî li dora 44 000 kes li seranserê dinyayê girtin kar- ku karekî rojane bi rê ve dibe, lê nikare di gotûbêjên mezin ên civatê de cîyê xwe bigire. Bi gotineke din, hin înîsîyatîfên weke *Global Compactê* di dawîya salên 1990ê de, di nav derûdorên rêxistinî de îtibara wê xera kirin. Armanca vê hevkarîyê ew e ku têkilîyên di navbera ajansên RNYê û şirketên mezin de bihêz bike da ku li qada kar bêtir berhemdar be. Di vê yekê de rîska tevlîhevkirina cureyên kar tuneye gelo? (2)

*"Heta ku kar xirab neçe kes bahsa RNYê nake; tu cara em qîmetekê nadin tiştê ku ew rojane li qada xebatê dike",* karmendekî ONUDIyê dibêje. Herwiha kes bala xwe nadiyê ku bêyî bi sedan bernameyên tenduristîyê, yan jî alîkarîyên ji bo penaberan li dinyayê bi hezaran kes dê nikaribin debara xwe ya rojane bikin û bijîn. Li CIVê, her ajans -heta her karmend- xwedî projeyeke taybetî ye: Peymaneke ku amade dibe, gotûbêjên hesas, "destûreke tevgerê" ji bo rojanekirinê, qanûnnameyeke ji bo sererastkirinê, grûpeke kar a motîvekirinê... Li nivîsîngeha xwe ya teng, **Niklas Hedman**, cîgirê bireveberê *Buroya Karên Fezayî* (BAS), bi kitekit xeterên qirêjîbûna atmosferê ji alî duwazde hezar navgînên ku 1950yê bi vir de hatine firandin nav fezayê dest nîşan kirin. Ev swêdîyê tevgera wî wek a pîremêrekî û destekî wî yê bi hêrs li ser klavyeya komputera wî ye, hemî tomarkirinên nû yên cismên hatine avêtin nav fezayê li ser Înternetê nîşan dide. *"Ev hîn bi tenê destpêka karekî agahdarîyê û kontrolê ye",* vedibêje. Li paş wî, li ser refekê bi serinc rêzkirî, satelîtên piçûk, cîranîya nimûneyeke fuzeya heyvî ya sor û spî ya profesor **Tournesol** dike. BAS, her wiha jî weke cûre polîsê trafîka fezayî dixebite: Gava ku lihevketinek çêbibe kî berpirs e? Pirseke ewçend pir hesas weke ya welatên li ser riya pêşketinê (Çîn, Hindistan, Brezîlya û hwd.) lê her wiha jî aktorên taybetî (Space imaging, hwd.) dikevin pêşbirka fezayî.

### Şerên piçûk ên li kozikan

Ajansên RNYê têgihîştin ku divê xebata xwe baş bidin nasîn û dest bi xebata ragihandinê bikin: Belavkirina dokumanan, vekirina civînan ji çapemenîyê re, şêwirîna bi gelek aktoran re û hwd. Ew her wiha jî xwe weke dilxwazên xebata bi rêxistinên nehikûmî (ONG) re nîşan didin. Hevkarîyeke carinan di çarçoveyeke pir teng de dibe ji ber ku hin tekst -weke peymana di derbarê qedexekirina mayinên dijkesî ya 1997ê ya bi navê ICBL (*International campaign to ban landmines*) - dê bitenê bibin berhemê xebata ONGyan. Lê nedîyar e ku di encamê de dê fêda tevlîhevîya aktorên giştî û yên taybetî, ku hevûdin weke endam qebûl bikin, li şefafbûna pêvajoyan û kontrola wan a demokratîk bibe. Beyî ku em meyla karmendên RNY û hevkarên wan ên rêxistinî ya di warê bikaranîna jargoneke carinan bêzarker ku ji kurtkirinên bi şîfre, nimreyên referansan û jargona ingilîzî ya balafirgehan tevlîhev dibin jî, hisab bikin. Bi vî awayî, van çend mehên dawîn, di korîdorên RNYê de, di nav xwe û torên din de, ji xeynî guhastineke mimkun a "ODM" bi "ODD"yê re di dema zîrweya Rio+20ê de pê ve nayê axavtin. Mirov dikare wan weke *"objectifs du millénaire / armancên hezarsalê"* û *"objectifs du développement durable / armancên pêşketina berdewam"* wergerîne; ku ferqa wan jixweber bi ber çavên mirov nakeve!

Têkilîyên navneteweyî dişibin kaleydoskopeke rêxistinan a ku bername û ajansên wan ji kêmbutceyî xwe mecbûr dibînin ku bikevin nav koordînasyoneke pir nexwezayî. Her bi vî awayî, ONUDI hevkarîyê bi ***Rêxistina Kiştiûkalî û Xurekîyê*** (*Food and Agriculture Organization*, FAO), ku bernameyekê bi Fona Navneteweyî ya ji bo Pêşketina Kiştûkalê (FIDA) re bi rê ve dibe, ku wê bixwe destûra Yekîtîya Afrîqî ya ku wê jî girêdaneke hevkarîyê bi Yekîtîya Ewropî re pêk aniye, girtiye... Lê têkilî hergav ewinde zelal naherikin. Weke mînak, Yekîtîya Ewropî, ku hes dike xwe weke serkêşa hiqûqa karên pirneteweyî nîşan bide, civînên CNUDCI piçûk dibîne. *"Komîsyona Brukselê civînên me taqîb nake û heta deqeya dawîyê gava ku nebîne tekst bi kêrî wê nayê, midaxele nake"*, **Sorieul** dest nîşan dike. Bîst û Heft weke ku hergav nîv felcê li wan xistibe û carinan jî bi tundûtûjî li lihevkirina gotûbêjên RNYê bi hiqûqa ewropî re difikirin. Wê gavê xetera avakirina van nakokîyên pîvanî ku zîrweyên dadgehên navneteweyî û bexteweriya parêzeran pêk tînin, mezin dibe. Divê em bêjin ku statuyeke zelal a Yekîtîyê di nav RNYê de tuneye: Bi awayekî fermî, ew di nav kategorîya çavdêran de cîh digre, lê ev yek bi tu awayî mafê dengdanê nade wê. Herwiha, hin dewletên weke Brîtanyayê, xêzekê dikşînin ser vê marjînalbûnê.

*"Hin tişt dikarin hîn zelaltir bin, yên bi G20ê re jî daxil",* balyoza Fransayê ya li RNYê xanim **Florence Mangin** wiha dibêje. Ew dest nîşan dike ku, di gulana 2011ê de, Parîsê hemî giranîya xwe daye ku biryareke refê protokolî yê Yekîtîyê di nav sazîyên RNYê de bi hêz bike, derbixe. Ji alîyên wan ên sembolîk wê de, şerên piçûk ên çeperan yên qanûnî dikarin xwedî tesîrên konkret bin. Heke serdestîya RNYê di qada navneteweyî de weke ku kêm bûbe xwiya bike jî, ew ji ber ku tekstên wê yên avaker bi filozofîyeke humanîst hatine amade kirin û her wiha mane, lê ev zihniyet di nîzama aborî ya cîhanî de kêm e. Wekî din jî ***Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovî*** ya 1948ê ya ku taca serê RNYê ye, şertê *San Fransîsko*yê yê di 26ê hezîrana 1945ê de hatiye îmze kirin bi van peyvan dest pê dike - *"Em gelên Yekîtîya Neteweyan destûrê didin hikûmetên xwe"* - ku ev yek bi dîktayên FMIyê yan jî birêveberîya fransî-elmanî ya euroherêmê re li hev nake.

1 Di dema krîza petrolê ya di 1975ê de, Fransayê, Elmanya, Dewletên Yekbûyî, Japonya, Brîtanya û Îtalya anîn ba hev û ew civandin. Paşê, di 1976ê de Kanada jî hat nav vê yekîtîya G6ê û bû (G7), di pey wê re Rûsya jî, di 1998ê de beşdar bû û bû (G8). Serokê Komîsyona ewrûpî jî endamê wê ye. G20 cara pêşîn di 1999ê de, dema krîza dravî ya asyayî ya 1997-1998ê, li Berlînê civîya

2 **Christian G. Caubet**, "Liaisons dangereuses avec le monde des affaires / *Têkilîyên xeter ên bi cîhana kar re*", Le Monde diplomatique, îlona 2005ê

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

## Pirşaxîbûna Neteweyên Yekbûyî

Navenda Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li Viyanayê tiştekî weke kewara mêşê ye. Li wir bi kêmanî deh rêxistin kar dikin: ***Nivîsîngeha Neteweyên Yekbûyî ya li Dijî Tiryak û Tawanê*** (ONUDC), *Tora Navneteweyî ya Ragihandina di Derbarê Spîkirina Dravî de* (Imolin), ***Rêxistina Navneteweyî ya Kontrola Tiryakê*** (OICS), *Nivîsîngeha Karên Fezayî* (BAS), ***Birêveberîya Postê ya Neteweyên Yekbûyî*** (APNU), *Nivîsîngeha Neteweyên Yekbûyî ya Xizmetên Piştgirîya Projeyan* (Unops), ***Komîteya Zanyarî ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Lêkolîna Tesîra Radyasyona Atomî,*** *Komîsyona Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Mafê Bazirganîya Navneteweyî* (Cnudci) û ***Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Pêşketina Navneteweyî*** (Onudi). Li gel van divê em nivîsîngehên herêmî yên ***Bernameya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Jîngehê*** (PNUE) û *Komîseriya Bilind a ji bo Penaberan* (HCR) jî bijmêrin. Lê Viyana herwiha pêşwazîya ***Rêxistina ji bo Hevkarî û Ewlehîyê li Ewropayê*** (OSCE), *Ajansa Navneteweyî ya Vejena Atomî* (AIEA) û ***Komîsyona Cîbicîkirina Peymana di warê Qedexekirina Bitevayî ya Ceribandinên Nukleerî*** (OTICE), ku ne di nav sîstema Neteweyên Yekbûyî de ye jî, dike.

Dema serê çileyê dest bi wezîfeya xwe kir, gerînendeyê giştî yê nû yê Beşa Qût û Çandinîyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî José Graziano da Silva, soz da ku ew ê çavkanîyên ji bo Afrîkayê zêde bike û vê yekê ji xwe re bike karê sereke yê serdema xwe ya wezîfê. Lê belê wêdetirî alîkarîya rêkûpêk –pêwist–, divê madeyên xav ên çandinîyê ji bin destê pergala spekulasyonê bên rizgar kirin, ku aborîzan jî vê yekê pêşniyar dikin.

## Qût û xwurek, stargeha dawî ya spekulasyonê

# Gava riz dibe berhema diravî

Jean Ziegler *

Rê rast, qîrkirî û monoton e. Di erebê de darên *baobab* (cûre dareke tropîkal e, bi latînî: *adansonia*) dor bi dor tên dîtin, tevî ku hê danê sibê ye erd boz û toz e. Di nav Peugeota reş de, hewayekî fetisîner heye, bêhna mirovî dernakeve. Li gel mihendisê çandinînas û şêwirmendê hevkarîya konsolosê swîsreyî, **Adama Faye** û şofêrê wî **Îbrahîma Sar**, em bi alîyê Bakur ve ber bi zevîyên fireh ên Senegalê ve diçin. Ji bo pîvana tesîra spekulasyonê ya li ser qût, em li daneyên statîstîk ên dawî yên Bankaya Afrîkî ya Pêşveçûnê – li ser çokên me danîn– dinêrin û hewl didin jê sûdê wergirin. Lê belê **Faye** dizane ku ravekirineke din ya daneyên statîstîk, li cihekî hinek dûrtir, li benda me ye. Erebe xwe berdide nav gundê ***Louaga***, ku bi qasî 100 kîlometreyan dûrî ***Saint-Louis*** e. Dûre ji nişka ve, radiweste û wiha dibêje: *"Were! Em herin xwişka min bibînin. Pêdivîya wê bi statîstîkên te tuneye, ji bo ku ji te re îzah bike ka çi diqewime".*

Bazareke xizan, çend dezgehên li kevîya rê rêxistî. Çend kîs fasolî, maniyok, çend heb mirîşkên ku di nav pîn û koxikên bi têlên rêsayî hatine dorpêç kirin, diqidqidin. Fistiqên binerdî, çend bacanên sor ên qermiçî, kartol, pirteqal û mandalînên Spanyayê. Tevî vê yekê meyweyê herî navdar ê Senegalê, mango, yek bi tenê jî li ser dezgehan tuneye. Li pişt yek ji dezgehan jineke kirasekî afrîkî yê fireh î zerê qîç li xwe kirî û kefîyek li serê xwe girêdayî bi cîranên xwe re galegalê dike: Xwişka **Adama**, **Ayşe**. Ew bi coş bersivê dide pirsên me, lê belê her ku dipeyive pê re jî hêrsa wê zêde dibe. Piştî çend kêlîyên din, li kevîyên bi toz ên rêya Bakur, qelebalixeke şên a ji zarokên her temenî û ciwan û jinên pîr, li dora me dibin xelek.

Telîsek riza îtxalkirî ya 50 kîloyî bi 1400 frankan-CFA ye. (1) Şorba êvarê jî bi carekê êdî her çû rontir bû. Di nav beroşên şîvê de êdî bi tenê çend lib dan bi ser avê dikevin. Li dikan û bazaran, jin êdî rizê bi kodik û tasikan dikirin. Şûşeyek gaz di nav çend salan de ji 1 300 frankan hilkişiya 1 600 frankan; kîloyek gizêr ji 175 frankan derket 245 frankan; nanekî dirêj ê 140 frankî, niha bûye 175 frank. Fiyeta qutîyek hêk ku 39 hêk tê de ne, di salekê de ji 1 600an hilkişiya 2 500 frankan. Rewşa fiyetên masîyan jî pir ne cuda ye. **Ayşe** hêrs dibe. Niha hindik maye ku bi cîranên xwe re pev biçe. Yên ku li gor wê pir şermoke ne, dema ku rewşa xwe tarîf dikin: *"Ji toubab -navê ku afrîkî li kesên neafrîkî û ne reşik dikin- re bibêje ka tu ji bo kîloyek riz çiqas didî! Jê re bibêje, netirse! Hertişt hertim biha dibe".*

Bi vî awayî ye ku fînans hêdî hêdî şênîyan mehkûmî birçîbûnê dike. Û şênî hê jî van çerxên ku spekulasyon xwe dispêre wan, tênagihin.

### Amûreke jirêderketî

Her tişt bi cihêrengîyeke awarte û ecêb dest pê dike, lewre veguhastina berhemên çandinîyê bi temamî ne weke yên din pêk tê: Li ser vê bazarê, mirov ji firotinê zêdetir ber dixwe, ango xerc dike. Ji ber vê yekê aborîzan **Olivier Pastré** (2) vê nirxandinê dike: *"Bazirganîya navneteweyî ya hubûbatan, ji sedî 10ê tevahîya hilberîna çandinîyê (ji sedî 7ê wê riz e) temsîl dike. Cihguhastineke piçûçik a hilberîna cîhanê bi vî alîyî, an jî bi wî alîyî ve, dikare bibe sedemê serûbinbûna bazarê".* (3) Li hemberî daxwaza her diçe zêde dibe, erz (hilberîn) ne bitenê ber bi fûrînê ve diçe, ji ber şîlobûn û bêîstîkrarîya rewşa avhewayê: ziwabûn, şewatên mezin, lehî, şape û hwd. herwiha zêde jî hesas dibe.

Ji ber vê sedemê ye ku di destpêka sedsala XXem de hilberînên averêbûyî derdikevin holê. Ev amûrên finansê ne ku nirxa wan "ji nirxa" berhemekî din yê bi nave "veşartî" tê –amûrên mîna senedên hîsseyan, tehwîlan, amûrên diravî– di destpêkê de armanca van amûrên fînansê ew bû ku destûrê bidin cotyarên Rojava Navîn da ku karibin berhemên hilbêrîna xwe bi fiyetekî beriya çandinê diyarkirî bifiroşin ku ji ber wê yekê navê "peymana bi wext" lê hatiye kirin. Eger di dema hasatê de fiyet daketana, hingê cotyar dihatin parastin; na, eger fiyet zêde bilind bibana, hingê jî qazanca kesên pere xistibûn vî warî, zêde dibû.

Lê belê li destpêka salên 1990ê de ev berhemên ku pêdivîya wan bi parastinê heye, radiguherin berhemên spekulasyonê. Li gor **Heiner Flass**beck, aborîzanê sereke yê Konferansa Neteweyên Yekbûyî li ser Bazirganî û Pêşketinê (CNUCED), di navbera 2003 û 2008ê de spekulasyona li ser madeyên xav bi navgîna fonên destnîşankirî (4) ji sedî 2 300 zêdebû. (5) Di encama vê pêvajoyê de bilindbûna fiyetên xurekên bingehîn bû sedemê "serhildanên birçîbûnê" yên navdar ên ku sî û heft welat hejandin. Dîmenên jinên haîtîyî yên taxên xizan ên ***Cité-Soleil*** ên ku ji bo zarokên xwe ji herîyê gulokên nan çêdikirin, hê jî li ser ekranên televîzyonê bûn. Şideta li bajaran, talan, xwepêşandanên bi tevlîbûna bi sed hezaran kesan li kolanên ***Qahîre, Dakar, Bombay, Port-au-Prince*** û ***Tunisê*** yên ji bo misogerkirina jîyana xwe nên dixwazin, pêvajoya gelek hefteyan di rûpela pêşî ya rojnameyan de hatin weşandin.

Îşareta 2008ê ya fiyetên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ji bo qût û çandinîyê di zikhev de ji sedî 24 jê zêdeyî îşareta sala 2007ê bû û ji sedî 57 jî jê zêde ya 2006ê bû. Herçî rewşa gilgil (misir/lazût) e, hilberîna bîyoethanol a amerîkî –ku eva dawîyê bi qasî 6 mîlyar dolar hat dopîng kirin,



ZORO METTINI: **Afirandî**, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihev, 80 x 80 cm

bi subvansîyonên ji bo hilberînerên "zêrê kesk" hatin belakirin –erza Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya li ser bazara cîhanî ya gilgil zêde kêm kir. Halbûku, gilgilê ku qismen destekek e ji bo misogerkirina xureka sewalî, kêmbûna wî ya li ser dezgehên bazaran, tevî ku daxwaza ji bo goşt zêde dibe, ji 2006ê û şûn ve, careke din bû palpiştek da ku fiyet bilind bibin. Li gor aborîzan **Philipe Chalmin** (6) *"hubûbateke din a cotyaran, riz hema hema rastî heman serpêhatîya veguherînê hat. Fiyeta tonek riz li Bangkokê ji 250 dolaran hilkişiya zêdetirî 1000 dollaran".* (7) Cîhan ji nîşka ve pê hisîya ku di sedsala XXIem de wê bi dehan mîlyon mirov ji nêzan û birçîyan bimirin. Dûre, bêdengîyê ji nû ve xwe berda ser trajedîyê.

Lê Belê ji rûdana krîza diravî û vir ve, spekulasyona li ser madeyên xav ên xurekî jî her çû bi leztir bû: Spekulatorên ku ji ber wêrana ku ew bi xwe bûbûn sedem, revîyan,– bi taybetî yên herî girîng, *hedge funds*, an jî "fonên spekulatîf"– berê xwe dan bazarên çandî-xurekî. Ji bo wan, hemû saman û sermîyanê li ser rûyê erdê dikarin bibin mijara şert û îdîaya der barê paşerojê de. Eger wisa ye, çima xurekên ku jê re "bingehîn" tê gotin, yên weke riz, gilgil û genimê ku hemû bi hev re ji sedî 75ê berxurîya cîhanê (ji sedî 50 tenê riz e) nebin mijara şert û îdîaya li ser paşerojê? Li gor rapora 2011ê ya Rêxistina Qût û Çandinîyê (FAO), tenê ji sedî 2ê peymanên bi wext ên têkildarî madeyên xav êdî digihîjin heta encama malradestkirinê. Ji sedî 98ê din î mayî, berîya wexta wan xilas bibe, ji alîyê spekulatoran ve dîsa tên firotin.

Ev dîyarde gihîşt radeyeke wisa ku Senatoya amerîkî jî jê fikar û endîşe kirin. Di tîrmeha 2009ê de, wê bi awayekî fermî *"spelulasyoneke zêdegav"* a li ser bazara genim dest nîşan kir û bi rexneyî anî ziman ku hin bazirgan di heman wextî de heta bigihîje 53 hezar peymanan di bin destê xwe de radigirin! Senatoyê herwiha bal kişand ser vê yekê ku *"şeş fonên destnîşankirî halê hazir di heman wextî de bûne xwedî erkê bidestxistina 130 hezar peymanên li ser genim, ev jî bi rêjeya xwe tê wateya çendeyeke bîst caran zêdetir ji limîta bi destûr ya operatorên diravî yên standard".* (8)

### Ji bo kontroleke cîhanî ya li ser fiyetan

Ne bi tenê Senatoya amerîkî di vî warî de ketiye alarmê. Di meha çile ya 2011ê de, dezgeheke din jî bilindbûna fiyetên madeyên xav, bi taybetî jî yên xurekî, weke yek ji pênc tehdîdên mezin ên li ser refaha welatîyan dest nîşan kir û ev jî tê wê wateyê ku xetera vê bilindbûna fiyetan gihîştiye asta xetera şerê cibernîk, an yê desteserkirina çekên komkujîyê ji alîyê terorîstan ve: Forûma Aborî ya Cîhanî ya Davosê…

Rûreşkirinek ku dibû mîna surprîzekê eger awayê peydekirina mirovan a vê cimaeta spekulatoran li ber çavan were girtin. Avakarê Foruma Aborî ya ***Aîhanî***, aborînasê swîsreyî **Klaus Schawab**, nehîşt ku mijara şertên tevlîbûna endamên nû di nav "kluba 1000an" (navê resmî yê li hevkombûnê) de tesadufî pêk were: Bi tenê rêveberên şirketên ku bîlançoya wan ji mîlyarek dolaran derbas dibe, tên vexwendin. Her endamek 10 000 dolaran wek heqê tevlîbûnê dide. Ew bi tenê xwedî mafê tevlîbûna hemû civînan in. Di nav wan de helbet hejmara spekulatoran têra xwe bilind e.

Gotar û axaftinên vekirinê yên 2011ê li bunkera navendê ya Kongreyan li gel vê yekê pir bi zelalî bal kişandibû ser pirsgirêkê. Wan pê re jî berê rexneyên xwe yên giran dan ser *"spekulatorên bêberpirsîyarî"* yên ku bi temamî ji bo berjewendîyên şexsî û qezencê, bazarên qût û zexîrê hildiweşînin û xelaya li cîhanê dijwartir dikin. Dûre, pêvajoya şeş rojan rêzek semîner, konferans, kokteyl, hevdîtin, civînên taybet li hotelên mezin ên bajarê piçûk ê bi berfê nixumandî pêk hatin, da ku pirsgirêk ji hemû hêlên xwe ve were şirove kirin … Lê belê gelo bi rastî jî salonên xwarinê, hotel û bar û bîstroyên ***Davos***ê deverên herî maqûl in ji bo ku pirsgirêka xelayê guhdarên xwe yên herî ji dil bibîne?

Bi armanca bi temamî têkbirina spekulatoran û parastina bazarên madeyên xav ên çandinîyê ji êrişên wan ên pirbare, ***Flassbeck*** çareserîyeke bingehîn pêşniyar dike: *"Divê madeyên xav, bi taybetî jî yên xurekî ji destê spekulatoran bên derxistin û rizgar kirin".* (9) Ew ji bo vê yekê wekaleteke taybet a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dixwaze. Vê yekê jî, li gor îzaha wî, wê kontrola cîhanî ya formasyona senedên borsayê yên xavmadeyên çandinîyê bisparta ***Cnuced***ê. Ji vê kêlîyê û şûn de jî, bi tenê hilberîner, esnaf û bikarhênerên xavmadeyên çandinîyê wê karibin dest werdin bazarên bi wext. Her kî rabe bikeve naz bazara çend ton genim, riz an jî çend lître zeyt û hwd divê neçar bimîne ku bi xwe tiştê li ser bazarê hatiye kirin, radest bike. Wekî din wê pir baş be eger asteke zemînî ya xwefînansekirina bilindkirî –ji bo operatoran– were saz kirin. Kesê ku malê bazarê wî tê kirin bi kar neyne, divê li derveyî Borsayê were hiştin.

Eger hatiba pêkanîn, "rêbaza Flassbeck" wê spekulator ji derfetên vejîna xizanên cîhanê dûr bixistana û bi awayekî cidî bibûya astengek li pêşîya pererijandina ser bazarên çandî-xurekî. Pêşniyara ***Flassbeck*** û ya ***Cnuced*** ji alîyê hevkarîya rêxistinên der-hukûmetî û lêlokînî ve bi biryardarî tê destek kirin. (10)

Tiştê kêm, vê gavê vîna dewletan e.

* Alîkarê serokê Komîteya Şêwirmend a Konseya Mafên Mirovan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî. Nivîskarê berhema bi navê *Hilweşîna girseyî. Geopolîtîka birçîbûnê*, Seuil, Paris, 2011.

1 Ev hejmar yên gulana 2009ê ne. 1 euro = 655.96 francs CFA

2 NDLR. Herwiha serokê IMBankê (Tunisie), ji 2001ê ve, serokê Weqfa Gerînendeyên Bankê, (ji 1998ê ve) û serokê CMP-Bankê (ji 2004ê ve)

3 Olivier Pastré, "krîza qût a Cîhanê ne Qederek e", di berhema Pierre Jacquet et Jean-Hervé Lorenzi de (li bin gerînendeyîya), *Dengeyên nû yên çandî-xurek*, Presses universitaires de France (PUF), Paris, 2011

4 Navek e ji bo fona sermîyandanana ku wisa tê texmîn kirin randimana wê dê li gor îşareta referansê be. (Cuzdanê Nirxan, CAC 40, ûhwd.)

5 Konferansa Neteweyên Yekbûyî li ser Bazirganî û Pêşketinê, "Rapora li ser bazirganî û pêşketinê", Genève, 2008

6 NDLR. Li alîyê din, şêwirmendê berê yê Şirketa fransî ya sîgortayê (Euler-Sfac), di navbera salên 1991 û 2003yê de, û serokê Objectif Alpha Obligataire (Koma Lazard) ji 2005ê ve

7 Philippe Chalmin, *Le Monde a faim*, Bourin éditeur, Paris, 2009

8 Paul-Florent Montfort, "Senatoya Amerîkî ji spekulasyona zêde ya li ser bazarên bi wext ya çandinîyê, şermezar dike", Rapporta jêr-komîteya herdemî ya ji lêkolînan berpirsîyar a Senatoya Delwetên Yekbûyî ya Amerîkayê, www.momagri.org/fr

9 Heiner Flassbeck, "Rohstoffe den Spekulanten entreissen", *Handelsblatt*, Düsseldorf, 11 février 2011

10 Di berhema ceribandinê Joachim von Braun, Miguel Robles û Maximo Torero ya bi navê "When Speculation MattersWashington", de îdîaya ku pala xwe didinê bi kurtî hatiye vegotin "When Speculation MattersWashington", International Food Policy Research Institute (IFPRI), Washington, 2009

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## ABORÎ

# Krîz, riya jê xilasbûne ev e?

LAURENT CORDONNIER

Ev çîrokeke aborî ya hevdem a Dewletên Yekbûyî (Amerîka) ye ku sê çînên civakî li hember hev radike: Yên sermiyandar, birêveber û çînên gel. Û di encamê de, pir kêm tê dîtin ku çînên gel têk biçin... Krîza "neolîberalîzmê" –**Gérard Duménil** û **Dominique Lévy** (1), gava sermîyandarîya diravî û globalbûyî di dema deregulasyona serbest de bi vî awayî bi nav dikin– li hevkirina ku bi dirêjahîya sîh salên dawîn di navbera birêveberîya bilind, giştî û taybetî, berpirsîyarên pirsên diravî û çînên xwedî mal û milk de pêk hatibû dixe ber lêpirsînê. Ev lihevkirina ku armanca wê bêlimît pirkirina hatinîya du alîyan (kar û mehaneya pir zêde tevlîhev) e, ji alîyê bêîstikrarîyên makroekonomik ve nearam dibe, ji ber ku vê lihevkirinê xwe kir yekane sûdwergira qazancan. Deyndarbûna dewletê, ji salên 1980yê bi vir de, û deyndarbûna malbatan ku di pey re di salên 2000ê û pê ve dest pê kir, motorên hevtemamker ên bazara netewî ya ji alîyê razandinê ve lawazbûyî pêk tînin, ji ber ku zêdekirina rant û para kar, bêtir feydeyê tîne û ji alîyê îtxalatê ve tê pelixandin.

Kûrbûna krîzê belbî dê lihevkirinên nû, bi navê neo-birêveberîyên di navbera xwedîtî û beşek ji birêveberîya bilind de bi xwe re bîne: ew jî dê di kefaleta çînên gelêrî re derbas bibe (biferqeke ji ya dema piştî şerî) û weke proje dê ji xeynî kêmkirina zirarê pê ve bi kêrî tiştekî din neyê. *"Lê, tu tiştek jî misoger nake, ku dê çînên serdest bixwe karibin xwe bixin bin dîsîplîneke bi vî teherî"*. Nivîskar krîzeke kûr a dolarî li derveyî îhtimalê nahêlin (çi bigire mirov nikare jê bireve, ji ber ku newekhevîyên bazirganîyan hîn ji holê ranebûne. Ev krîz ku ji bo hegemonyaya amerîkî tehlûkeyek e ku her diçe mezintir dibe, hêzên civakî neçar dike ku vê veguhertinê bileztir bikin.

Mirov niha tê digihê ku çima birêveberên amerîkî tercîh dikin ji krîza ***euro***yê bitirsin. Ji bo îsbatkirina dilnîgeranîya wan, em bi tenê dikarin xwendina berhema **Nikonoff** (2) pêşnîyaz bikin, ku ew piştî lêhûrbûneke bi serinc a di derbarê qencîyên îdiakirî yên euroyê de, tu sedemeke xirab a domandina jîyana wê nahêle. Herêma euroyê tu pîvanên ber bi avakirina herêmeke diravî ya berfireh pêk nayne û performansa wê ya di warê kardîtinê, mezinbûnê, rêjeya selefê û deynkirinê de ji ya welatên sêyem ne çêtir e. Ne ku bi tenê tu mekanîzmayên wê yên rastkirina bêîstiqrarîyên di nav wê de pêk tên, tunene (federalîzma budceyî, heke li ser kaxezê çareserîyeke baş be jî, tu şansê wê yê rojdîtinê di asoyeke mentiqî de nîne) lê siyaseta neo-merkantîlîst a Almanyayê jî ew mahkûmê rawestaneke berdewam kiriye. Euro di encamê de dê ji xeynî ji nû ve zindîkirina neo-lîberalîzmê li Ewropayê û hespê wê yê truwayê pê ve bi kêrî tiştekî din neyê. Tevî vê jî *"devjêberdana euroyê jî (...) dê bi awayekî mucîzewî hemî pirsên aborî û civatî yên welatên ku beşek ji herêma wê ne çareser neke"*. Nivîskar jî helbet dibîne ku *"ji bo pêkanîna siyaseteke çep a rasteqîn, ev yek mercekî serekî yê herî pêdivî ye"*.

Heke em rastîyê bixwazin, helbet dê mucize çênebin. Ji ber ku krîza euroyê bi tenê beşek ji vê "krîza mezin", ya nîzama serhevdana dravî ye, ku sê xalên wê yên serekî, **Robert Boyer** vedibêje, divê bi dîyardeyên buhraneke bihêz re neyên tevlîhev kirin: *"Nebûna bidestxistina navxweyî ya serhevdanê, pirbûna stratejîyên dijberî hev ku aktorên cihê seferber dikin û biserketina nedîyarbûneke radîkal li ser riyên ji krîzê derketinê"*. (3) Derketineke ku, di van şertan de, dikare dehsalekê, yan jî gelek dehsalan bigire, dema ji nû ve organîzekirina şiklê sazîyan (rêbazên pêşbazîyê, rola dewletê, têkilîya mehaneyan, cîyê diravî...) çarçoveyeke nû pêşkêşî stratejîyên serhevdanê dikin. Lê xuya ye mirov nikare bi tevayî senaryoyeke din, lihevkirinên sazîyî yên nû û "radîkal" li derve bihêle: Çûna ber bi sîstemeke kredîyên hîn bêtir sosyalbûyî, rêkxistina desthilateke mehaneyîyan di şirketan de û herêmîkirina danûstendinên bazirganîyê. Hêvîyeke wiha heye, ji ber ku *"derengmana derketina ji krîzê û kûrbûna nelihevkirinên civatî û xerabûnên dengeyên jeopolitik dikarin bikin ku bernameya behskirî bi awayekî bê pêk anîn ku bibe ortodoksîyek*".

1 Gérard Duménil et Dominique Lévy, *The Crisis of Neoliberalism / Krîza Neolîberalîzmê*, Harvard University Press, Cambridge, 2011, 400 r.

2 Jacques Nikonoff, *Sortons de l'euro! Restituer la souveraineté monétaire au peuple / Em dev ji euroyê berdin! Serdestîya diravî bidin xelkê,* Mille et une nuits, Paris, 2011, 462 r.

3 Robert Boyer, *Les Financiers détruiront-ils le capitalisme? Aya diravdar dê kapîtalîzmê hilweşînin?*, Economica, Parîs, 2011, 240 r.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr



ZORO METTINI: **Ahenga nehemîn ya Beethoven**, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihev, 90 x 90 cm

## AMERÎKA LATÎNÎ

# Stêrk, mûz û pereyê sexte

MAURICE LEMOINE

Da ku fonên aborî peyda bike, rêxistina Rojnamevanên Sînornenas *(Reporters sans frontières-RSF)*, pirtûka bi navê *100 wêneyên **René Burri** ji bo azadîya çapemenîyê* belav kiribû. (1) Fikreke pir baş e. Burri yek ji wênegirên "navdar" e. **Daniel Cohn-Bendit** di pêşgotina xwe de bi henekî dibêje, *"dema ku wêneyê bergê yê sembolekî –weke Ernesto Che Guevara –be û tew ku şoreşa wî hîn jî bi ser neketibe, dibe tiştekî dijwar!"*. Gava ku mirov dijberîya RSFê ya li hember Kubayê bizanibe, rengdêra *"dijwar "* pir sivik dimîne. Gelo ji ber ku li ser navê berevanîya rojnamevanan e, ev dijwarî rave dibe? Bersiva vê pirsê, dema rojaneyîkirina fînansmana wan ji alîyê dermanxaneyên girêdayî Kongreya Amerîkî û *Center for a free Cuba*/Navenda ji bo Kubayeke Azad, ku rêkxistineke rastrewên tûj ên kubayîyên amerîkî yên mayamîyî (Miami) ye ku armanca wê ya eşkere ji desthilatê daxistina "birayên Kastro" hatiye dîyar kirin, hate dayîn. (2)

RSFê mesele gîhand heta radeya ji Yekîtîya Ewropî xwestina *"bikaranîna mueyîdeyên siyasî"* ku wê heta niha ji bo tu welatên din qet tiştekî wiha nekiriye, heta bi welatên ku li wan rojnamevan hatibin kuştin û carinan bi girseyî jî. **Che** dê ji vê yekê re çi bigota gelo? Heke ku ev pirs bihata kirin jî, bêşik ew dê wê gavê bihata paşguh kirin. Serhildêrê bi kumê reş ê bi stêrik (yê ku di fotografan de li serê Che Guevara ye) dide firotin. Pere çavê mirovî kor dike. Tew bidestxistina wî –hîn bêtir...

Ev yek ne îstisnayek e. Weşanên **Robert Laffont** jî heman tişt kir, belbî hîn baştir jî. Navê nivîskarî li ser bergê (bi herfên pir gir): **Ernesto Che Guevara**. Sernivîs: *Têkoşîna Şoreşgerekî. Rojnivisên gerîyanê û tekstên din.* (3) Pirtûkeke destî: Bi 1159 rûpelî, nivîsên Arjantînîyê efsanewî, ji gerîyanên wî yên bi motosikletê yên di 1951ê de, heta rêwîtîya wî ya dawîn a ji bo Bolîvyayê, hemî jî bi "Mesaja ji Tricontinentale/Sêparzemînê (Asya, Afrîka û Amerîka Latînwergêr) re" ya di 1967ê de, bidawî dibin –û bi pêşgotineke pir dirêj a **Jacobo Machover**, "sirgûnê" kubayî (di 9 salîya xwe de girav bi cî hişt), ku hemî sermayeya wî antî-kastirîzmeke bimîlîtantî ye: Qehremanê şoreşa kubayî, lê dibe despotekî ji xwe bawer, xeterekî zalim ê tînîyê xwînê. Dîyarkirina dîtineke wiha di berhemeke ku îmza wî bixwe lê ye de mafek e. Di rewşeke wiha de bikaranîna navûdengê mirîyekî fuhuşa weşangerîyê ye yan jî tiştekî din e. Paşê ji bo qirêjîkirina bîranîna wî ji xwe re bikaranîna vê yekê ji helwêsteke kirêt a bazirganîyê xirabtir e.

**Carles Dantzig** ji bo xelata ***Goncourt***ê hat hilbijartin (lê bi dest nexist), ew, me dibe *Hundirê balafireke ku diçe Karakasê*. (4) Li derveyî kabîneya vê makîneyê, dekor xweşik e: Venedîk, birka Sportingê, li Beyrûdê, şanişîna narînîyê qehwexaneya Le Nemours, – ax! Le Nemoursa li kêleka Comedie-Françaisê... Qehreman, Xabî, ne kesekî ji rêzê ye: Zimannasekî awarte, rewşenbîrekî wiha ye ku ji wêjeyê tê digihê, mirov ji xwe guman dike ku ew hevalcêwîyê nivîskarî -ravekerî ye- *"Yek ji taybetmendîyên wî yên balkêş dengê wî yê barîton ê rok e. Di encamê de ew hîn dibe ku dostikên wî jê re dibêjin biguhdarîkirina dengê wî ji radyoyê wan li xwe xweş dianîn"*. Xabî evîndarê Lucieya nêremo ye, *"ku bi bêjereke navdar a pêşkêşkera nûçeyên televizyonî re direve"*. Lê belê, piştî ku li "hevalekî xwe yê venezuelayî", li şanişîna qehwexaneyê bi navê Nemoursê helbet, rast tê, Xabî ji bo ku portreya serokê wê binivîse diçe Venezuelayê – *"da ku bikaribe bi hûrgilî portreya wî binivîse"*.

Divê yên ku bi vê yekê nizanin, pê bibihîsin ku li vî welatê, *"otobusan kirê dikin ku bi wan niştecîyên derûdorê yên ku ji bo dengê xwe bidin Chavez, pere dane wan, bînin bajêr"*, *"mirov ji partîyê re ji alîyê kesên herî bextereş ve tê îxbar kirin"*. Ji vê jî wê de tir: Di dawîya çileya paşîn a 2008ê de, Chavêzê navborî *"ji bo dagîrkirina Amerîkayê hêzeke nav-amerîkî pêşnîyaz dike"* Cazîbeya kehanetên **Alexandre Adler** jî di wê de ye, ku ew edîtorekî piralî ye yê ku timî îlham wergirtîye.

Lê Xabî wenda dibe. Vebêjer jî dide ser şopa hevalê xwe yê ku destvala li dijî *"rejîmeke dêw a xwedî rêzek kêmaqilan û xwedî generalên şerxwaz ên ku dibin dewlet"* têdikoşe. Ew di balafira xwe de ji xwe re diponije û vê ravekirinê dibîne: *"Polîsekî, milîsekî, kurtêlxurekî xwest wî bitirsîne û zêdegavî kir"* paşê çi dibe em tiştekî din nizanin, roman li wir diqede. Mirov pirsê, ne li ser di encamê de çi dibe, lê li ser tesîra seyr a pespayetîya ku ji romanê difûre ji xwe dike. Û ev yek tevî ku, Dantzig peyvên çort bi kar nayne jî wiha ye. Gelo pespayetî di ramanên wî de ye?

1 Reporters sans frontières / Rojnamevanên Sînornenas, Parîs, 2011, 144 r.

2 Maxime Vivas bixwîne, *La face cachée de Reporters sans frontières / Rûçikê veşartî yê Rojnamevanên Sînornenas,* Aden, Bruksel, 2008

3 Robert Laffont, koleksîyona "Bouquins", Parîs, 2010

4 Grasset, Parîs, 2011, 299 r.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

www.arsivakurd.org




# Tirkîye û tercîhên welatên rojava

Kendal Nezan

Civandina leşkera bi awayekî nedîtî, li hevkirina partîyên bingehîn li ser fikrên eskerî, kontrola agahdarî û çapemenîyê, bê terefkirina muhalefetê, hemû şertên hundurîn amade ne ku artêşa tirk êrîşa dawîn li hember kurdan pêk bîne. Îşareta êrîşê her dem dikare bê dayîn, bi îhtimaleke mezin piştî damezirandina hukûmeta nû ya koalîsyona, li dora Partîya DYPa **Tansu Çiller** û Partîya ANAPê ya **Mesut Yilmaz**. Ger bi ser nekevin û koalîsyon pêk neyê, tê axaftin ku artêşa tirk xwe amade dike ku bi cûntayekê dest deyne ser kirdayetîyê û bi dizî û di bêdengîyê de "***serhildana kurdan ya bîst û nehan jî bişkîne, têk bibe***".

Yê girîng ew e ku bê zanîn ka dê dostên dîrokî yên Tirkîyeyê bi taybetî amerîkî û alman ku heta nuha gelek caran bi awayên cûre cûre alîkarîyên xwe li hember "terorîzmê" ji bo Ankara diyarkirine, çawa reaksîyon şanî bidin; di demeke wisa de, ku qismek mezin ya raya giştî yên welatên wan ji bo rewş û qedera kurdan hesas bûne. Heta niha, fikrên tirkan ew bû ku; ji ber şerê Bosnayê, ji ber tevlihevîyên li Kafkasyayê, ji ber pirsgirêkên wan bi Iran û Iraqê re, pêwîstîya welatên rojava bi Tirkîyê heye û di şerê li hember Kurdistanê dê, dê çavên xwe bigirin û dengê xwe nekin. Halbûkî tirk bixwe pêwistîyên wan yên mezin bi van dewletan heye, ji ber ku gelek caran alîkarîyên bê heq didin wan, her wek çek û malzemeyên çekan, kredîyên bankê yên erzan, rehetîya bazara firotin û kirîna malên bazirganî û bidestxistina dovîzeke xurt a ji tûrîzmê.

Aborî, wisa diyar e ku ji bo vî welatî "pahnîya Aşîl" e. Şer ji bo vî welatî ku hîne di rêya pêşketinê de ye, gelek buha dibe. Welatek ku bi 67 milyar deynê xwe, yê ji derve re, di dunyayê de, yê herî bilind e. Enflasyon, di dora sê reqeman de diçe û tê, ***lîra*** ku her hefte qîmeta xwe winda dike, endustrîya tûrîzmê ku qedera xwe bi şer û belavbûna wê ber bi bajarên berderyayê ve girêdayî ye, îşaretên talûkê, lemba sor li ser tabloya aborî bê sekin pêdikeve, ev yek jî hinek karmendên mezin mecbûr dike ku ji bo doza kurdan bang bidin û bo çareserî û lihevhatinên aştîyane tevbigerin.

Ji bo Tirkîyeyê dema rastîyê nêzîk dibe. Ji ber giranîya paşeroja xwe û tradîsyonên leşkerî û nijadperestî ku di bin îdareya artêşa leşkerî de tê meşandin û ji alîyê din pêwîstîya adaptasyona dunyaya îroyîn, Tirkîye bê qerar e, sergêj e, pêwîst e ku berî ku dereng bibe qerarekê ji xwe re peyda bike. Serokkomarê kevn, **Turgut Özal**, şexsîyetek modernîst, çend gav bi pêş de avêtin. Lê belê wisa dîyar e ku ji salekê û vir de ye, Ankara dîsa vegerîyaye rojên xwe yên naletî û nîjadperestîyane, fikrê êrîşeke leşkerî, macerayên mîlîtarîst tenê dikare texrîbatên mezin bide beşek mezin yê welêt, çavkanîyên hatinîyên welêt ji hev dikevin, bê bawerîyên mezin di navbera herdû civakên ku damezrênerên welêt in de pêktîne.


Îro, dem hatîye ku welatên Rojava hevkarên mezin yên Tirkîyeyê, berpirsîyarîyên xwe bi bîr bînin ji bo ku li hember firehbûna şerekî gelemperî astenga çêkin da ku şer bela nebe û neyê merheleya trajedîyeke însanî û exlaqî ji bo kurd û tirkan û aştîya hemû herêmê. Divê bê zanîn ku tirk bê dengîya hevgirtên xwe yê rojava wek destekeke ji bo statejîya xwe hesab dikin, Rexneyan jî wek muxalefetê qebûl dikin. Ji bo vê yekê welatên Rojava divê hemû bi hev re bidin zanîn ku polîtîka îroyîn ya leşkerî û maceraperest ya dostên wan tirkan, tu xizmetê ne li kurdan, ne li tirkan û ne jî li wan bi xwe dike, ku pirsgirêka kurdan polîtîk e û çareserkirina wê jî, ne leşkerî ye, divê polîtîk be, rêya rastîn ew e ku; bi dîyalog bibe çareserîya polîtîk ya ji bo lihevhatinê.

Herweha mesele ne tenê di warê însanî de ye. Felsefeya polîtîka welatên rojava li herêmê çiqas diçe hesastir dibe. Bawerîyên ku Tirkîye dikare bibe welatekî mînak ji bo "dunya tirk ku ji Adrîyatîk heta bircên Çînê" cîh digire, di nav du salan de ji ber cahîlî û kêmnasîya rastîyên dîrokî û kulturî yên herêmên vê dunyê bi temamî şikestîye. Miletên ku zimanên cûda yên grûba turkî diaxifin, ev serê hezar salan e ku ji hevdû dûr, bi dîrok û kulturên cuda dijîn, merivantîya wan; bi tirkên Anadolîyê re, ji merivantîya fransîyan ya bi romanîyan re nêziktir nîne. Ji alîyê din, astenga li hember entegrîzma şîî ya îranîyan ne tirk in, lê belê kurd in, kurd di navbeyna tixûbên Iran û Iraqê de bi cîh in û herweha di navbeyna dunya şîî ya îranî û azerîyan de û Anadolîya tirk ku bi piranîya xwe sûnî ne de, wezîfeya dîwar an jî zirx dibînin. Ger ji bêhêvîtî Kurdistan ber bi muhefezekarîyê ve biçe û paşverû li heremê bela bibe, Tirkîye jî bi temamî dê têkeve vê belayê

Dewleta qedîm ya Osmanî ji vê rastîya jeo-stratejîk baş haydar bû, ji ber vê yekê jî li hember tehdît û zixtên Îrana şîî û ji bo hevalbendî û îttîfaqeke xurt, otonomîyeke gelek berfireh ji bo kurdan wek pêwîstî didît. Tenê welatê ku bi çavkanîyên xwe yên avî û petrola bin erdê, Kurdistan dê bibe faktora bingehîn ya hizûr û aştîyê li vê herêmê. Ger welatên rojava hemû tedbîrên sîyasî û stratejîk yên ciddî peyda nekin, ger bi bêdengî û desteka xwe ya piralî, ger çavên xwe li polîtîkaya Ankara ya zulimkar bigrin û dîsa ger demokrasîya ciwan ya kurdên Iraqê destek nekin û wan bi qedera wan re bihêlin, 30 milyon kurdên herêmê dikarin têkevin bin tesîra hin dengên din û ber bi kampên tundrew ve herin.


Ger hevkarên rejîma Şah, welatên Rojava di dema xwe de bibûna asteng û ku nehîştibana Şah muxalefeta xwe ya demokratîk bipelçiqîne, me dê îro bê gûman nedîta ku rejîma Ayetullahan xwe bi cîh bikira. Ger di salên 1975ê de, Rojava alîkarîya berxwedana demokratîk ya kurdan a General Barzanî kiribaya, îro dê serokkomar Sedam Husên ne li ser hukûm bûya û nebûya bela li serê herêmê, dê bi vî awayî şerê Îran û Iraqê jî derneketa û nebûya sebebê bi milyonan kuştina kesan û ne jî şerê kendavê û bi hezaran kuştina şehîdên kurdên Iraqê. Iro jî hîne bi temamî dereng nîne ku welatên rojava yên hevkarên Ankara, mudaxeleyeke ciddî bikin, da ku Ankara di demeke nêzîk de çareserîyên lihevkirî û maqûl ku li tixûban hurmet digire peyda bike û herweha daxwazên kurdan yên mafdar û heqdar ji bîr nekin.

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin



Zoro Mettini: **Planet (G. Holst)**, boyaxa rûnî li ser tuwalê û teknîka tevlihev, 700 x 150 cm

www.arsivakurd.org




# "Xaka şewitandî" ya Kurdistanê

JEAN-FRANÇOIS PÉROUSE *

Tu kesek nîne ku ji şerê rastîn (1) ku li Rojhilata Tirkîyê berdewam e ne haydar be yan jî bê agahî be. Şerek, di navbera arteşa tirk û tevgera kurd ya gerîla ya bê hempa ku ji alî *Partîya Karkerên Kurdistanê* (**PKK**) ve tê meşandin. Li herêmê, ji ber bê ewlekarîyê, ji ber tirsê, ji ber zorê, bi van ve girêdayî ji ber xizanîya civakî û aborî bi dehhezaran kes koçber bûne û ji cîhên xwe derbeder bûne. Rêxistina mafê mirovan di sala 1994ê de dida zanîn ku 1341 gundên kurdan hatine valakirin (2), ger 86 gundên ku van sê mehên havînê hatine valakirin neyên hesibandin.

Di dehê çirîya pêşîn a çûyî de, wezîrê dewletê **M. Azimet Köylüoglu** ku bi mafê mirovan ve alaqadar e û wezîrê hukûmetê ye bi eşkereyî weha digot: di nav deh salên dawîn de 600 gund û 790 mezra hatin valakirin (3), ku nîvê wan van du salên dawîn hatin valakirin. Di 9ê meha 12an a 94ê de, wezîrê kar û barên navxweyî **Nahît Menteşe** behsa 2 433 gundên ku ji 1991ê û vir de hatine valakirin dikir (4), li alîyê din serok wezîr Madame Çiller heta jê tê dixwaze van serpêhatîyan, wêrankirinên van gundan bavêje ser gerîla. Hemû koçberên kurd yên ji ber şer koçber bûne, hejmara wan digihîje milyonekê. (5) Ev hejmar texmînî û ne sabit e. Li gor hinek çavkanîyan ev hejmar dikare bigihîje heta pênc milyonan.



Bêyî ku em behsa malbarkirinên mecbûrî û zorakî yên dema Osmanîyan, ku pratîkeke gelek caran hatibû bikaranîn bikin, bi avakirina dewleta "*Netewa Tirk li Anadolîyê* " (1921) jicîhkirina gelan û surgun, bûye rastîyeke tahl û berdewam; mirov dikare behsa bûyerên herî nêzîk bike: Di Tîrmeha 1991ê de wezîrê karên hundurîn qebûl dikir ku di demên herî dawî de; 59 gund û 304 mezra bi awayekî bi lez û bez hatin valakirin. Ber bi dawîya salê ve "Genelkurmay" (***Serok Erkanîya Giştî***) beyan dida ku; tevger û çalakîyên lêşkerî gelek zêde bû. Ev "tevgereke hundurîn" e. (6) Di meha îlona 1992ê de, piştî bûyera Şernexê,(pevçûnên di navbeyna 11 û 22ê Tebaxê de), Serokkomar ku li herêmên *Rojhilatê Başûr* digere, ji gel re dibêje, van "herêmên hesas" berdin herin herêmên ku şer lê berdewam in, piştî ku agirbest -ku ji alî PKKê ve meha adarê yekalî hatibû îlankirin- di Gulana 1993ê de xera bû, pozîsyona *Serok Erkanîya Giştî* bi temamî dijwartir kir; hedef ew bû ku seranser Kurdistanê ji hev bixin û PKKê bi temamî ji holê rakin; "hêzên taybetî" hatin damezirandin. Ji çileya paşîn heta adara 1994ê, leşkerên tirk, berî hilbijartinên şaredarî yên 27ê Adara 1994ê, hêzên xwe li Rojhilatê Başûrê Tirkîyeyê zêde dikin û teqwîyeyê bi kar tînin. Ji îlona 1994ê, heta çirîya paşin a 1994ê, ji bo ku bikaribin têkilîyên bi gundîyan re ji holê rakin û "alîkarîya lojîstîk" bibirin, polîtîkaya ***Xaka şewitandî*** bi awayekî sîstematîk hat bikaranîn.

Destpêka koçkirina, koçberîya bi zorê, 1990 e, lê di dawîya 1992ê û sala 1993ê de ji alî zêdebûna koçberîya bi zorê, bû salên reş. Di vê demê de, nêzîkî 800 gund û mezra hatin vala kirin. Li gor van salan, sala 1994ê, ger xerabtir nebe baştir jî nebû(7). Tesîra li herêmên koçberîya ji ber şer, li gor hinek faktoran tên guhertin. Ger mirov gund û mezrayên ku hatine valakirin, di hezîrana 1994ê de wek miqayese hesab bike, gelek herêm ji hevdû cuda ne: Herwekî li Dîyarbekirê 252 gund, li Şernexê 243, li Sêrtê 180, li Mêrdînê 126, li Batmanê 72, li Çolemêrgê 62, li Ruhayê 62 gund. Ber bi dawîya 1994ê, divê herêmên Dêrsim, Mûş û Agrî jî lê zêde bikin. Sêrt, Çolemêrg û Şernex ji bajarên sînorê başûr tên hesabkirin. Herêmên ku herî bêtir di bin tesîra şer de ne; Şernex, bajarê herî nêzîkî hidûdê Iraqê, bi halekî ji deradet barê vî şerî danîye ser milê xwe, ji 325 gund û mezrayan 243 bi temamî hatine valakirin, ev meseleyeke biçûk nine û bi rehetî sînorên "Rojhilatê Başûrê Anadolîyê" derbasdikin, herweha Ruha û Qers, ji yekî 64 ji yê din 14 gund hatin valakirin, ev herdû bajar jî li dervayî 10 bajarên heremên "îdareya orfî" ne. (8)

Hinek qeza rewşa wan li ber fetisandinê ye: Mesela Çelê (Çukurca) ku girêdayî Hekarîyê ye, ji 20 000 nifûsî, li gor serjimara 1990ê, 6 000 kes koçber bûne, herweha wek bajarê Licê (girêdayî Diyarbekirê) ji 12 000an daketîye nîvî. Herêmên "hesas" ku bi piranîya xwe nêzî sînoran e, yên daristanî ne, yên çîya ne, yên nêzî baraj û rêyên petrolê ne, yên wek cîh û rêyên stratejîk tên qebûlkirin û herweha herêmên ku di bin hedefên gerîla de ne. (9)

Pêwîst e ku du bûyer ji hev cûda bin, yek jê; koçberîya klasîk "ku di bingeha xwe de aborî ye" yê din yê ji ber şer û zorê ye. Hinek kes dibêjin ku koçberîya ji ber şer dê derbas bibe û ne koçberîyeke dûr û dirêj e, ev tez ne rast e û tu mahne jê re nemaye.

Sedemên koçberîyê her çiqas cûda bin jî, hinek ji wan wek sosyo-aborî bên qebûlkirin jî, ji ber sedemên ku kerîyên pezên wan ji ber sebebên şer telef bûne, ji ber cîhê çêreyê hatîye qedexe kirin, ji ber ambargo û cîhên leşkerî ku ji sivîlan re qedexe ye. Her weha şewitandina daristan û bax û baxçeyan, şewitandina zad û geniman, jahrkirina bîr û avan, qedexekirina zozanan, kemînkirina trafoyên elektrîk û telefonê. Carna jî, dewlet bi navê pêşvebirin û başkirina herêmê, avakirina "parkên neteweyî" bi dehan gundan bi temamî vala dike û bi vî awayî nuxteyên stratejîk dike bin kontrola xwe.

Sedemên esasî yên koçberîyê ji ber zext û zora şer dest pê dike: Li deverên şer, gundî mecbûr dimînin ku terefê xwe hilbijêrin, carna gerîla wan mecbûr dike, carna leşkerên tirk, yan jî rêxistinên paralel û paramîlîter, her yek jî wan dixwaze gundîyan bikşîne ba xwe û wan mecbûr bikin ku ji bo wan kar bikin. Dema leşker vî karî ji gundîyan dixwazin ger gundî qebûl nekin, derhal bi zora çek û tehdîdan wan ji gund diqewirînin. Gundên ku qebûl nakin bibin "cerdewan", (ev sîstem li ser bingeha eşîrîyê hatîye avakirin û wek mîlîsên dewletê tên hesabkirin) (10) û bi dewletê re hevkar nebin, an jî şik û gumanan şanî bidin ku dilê wan tine alîkarê leşkeran bin, ger gundên wan vala nebe jî, ya tên revandin û ji holê tên rakirin, an jî bi alîkarîya bi gerîlayan re tên sûcdar kirin.

Valakirina gundan bi awayên cure cure tê pêkanîn. Malbat hêdî hêdî bar dikin, ji ber ku yan tên tehdît kirin, an jî bi şantajan mecbûr dibin, gelek ji wan diherin çîya û dighîjin nav refên gerilayan (11), hinek jî, ji ber bêkarîya temamî û bê perspektîfî gund terk dikin. Dema ku gund tê valakirin, ger esker dest dananîbe ser gund, derhal dişewitîne an jî wêran dike, ji bo ku tu kes nikaribe cardin vegere gundê xwe, ji ber vê yekê, dîmena Kurdistana Tirkîyeyê hêdî hêdî gelek xemgîn dibe.

Koçberîyên zorakî bi du awayan pêk tên, yek jê, ji gundan ber bi qeza û bajarên xwe ve. Herwekî : Batman û Diyarbekir ku her yek jî wan nifûsa xwe ji milyonekê derbas kirine û bûne şaredarîyên ku bi temamî ji hidûdên xwe derketine. Ya din, ji herêmên Kurdistanê ber bi dervayî bajarên li herêmên Kurdistanê (Herwekî Izmir, Adana û Antalya). Paşê, li gor taxên ku kurd lê bi cîh dibin û zulma li ser wan, di nav van bajaran de, tax jî tên guherandin.

Ji alîyekî din, koçberîya ku gund bi zorê di bin kontrol û çavdêrîya leşkeran de li hev tên civandin û "gundên mezin û merkezî yên stratejîk" tên avakirin, ji wan re "Gundên Navendî" tên gotin. Li gor dewletê; ji bo Gundên Navendî dê xizmet hêsantir be, dê jîyana wan rehettir û pratîktir be, halbûkî armanca dewletê ew e ku seranser Kurdistanê ji hev bixin û "Navendên Stratejîk" ava bike û gundan di çar û pênc kampên mezin de bicivîne. Ger ev "çareserî" bi ser keve û bibe rewşeke gelemperî, wê demê mirov dikare behsa guhertina stratejî û politikayê bike; ji ber ku koçkirina bi zor û zextê pirsgirêk çareser nedikir tam tersê wê problem tenê cîh diguhert, mezintir û têveltir dibû. Bi vê stratejîya nû, hewayeke cûda peyda dibe, ew jî ev e; "stratejîya çavdêrîya gel", di vê rewşê de, gele kurd di welatê xwe de bi tevayî dibe mahkûm.

Ev rewş tesîra xwe li Kurdistana derveyî Tirkîyeyê jî şanî dide, ji ber ku Konseya Bilind ya Penaberan ku bi Neteweyên Yekbûyî ve girêdayî ye, (HCR) şikayetên xwe dîyar dike, ji ber ku li bakurê Iraqê bi vê meselê ve alaqadar e, li gor raporên wan: Di navbera gulan û hazîrana 1994ê de, ji 10 000 zêdetir kurdên penaber yên Tirkîyeyê koçberî vir bûn, ev koçberî her berdewam e.

Di derheqê koçberîya dûr ya dervayî Kurdistanê de, divê bajarên der û dora "Edenê" bi awayekî taybetî bên munaqeşekirin, ji ber ku van sê çar salên dawîn gelek penaberên kurd li van bajaran civîyane. Ji ber vê yekê jî ev bajar bi nifûsa xwe gelek mezin bûne. Rewşa Edenê hîn hesastir e, ji çend salan vir de, rojê panzdebist malbat hinek ji wan ji herêmên Rojava tên li vir bi cîh dibin. (12) Herweha qezayên Stembol, Izmir, Antalya û Ankarayê jî, van demên dawîn gelek penaberan bi cîh dikin, ev jî, bi xwe re pirsgrêka kurdan, li gel hemû rîskên xwe, li seranserê Tirkîyeyê belav dike.

Kurdên ku koçber in nikarin li her cîhê ku bixwazin bi cîh bibin, li cîhên ku bi war dibin tu car ne warek daîmî ye. Gelek caran li cîhên qedexe bi cîh dibin, bi vî hawayî jî, di rewşek zor û zahmet de dixebitin, li bazara kar dibin depoya karên paralel û dibin binproleter, dîsa gelek caran dibin malzemeyên neheqî û nîjadperestîyê. Ji hemû mafên mirovî bê par in, bê mal in, bê kar in, li cîhên xwe yê koçkirî, mafên wan ê dengdanê jî tune. Ger koçberên ku li bakurê Iraqê, ji alî HCR ve bi statuya penaber bên naskirin jî, yên ku li Tirkîyeyê mane û sînorên navneteweyî derbas nekirine, ji van mafên penaberîya navneteweyî bê par in û di "sirgûneke hundurîn" ya gelek dijwar de dijîn, ji ber vê jî, ji hemû statu û mafên penaberî yên navneteweyî bê par in.

* Doçent, Li Universîteya Toulouse-Le Mirail

1 Michel Verrier, "Rêya vekirî" Artêşa Tirk li Kudistanê, Le Monde diplomatique, çirîya pêşîn 1993

2 Bêjeya "valakirinê" dikare hinek xelet bikarhatibe. Nayê mahneya rijandina xwînê bi temamî û bi berdewamî xerakirina hoyratî ya dîwaran, serpêhatî carna hêdî hêdî pêk tê, lê ji alî stratejîk ve bêtir bi tesîr û talûke ye, ger koçberî di bin zexta herdayîm de be û peyder pey be

3 Hevpeyvîna ji bo rojnameya Cumhurîyetê (10.10.1994). Ev guhertina helwesta hukûmeta tirk, bi zordayîna navneteweyî ya ji bo gelê kurd û bi şîddeta bê sînor ku dewlet bikar tîne û gundan vala dike ve girêdayî ye

4 Özgür Ülke, 10.12.1994. Ev rojname di 04.01.1995ê de hate qedexekirin

5 Ev hejmar ji alî wezîrê dewletê yê Sosyal Demokrat M. Azîmet Köylüoglu ve hatine beyankirin, li gel wê jî dîsa gelek zahmet e ku mirov bikaribe hejmarek saxlem ya penaberan texmîn bike. Ji ber ku dewleta Tirk jî, PKK jî di vî warî de "şerê agahdarîyê" dimeşînin. Agahdarîyên wan kêm-bawer in

6 Gotinên, ji alî muxalefeta ku li hember êrîşên operasyonên artêşa tirk, ên li hember kampên PKKê tên telafuz kirin

9 Di navbera mehên îlon û çirîya paşîn a 1994ê de, bi operasyonên bê hempa yên valakirina gundan li herêmên Tuncelî (Dêrsim bi kurdî), ji berê ve 180 gund hatibûn valakirin

8 Cardin di 17ê çirîya paşîn 1994 an, j ibo çar mehan hate dirêjkirin

9 Wek di çileya pêşîn a 1994ê de, Kana Rejûyê ya (kana komirê) Sêêrtê, ket bin êrîşa gerilayan, Özgür Ülke

10 Di derheqê "sîstema derbasî ya cerdewan" ku di sala 1985ê de hate damezirandin. Iro nêzî 50 heta 60 hezar cerdewanên bi çek hene, ku ji alî dewletê maaşên wan tên dayîn, li van herêman ev maaş hatinên tenê bi serê xwe yên van herêman in

11 Bêjeyên bi tirkî û bi kurdî wek hev bi kar tên. Bi mahneya "herin çîya" yanî bighîjin gerilayan, ev jî wek nasnameyekê tê qebûlkirin

12 Ev hejmar 700 000 e, li ser nifûseke bi tevayî ya xwe, 916 000 li gor serjimara 1990ê. Özgür Gündem, 22.10.1993

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

# Bi, yan jî bê Twîtter serhildana misirî

NAVID HASSANPOUR *




Tablo 1. Li jor: Belavbûna xwepêşandanan (Hejmara cihên dûr ên protestoyan li Qahîreyê ya 28ê mehê.
Li jêr: Hemû berhemên Googlê, Trafîka Misirî

Ji destpêka çileya paşîna îsal ve raya giştî ya navneteweyî pêşveçûna şoreşa misirî li ser ekranan temaşe kir. Alozî, wekî fîlmeke siyasî ya bi heyecan, bi awayekî zindî bi dîmen û nîşandana rewşa li ser *Tweets* û *Facebookê* hatin weşandin. Di destê xwepêşandêran de pankart hebûn ku ew bi wan re bi rêya medyayê bi raya giştî ya cihanê re peyivîn. Bi dorê re televîzyonên asmanî bi awayekî çalak pêşveçûn ragihandin û bûn parçeyekî wan. Ne suprîzek bû dema ku rêveberekî ***Googl**ê* **Wael Ghonim**, ku di dema protestoyan de ji bo maweyekî kurt hatibû destgîr kirin, idîa kir ku: *"Heger dixwazî civakekê azad bikî, hema Înternetê bide wan."* (1) Lê berevajî vê yekê, ez di wê bawerîyê de me ku xerabûna ragihandina telefonên destî û Înternetê ya ji nişkan ve û ya berfireh, ku saetên serê sibê yên roja 28ê çileya paşîn pêk hat, pêşîya azadkirina qada giştî ya misirî- herçend demborî jî bûvekir, ew asê nekir.

Nîqaşên li ser rista veguherînê ya kişandina tetikên serhildanan a ji alîyê medyaya civakî ya nû ve tên zanîn: Medyaya azad a li ser Înternetê û ya çapkirî li ser pevçûn û mezinbûna pêkutîyê agahîyan belav dike û xelkê hişyar dike. Hevwelatîyên agahdarkirî bêhtir li dij bêzarîyan dikevin nav liv û tevgeran û derfetên siyasî bi dest dixin. Lê belê, ev bawerî li ser sê têgihiştinên şaş hatiye ava kirin.

Pêşîyê, pêşkêşkirineke weha wê rastîyê paşguh dike ku ragihandina ku dibe sedema serhildanan, ji elîta desthilatdar bi dizî tê kirin. Heger ew pê zanibin, dikarin wê xera bikin. Gotûbêjên azad ên li ser forumên medyaya giştî bêhtir dikarin bi veguherîneke siyasî ya asayî bi encam bibin, ne wekî raperînên komî. Li gor nûçeyên Michel Foucault, ku piştî du mehan di 19ê çirîya paşîna 1978ê de ji bo *Corriere della Sera* ji Îranê ragihandibû: *"Hat gotin ku **De Gaulle** dikarî li dij darbeya Algiers li ber xwe bide, mala transîstor ava. Heger Şah dike birûxe, ev yek bi saya teypên kasêtan e. Kasêt amûreke gelek baş a dij-înformasyonê ye".* (2) Dibe ku hatibe ji bîr kirin ku Şoreşa Qedîfe ya Pragê bi gotegotên xelet ên kuştina bêînsaf a xwendekarekî 19 salî yê zanîngehê dest pê kiribû.(3) Herweha, hilweşîna Dîwarê Berlînê bi daxuyanîyeke şaş a civîneke çapemenîyê dest pê kir, ku li ser televîzyona Almanyaya Rojhilat hatibû weşandin. Ev daxuyanî bûbû sedem ku xwepêşandêr daxwaza derbasbûna *Berlîna Rojava* bikin. (4) Di dema pevçûnên sîvîl de pir caran mubalexe û nebûna agahîyê ji pêkutîyê bêhtir bandorê dikin.

A duyemîn, propagandaya navendî ya dewletî wekî hêzeke pasîfîzekirinê tê bi nav kirin, lê belê medyaya civakî ya nû jî dikare bi rêyên cur bi cur pêşî li rîzîko girtina hevpar bigire. Tiştê ku li sikûnetê hikûm dike ne dîtîna ji alîyê karmendan e, lê belê têgihiştina çavê her kesekî din e. Statuko îllehîm ne encama pêkutîya agahdarkirî ya rejîmê ye, lê belê herweha qebûlkirina hevpar, gumankirina hevpar e ku li ser agahîya hevpar a derbarê meseleyên dewletê de pêk hatine. Dema ku ev zanîna hevpar ji holê radibe, girse ji dewletê azadtir teşeya rîzîkoyê dîyar dike. Xerakirina rêgezên kelepûrî yên ragihandinê ya 28ê mehê dîtbarî xera kir û misirî mecbûr kir ku têkilîyên nepenî deynin, nemaze jî ji bo berdewam kirina serhildana dijî rejîmê.

A dawîyê, berevajî zanebûna wergirtî, bi hev re girêdayîbûna bi rêya torên civakî dikare çalakîyên hevpar asê bike. Dema ku piranîyek hebe, ku rîzîko naxwaze û radîkal jî kêmanî bin, zêdekirina pevgirêdanên nav piranîyê her tim alîkarîya mobîlîzekirinê nake. Bi rastî, rakirina kanalên asayî yên ragihandinê dihêle ku radîkal bi rêya torên herêmî dikarin dozê jî desentralîze bikin û ji bo birêkxistinê qadeke baştir peyda bikin. Ne suprîzek e ku damezirînêrên netewe-dewletên modern, rista belavoknivîsan kêmtir kir û sanayîyên navendîkirî yên çandî pêş xistin, heta hin şoreşgerên pêşîn, ku **Abbé Sieyès** û **Mirabeau** jî di nav de, belavoknivîsên çalak bûn.

Piştî hatina medyaya civakî ya nû gelekan dubare zindîbûna qada giştî ragihand. **Mubarek, Esad** û **Qeddafî** van rêgezên ezimandinê ji bo xerakirina rêbazên ragihandinê yên muxalîfên xwe bi kar anîn û wan hêvî dikir ku bi vî awayî dijberên xwe bêdeng bikin. Di nav mînakên vê dawîyê yên manupulasyona medyayê de biryara Mubarek a ji bo xerakirina ragihandina înternetî û ya telefonên destî ya saetên zû yên roja 18ê çileya paşîna 2011ê ji bo tesbîtkirina encamên xerabkirinekê derfeteke bêhempa ye. Roja din, xwepêşandana 3 rojî ya li qada Tahrîrê bi dawî nehat. Di şûna wê de protesto li seranserî Qahîre û li bajarên din ên Misirê, ku Îskenderîye û Siweş jî tê de bûn, belav bûn. Heta dawîya rojê, hêzên ewlekarîyê yên Mubarek li hember xwepêşandanên dijwar ên neasayî têk çûn. (5) Roja 28ê çileya paşîn, êvarê dora saet 7ê serbazan şûna polîsan girt, ku êdî bi kêr nedihatin. Piştî leşkerkêşîyê, dînamîkên danûstendinê yên navbera serdest û muxalîfan guhert; piştî ku li ceribandina wêrek a rejîmê ya di warê ragihandinê de, beşdarîya serbazan jî zêde bû, dawî li desthilatdarîya sî salî ya **Mubarek** hat.

Tablo 1 di roja pêşîn a xerabûna ragihandinê de zêdebûneke tûj a belavbûna protestoyan nîşan dide. Wekî mînak roja 28ê çileyê, li gor roja berîya wê, protesto bi awayekî serkeftî hatin desentralîze kirin. Asêkirina rêbazên asayî yên ragihandinê, misirî naçar hiştin ku ji bo propaganda, berhevkirin û belavkirina nûçeyan rêyan bibînin. Di dema asêbûna medyayê de, taktîkên kevin digel rêyên nû yên ragihandina girseyî hatin bi kar anîn. Kanalên esmanî yên wekî *Al Jazeera* nûçe weşandin, ku bi girêdana telefonên malan hatibûn çêkirin. (6) Gelek kesên ku ji bo endamên malbata xwe fikar dikirin, ji bilî beşdarbûna di girseya li ser cadeyan pêvetir, tu rêyeke din nedidît. (7) Hinekan jî bi ser xeta metroya Qahîreyê re tora peyaman bi kar anîn. (8) Di şert û mercên xeternak ên alozîyên berdewam ên li seranserî bajêr de, cihên navêndî bû qada vehewîna xelkê. Gelek kes di şûna hewldana xwe gihandina *Qada Tahrîrê*, li meydanên herêmî, avahîyên stratejîk û mizgeftan kom bûn. Herçend rojên din telefonên destî, medyaya civakî û Înternet dîsa dixebitîn û hejmara kesên li *Qada Tahrîrê* hingî pir bû, ku nikaribû were guman kirin jî, careke din weha belavbûneke berfireh a xwepêşandanan û qelskirina rejîmê pêk nehat.

Bi kurtasî, asêkirina roja 28ê mehê alozî bi kêmanî bi sê rêyan kûrtir kir: Wê nîşan da ku gelek hevwelatîyên apolîtîk, ku yan bala xwe nedidan alozîyan, yan jî haya wan ji wan tunebû; naçar man ku serî bi danûstendina rû bi rû bidin, wekî mînak derketina wan a kolanan û talîyê wê yekê bi rêya gotegota xelkê serhildan bi serkeftî desentralîze kir û rabûneke weha pêk anî ku, ji ya rabûna girseyî ya li ***Qada Tahrîrê*** dijwartir bû; tepisandina wê jî zehmettir bû. Roja 28ê mehê hikûmeta misirî xwe ji rêbazên ragihandina nerasterast a mudaxeleyeke tund bêpar hişt. Her ku tedbîrên bi vî rengî têk çûn, xwepşandan girtir bûn. Lede Blog a *New York Timesê* roja 28ê mehê weha ragihand: *"Gerînendeyê rewşên awarte yên Rêxistina Çavderîya Mafên Mirovan **Peter Bouckaert,** roja îne çavdêrîya pevçûnên li kolanên Îskenderîyê kir, got: Aşkere ye ku hejmara mezin a hêzên polîsan a li Misirê êdî nikare xelkê kontrol bike. Li gelek deran gelek xwepêşandan hene..."*

Di dema asêkirina ragihandina înternetî ya roja 3ê hezîranê ya 2011ê li kolanên paytextê Sûrîyeyê delîlên pêvajoyeke wekhev peyda bûn. (9) Piştî gelek hefteyên bi zext û zorê, hikûmeta Sûrîyeyê biryar da ku taktîkên wekî yên rejîma **Mubarek** bi kar bîne. 3ê hezîranê roja înê li seranserî welêt ji bo pêşî li mobîlîzasyona girseyî were girtin, ji bo rojekê xetê Înternetê hat birîn. Li gor nûçeya peyamnêrekî *Associated Press*, ku di heman rojê de ji Beyrûdê radigihand: "Xwepêşandana roja înê di raperîna 10 hefteyî de ya herî mezin bû. Xelk li bajar û li navçeyan bi hejmarên mezin hatin cem hev, *ku lê beşdarbûneke kêmtir hebû*. Xwepêşandêr wekî din *li gelek taxên dûr ên Şamê û herweha li taxa navendî ya paytextê Mîdanê* jî hatin cem hev, ku ev der di hefteyên çûyî de bûbû sehneya protestoyan." Nîşeyên li ser du çavdêrîyan; A yekem, belavbûna xwepêşandanan li seranserî welêt û ya duyem -ku girîngtir e- belavbûneke berfirehtir a xwepêşandanan li Şamê. Wekî rewşa li Misirê, xwepêşandan desentralîze bûn û êdî bi taxa navendî ya ***Mîdan**ê* sînordar neman.(10) Li taxên dûr ên Şamê jî xelk derketin kolanan. Wekhevîyên digel rewşa Misirê balkêş in.

Rewşa li Lîbyayê jî aşkere ye. Di navbera 17ê sibatê û 3ê adarê de, di dema û piştî ketina Bîngazîyê û di dema meşa pêşîn a serhildayan a ber bi Trîpolîyê ve de hikûmeta Lîbyayê ragihandina înternetî û telefonên destî bi giştî asê nekiribûn. Weha dîyar dibû ku hikûmeta Lîbyayê ji asêkirina ragihandinê ya misirî hîn bûbû. Roja 20ê sibatê, dema ku xwepêşandanên li Trîpolîyê mezintir dibûn û dema ku bajar hêdî hêdî diket destê serhildêran, **Saif El Islam Qeddafî** di axaftina xwe ya li ser televîzyona fermî ya Lîbyayê de bal kişand ser paşguhkirina alozîyan a ji alîyê medyaya dewletî ve û nebûna nûçeyên navneteweyî. Biryara li dû wê, ku pê nûçegihanên bîyanî anîn Trîpolîyê, parçeyekî planê bû, ku li Rojava weha nîşan dan ku Lîbya li jêr kontrola rejîmê ye, ne ya *Al Jazeerayê*. Bi hilberîna wêneyeke weha eyarkirî, Lîbyayê wekî hikûmetên Îran û Çînê kir, ku alozî weha nîşan da, wekî ku asêbûneke herêmî ya ragihandinê dest pê kiribe û xetê Înternetê hêdî bûye ku dikare bi hêsanî were kontrol kirin.

Piştî demeke ji salekê kêmtir, weha dîyar e ku protesto li nav û dora otokrasîyan belav bûne. Wekî fikarên aborî tetika xwepêşandanên li welatên demokratîk dikişînin, aşkere dibe ku tevgera siyasî ya rasterast û bêxem, ku di protestoyên vê dawîyê yên hêza beşdarbûnê de derketin holê, dikare dahatûya kelepûra demokrasîya temsîlî dîyar bike. Guherinên strukturî yên di rêbazên ragihandin, mobîlîzasyon û kontrolê -yan berxwedana li dij wandikarin temsîlkirin, yan beşdarbûnê, yan bêkêr bikin, yan jî pêkan bikin; wekî ku di veguherînên dîrokî yên demokratîk ên çar sedsalên çûyî de pêk hatin. Heger propagandaya navendî di derketina wê de rola xwe lîstibe, heman tişt dikare ji bo medyaya nû ya civakî jî pêk were.

* Lêgerê zanista siyasî li zanîngeha Yale (New Haven, Dewletên Yekbûyî).

1 Hevpeyvîn digel *CNN*, 02/11/2011

2 Wekî nerazîbûna li dij sansura ji eskerîyê, çapemenîya çapkirî banga grevê kir û roja 6ê çirîya paşîna 1978ê ji bo du mehan weşan nekir. Xwepêşandanên herî mezin ên Şoreşa Îranê di heman demê de pêk hatin

3 *The New York Times,* 11/18/2009

4 *The Washington Post,* 11/01/2009

5 The Lede Blog, The New York Times, 02/11/2011

6 *Ji Tahrîrê: Şoreş yan Veguherîna Demokratîk?* Konferansa li Zanîngeha Amerîkî ya Qahîreyê (AUC), 04-06ê hezîrana 2011

7 Heman çavkanîya jorê

8 Vegotinên şahidan, hevpeyvînên şexsî

9 Lê belê nûçegihanên medyaya bîyanî li Sûrîyeyê gelek hindik in û weşandina rûdanên ji Şam û Hamayê nikarin bi weşanên ji Qahîreyê re werin berhev dan

10 *Midan* (Meydan) bi erebî, farsî û ukranyayî tê wateya 'qad'

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

www.arsivakurdi.org

Ji dema îlankirina agirbesta navbera Enîya Polîsarîyo û hukûmeta marokên ve, hemû hewldanên çareserîya dîplomatîk ên li Sahraya Rojava têk çûn. Li cihê cih pirsgirêk çareser nabe.

## JÎYANEKE ROJANE YA TENGIJANDÎ

# Berxwedana tund a sahrayîyan

OLIVIER QUARANTE *

Wakkala taxek ji wan taxan e ku di van du, an jî sê salên dawîyê de derketin holê û li axa herî dûr a başûrê Sehraya Rojava û li kevîyeke Morîtanyayê, dişibin bajarekî di nav lezûbeza pêşketinê de. Ev der weke li ser tevahîya vê axa fireh a ji 1975ê ve ji alîyê Fasê ve hatiye îlhaq kirin û ji alîyê Enîya Polîsario ve jî tê xwestin û ev 20 sal in tê payîn ku referandumeke ji bo tayînkirina qedera xwe di çarçoveya xalên rêxistina Neteweyên Yekbûyî de were li dar xistin *(Nivîsa di qutîyê de bixwînin)*, pir zehmet e ku mirov bêyî ku kesên din bixe nav gumanê, bilive, ji cihekî biçe cihekî din. Polîsên Ewlekarîya Neteweyî, elemanên Hêzên Artêşa Qralîyetê û eskerî li her derê ne. Rûniştivanekî bîyanî yê ku ew jî mîna gelek kesên din ên me nêrînên wan pirsîn, dixwaze navê wî neyê eşkere kirin, hêrsa xwe bi van gotinan tînin ziman: *"Ev hêzên ewlekarîyê giş jîyanê li me dikin dojeh! Eger li cîyekî polîsekî bi unîforma hebe, ji bilî wî herwiha deh polîsên sîvîl jî hene".*

Gereke bi lez a bi erebeyê li nav ***Wakkala*** dihêle ku mirov bibîne ku şopên bûyerên dawî yên şidetê yên di meha îlona 2011ê de qewimîn, li holê nemane. Sehrayîyekî li dora çil salî yê bi navê **Sîdî** (1) vedibêje ku *"Wîlayetê* [beşekî îdarî] *bi lezûbez her tişt paqij kiriye û hemû şop ji holê rakirin"*. Rayedarên xwecihî li gor stratejîya xwe ya "asayîkirinê", tev digerin, di daxuyanîyên xwe de her carê behsa bajarekî *"aram û bêxirecir"* dikin. Lê belê, ew şerûpevçûn, li gor Sîdî, hê jî ji bîra ti kesî neçûne û di hemû sohbet û guftugoyan de behsa wan tê kirin.

Vê yekşema 25ê îlonê, di dawîya pêşbirkeke futbolê de bûyera ku rû da, kovara hefteyî ya fasî ***Tel Quel*** wiha tîne ziman: *"Di navbera alîgirên her du koman de xirecir dertê. Li gor gotinan ciwanekî sahrawî, rastî êrişa xwecihên bakurê welêt tê. (…) Ciwanên sehrayî dibezin navenda bajêr, ji bo hêza alîkarîyê bînin. Ew deh bi deh li erebeyan siwar dibin û berê xwe didin taxa Wakkalayê".* (2) **Mokhamed**ê ku di destpêka meha kanûnê de em lê rast hatin, vê vegotina li jor teyîd dike û behsa rûdana cengeke mezin dike: Bêyî ku bihêle kes bibihîze û bibîne, bi dizî wiha dibêje: *"Marokî pir qelebalix bûn, dibe ku çend sed kes bûn. Wan hêdî hêdî xwe nêzî me kir. Polîsan jî qet dengê xwe ji wan re dernexist û hiştin ku bi ser me de bên"*. Ji bo bikeve nav detayan, ew li ser axê bi xêz û resman bûyerê tîne ziman: *"Te digot qey cengeke ji cengên sedsalên berê yên bi şûr û mertal bû"*. Ew bi xwe jî venaşêre ku çekekî wî jî heye û *"ji bo parastina malbata xwe" wê bikar tîne.* Çekekî din a ku dikare bibe sedemê encamên hê tirsnaktir jî heye: 4x4, ku ji bo êrişbirina ser wargehên dijberan tê bi kar anîn. **Sîdî** bi bişirîn gotinên xwe wiha didomîne: *"Ev çekeke veşartî ya sehrayîyan e, ji bo jî nişka ve êrişbirina ser fasîyan e!"* Di êrişekê de dudu jê polîs, heft kes hatine kuştin. **Sîdî**, bixwe, li cîranê xwe difikire, cîranê wî yê temenê wî li derdora sî salî, weke gelek kesên din, ji ber li ser xwe gerandina çekê 4x4, piştî çend rojên din hat girtin. Sîdî herwiha dide zanîn ku cîranê wî *"ji hingê ve, hê jî di girtîgeha **El-Ayûnê** de tê ragirtin".* (3)

Şer û pevçûnan tevahîya bajêr serûbin kir, lê belê bi taybetî li Wakkala û derûdora wê, li qadeke fireh a nêzî balafirgehê bûyerên herî dijwar û tund rû didin. Ev tax bi awayekî bûye sembola tengezarî û alozîyên pir dijwar ên navbera fasîyan (sehrayî bêhtir behsa "fasîyên bakur" dikin) û sehrayîyan (fasî û hejmareke mezin sehrayîyên ku bi wan re me xeber da, dibêjin "kesên bi eslê xwe ji herêmê ne", "sehrayî", hetta "xwecihî"). Edîtorê kovara ***TelQuel***, **Karim Boukharî**, vê pevçûnê weke *"bombeya Sehrayê"* bi nav dike. (4)

Di van xanîyan de malbatên ji kevîyên bajaran hatine, dijîn. Demeke kin piştî agirbesta ji alîyê Enîya Polîsarîyoyê ve hatibû mohr kirin, wextê ku referandûma ji bo mafê çarenûsê dihat amade kirin, ew hatine li vir bi cih bûne. Hingê armanc ev bû: Hewldana kontrolkirina qadê û werimandina lîsteyên dengdaran ji bo tesîrkirina li ser encamên hilbijartinê. Pere, erd û alavên avakirina jêrzemînekê dabûn wan, ji bo xwe li vir şûnewar bikin. Ev gotin tên bîra yekî ewropî: *"Di nav çend hefteyan de, taxên kevîyên bajêr ji holê rabûbûn!"*

### "Çavdêrîya min ew e ku ji bo me tûj û radîkal bike, Maroko her tiştî dike"

Ev siyaseta dengfiroşîyê bi awayekî qismî be jî tengijîn û alozîyên heyî îzah dike. Alîkarîyeke diravî tê şandin ji bo "partîgirên" sahrayî yên ji wargehên penaberan vediqetin; ên ji berî sî salan ve li kêleka bajarê cezayîrî ***Tîndûf***ê û li gor termînolojîya desthilata fasî, vedigerin *"dayîka niştiman"*. Wekî din "nexşeya promosyona neteweyî" a ku di berdêla de her cure "xebatên ji bo berjewendîya gelemperî" dan gelek sahrawîyên mijara gotinê ye. Bi kurtî, desthilat, hem ji vî alîyî, hem ji wî alîyî, ango ji her derdorê ji xwe re kesan dikire. Lê belê bi vê lîstika piçûk hesûdî sînorê aştîya civakî ya lê dihat gerîn, bin pê dikin.

Bihuşta xeyalî ya ku bi hezaran fasîyan xwe gihandê, –û hê jî berdewam tên lê digerin– li ser van xakan, bi xêra nêçîra heştpêyan, li karistanên amadekirina paketên masîyan, li sarincên masîyên sardînya û baxçeyên mezin yên meywe û sebzeyan ku li derdora ***Dakhla***yê tên dîtin, an jî li nav tehtên bi fosfat li ***Bou-Craa***yê. Lê belê ev bihuşta xeyalî bixwe derzan û qelşan di nav civakê de diafirîne. Berî hertiştî ji ber ku koçkirina ji bo aborîyê jî car caran bi şikestina xeyalan bi dawî tê. Berî demeke nêz, karistanên sarincan ên ji bo amadekirina masîyan û paketkirina wan gelek kes ji kar avêtin. Ji ber çi? Ji ber ku vekirina avên Sehraya Rojavayî yên ku bi masîyên xwe bi nav û deng in, ji keştîyên qirase yên ewropî û yên rûsan re, ji bo pêşketina sektorê têra xwe ne sûdwergir e. (5) Bi hezaran ton masî û lawir ên tenê di rojekê de ji alîyê piranîya keştîyan ve tên girtin, bi temamî ji destê pîşesazîya xwecihî tên revandin. Çavkanîya daxistî êdî qiymet û hêjabûna xwe jî winda dike: Gelek kelek dikevin pey girtina tonajeke maksîmûm û pey wê yekê ku nêçîra xwe veguherînin arvanê sewalan.

Li alîyê din, bicihkirina bi deh hezaran fasîyan li Sehrayê, mirovan neçar dihêle ku ji xwe re li kevîyên ***El-Ayûm***, an jî ***Bûjdûr***ê taxên nû saz bikin. Ev yek dibe sedemê firîna hêrsa civata sehrayî. **Beşîr** wiha vedibêje: *"Ji bo bikaribim karê xwe berdewam bikim, ez neçar mam biçim Morîtanyayê. Li vir mirovên xwecihî û fasîyên ji bakur hatine vir hene. Û xwedîyên şirketan jî ev ên dawîyê ne".* **Sidi** vê pirsê ji ji xwe dike: *"Çima sehrayî neçar bimînin bi mijûlbûn û meşandina karên piçûk ên destan qayîl bibin, rojê dozdeh saet bixebitin ji bo ku mehê 2000 dirheman* [120 ewro] *bistînin? Tiştê ku xelkê herêmê dixwaze, ew e ku bikaribin çavkanîyên xwecihî bi xwe bişuxulînin. Baş e çima filan an jî bêvan kesê fasî ê ji bakur dikare bi keştîyên mezin kar bike, lê yekî sehrayî nikare?"* Ew gotinên xwe wiha bi dawî tîne: *"Bi min wiha tê ku Fas ji bo me rezîl û riswa bike, her tiştî dike. Kengê tu îzahan dixwazî, kengê tu daxwaza mafekî xwe dikî, te bi veqetînxwazîyê, bi Polîsarîyovanîyê sûcbar dikin!"*

Şeş sed kîlometreyên din hê li wêdetirî bakur, li ***El-Ayûn***, av û hewa jî di vê sala dawîyê de têra xwe xira bûye. Sedema vê yekê, dîsa li gor **Sîdî**, derbaskirina vê "xeta zer" a binavûdeng e. Xwepêşandana ji bo şermezarkirinê li dijî berkevîkirina civakî û aborî statuya "baş" a sehrayî derbasî ya jîyaneke bela û bijehr dike. ***N'habouha*** ji 25ê kanûna 2005ê, ango ji dema ku du birayên wî ji holê windabûn û vir ve, ketiye nav kategorîya duyem. Wî û sêzdeh hevalên xwe, piştî tevlîbûna xwe ya nav xwepêşandanên aştîyane yên sehrayîyan, biryar dabûn ku veqetin ji vê xaka ku êdî ji bo wan bûbû cihê zext, tehdîda destserdanîn û girtinê. Alîkara serokê komeleyeke sehrayî ya çalakvanên mafên mirovan, Xatûn **Ghalî Jîmmî** vê rewşê wiha îzah dike: *"Ev stratejîyeke dewleta maroken e ji bo handana ciwanên Sehrayî da ku ber bi bakurê welêt koç bikin. Eger ew qebûl nekin, rayedar hertiştî dixin dewrê, ji bo wan ber bi giravên Kanaryayê dûr bixin. Hejmara wan di navbera 2005 û 2010ê de wê bigihişta bi qasî şeş sedan".*

Bi vî awayî, 10ê çirîya pêşîna (cotmeh) 2010ê, gava agahîya ku da zanîn wargeheke *khaimas* (xeym: konên adetî yên koçeran) li nêzî pazdeh kîlometre rojhilatê ***El-Ayûn***, li ***Gdeim Izikê***, li nîvê çolê, dihat saz kirin, **N'habouha, Kadija, Hadia** û jinên din ên komê bê dudilî xwe gihandin tevgerê –ya herî mezin bi pêşengîya sehrayîyan ji dema ***Meşa Kesk*** ve, ku dibe werçerxeke despêkirina îlhaqa ji alîyê fasîyan ve. Ji bo van jinan, daxwaza hînbûna ka çi hatibû serê birayên wan, an jî kurên wan, dibe sedemê girêdaneke firehtir a ji bo rûmetê. **Gdeim Izik** jixwe wê weke "wargeha rûmetê" bê bi nav kirin û ji alîyê hin kesan ve wê weke destpêkirina esasî ya "Bihara Ereban" bê nirxandin. Di navbera 10ê çirîya pêşîn (cotmeh) û 8ê çirîya paşîna (mijdar) 2010ê de, ev livûtevgera aştîyane wê bigihîje nêzî heft hezar *khaimas* (konan) û bi qasî bîst hezar kesan li hev kom bike. Li gel vê jî, di tevna paşîyê de, berkevîbûna civakî-aborî ji alîyê sehrayîyan ve tê rexne kirin.

Piştî çend rojên bi coşûxiroşê, bicihkirina hêzên ewlekarîyê dibe sedemê parçebûna wargehê. Ji bo baştir venêrîna hatin û çûna ji wargehê, bi tenê rêyek hatiye vekirin. Reşkirina medyatîk û mirovî tê pêk anîn. 24ê çirîya pêşîn (cotmeh), kurekî 14 salî li ber bend û rizdeyekê ji alîyê eskerên fasî ve tê kuştin. 18ê çirîya paşîn (mijdar), di berbanga sibê de, êriş dest pê dike. Bi qasî tê bîra **Leyla**yê: *"Her der bû mîna roja qiyametê. Zarok diqîrîyan. Bi jop, gazên çavsotîner û ava bi şid a kelîyayî, em ji malên xwe hatin avêtin. Dûre piştî vegera me ya **El- Ayûnê**, ez hatim desteser kirin. Li min xistin, jêpirsîna min kirin, dûre, piştî ku wan ez neçar kirim ku bibêjim "Bijî qral, bijî Marok !" sêşemê derengê şevê wan ez berdam".*

### Kîn û bîrbirina tolhildanê di navbera du civakan de

Li gor bîlançoya fermî ya alîyê fasî, ji hêzên ewlekarîyê yazdeh kes û ji sehrayîyan jî du kes tên kuştin û ev agahî ji alîyê Komeleya Mafên Mirovan a fasî ve jî tê piştrast kirin. Li gor çavkanîyeke baş agahdarkirî, roja hilweşandina wargehan û rojên din ên lipeyhatî, sed û şêst kes wê hatibin girtin. Ew rastî şidetê hatin û hetta êşkence li wan hat kirin, û dûre hatin berdan, bêyî darizandin, û bêyî ku sûcek li wan were bar kirin. Mîsyona Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, ya bi çavdêrîkirina agirbestê wezîfedarkirî, ti tişt nekir. Van salên dawîyê, hin endamên Konseya Ewlekarîyê, ku yek ji wan jî Fransa ye, xwe nadin ber dirêjkirina hîmayeya Rêxistinê ya ji bo "çavdêrîkirina mafên mirovan". Desteka meha çileyê, bîst û du çalakvanên sehrayî di 8ê çirîya paşîn (mijdar) a 2010ê de hatibûn desteser kirin, tevî ku kesên sîvîl jî bûn, hê jî li zindana eskerî ya ***Sale***yê dihatin ragirtin. Wan di dawîya sî û heşt rojên greva xwe ya birçîbûnê de ku di 31ê çirîya pêşîn (cotmeh) a 2001ê ji bo şermezarkirina şertûmercên xwe yên zindanê (piranîya wan rastî êşkenceyê hatin, li gor parêzerên wan, gelek ji wan rastî destdirêjîyê hatin û şazdeh kes ji wan di hucreyan de hatin tecrîd kirin), dabûn dest pê kirin, piştî ku rayedarên fasî soz da wan ku rûniştina doza wan wê di demeke nêz de pêk were, dawî li çalakîya xwe anîn.

*"Piştî Gdeim Izik, êdî ti tişt venegerîya rewşa xwe ya berê"*, li gor nirxandina N'habouha. Di 1999ê de ancax cara pêşî, sîvîlên marokî jî beşdarîya zextûzorên li himberî sehrayîyan kir. Desteya tevingirêdanê ya karkerên sehrayî jî ji ber vê yekê berî demeke kin, bi pêşengîya karmendên sehrayî yên kana fosforê ya ***Bou-Craa***yê hat saz kirin. Yek ji xanenişînê ji kana madenê bi van gotinan behsa wan rojan dike: *"Me xwepêşandanek li dar xistibû, lê belê polîs pir bi dijwarî dest werda bûyê. Sivîlên marokî ji erebeyên mezin daketibûn û çi ketibûn ber wan, hemû talan kiribûn, dikan û malên sehrayîyan talan û telef kiribûn. Lê belê, bi Gdeim Izik re, dijwarîya rewşê êdî gihîşt asteke din".* Gelek şahidên bûyeran beralîkirina sîvîlan, bi taybetî jî beralîkirina ciwanan dest nîşan dikin û balê dikşînin ser kirin û şideta ku wan di mijdara 2010ê de pêk anîn. Mîlîtana mafên mriovan a ku ew bi xwe jî nêzî çar salan "hat revandin" şahidî û çavdêrîyên xwe wiha didomîne: *"Ji salekê û vir ve ye, kîn û zihniyeteke tolhildanê di navbera her du civatan de careke din xwe nîşan da. Nifşa min aştîxwaz e û xweşbîn e. Em hertim li gelê fasî bihurîn; hêrsa me li dijî dewletê ye. Lê belê ciwan êdî ne weke nifşa me ne, ji ber ku ew dibînin ku civata navneteweyî dest werdide deverên din, lê belê dest wernade vê derê. Ciwan ewlehîya xwe winda dikin û êdî bawerîya wan bi şidetê tê!"*

* Rojnamevan.

1 Piranîya navan hatine guherandin

2 "Gava Dakhla qir dibe", *TelQuel*, Casablanca, 7 cotmeh 2011

3 Vê nivîsa Gaël Lombart ê Julie Pichot bixwînin: "Tirs û Bêdengî li El-Ayoun", *Le Monde diplomatique*, çirîya pêşîn 2006

4 "Bombeya Sahrayê", *TelQuel*, 2 cotmeh 2011

5 Lihevkirineke neçîrvanîyê ya ku Saharaya rojavayî jî dide ber xwe, di navbera Marok û Yekîtîya Ewrûpî ve di sibata 2007ê de hat îmzekirin. Ev peyman di berdêla hîbeyekê de herwiha daxistina rêjeyeke çendeya nêçîrkirî û dayîna lîsansan ji bo keştîyên ewrûpî dide ber xwe. Ev hîbe di çar salên pêşî de hilkişîya zêdetirî 144 mîlyonî. Di serdema pêş de, tevî dijberîya heft welatên endam, dîsa jî peyman heta sibata 2012ê hate dirêjkirin. Lê belê Parlemana Ewrûpî li dijî dirêjkirina wê derket. Dijber vê yekê weke karekî qaçax dinirxînin heta ku ew neyê qanûnîkirin û neyê îspatkirin ku sahrayî jê sûdekê werdigirin.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## Herêmeke şer û pevçûnê

Sehraya Rojava ya ji 1884ê ve mêtîngeha spanyolan bû, di 1975ê de ji bin destê spanyolan derket, lê belê ji alîyê Fas û Morîtanyayê ve –eva dawî di 1979ê de wê dev ji dagirkirinê berde– hat parve kirin. Enîya Polîsarîyo ku di 1973ê de hat saz kirin, ji 1976ê ve daxwaza serxwebûna vê axê dike û Komara Ereb a Sehrayî ya Demokratîk ava dike. Ev komar ji alîyê Rêxistina Yekîtîya Afrîkî (OUA) ve tê venasîn. Şer jî hema di pey re di navbera Rabat û Enîya Polîsarîyoyê de diqewime û dibe sedemê mirin û birîndarbûna bi hezaran sehrayîyên ku bi awayekî girseyî ji ber bombebaranan direvin, li Cezayîrê (ku destekê dide Polîsarîyoyê) li wargehên herêma Tîndoufê dibin penaber. Agirbestek di 1991ê de tê îmze kirin. Divê ev agirbest ji bo referandûma li ser çarenûsa xwe, riyê veke.

Tevî ku Rêxistina Neteweyên Yekbûyî wezîfedarên xwe şandine herêmê jî, referandûm heta niha jî pêk nehatiye. (1) Li gel vê yekê, Konseya Ewlekarîyê, di biryara xwe ya 1783ê, a 31ê cotmeha 2007ê de pejirand ku *"vîna xwe ya destekdayîna alîyan ji bo bigihin çareserîyeke aştîyane ya adil, berdewam û ji alîyê her du alîyan ve qebûlbar a ku ji bo tayînkirina çarenûsa gelê Sehraya Rojavayî rê veke"* careke din piştrast dike. Enîya Polîsarîyoyê wisa difikire ku serxwebûn jî di nav de, divê referandûmeke xwedî pir opsîyon (hilbijartin/neqandin) were li dar xistin. Lê belê Fas dixwaze ku referandûm tenê der barê opsîyonekê de be û ev opsîyon jî dîsa otonomî be. Heta roja îro jî Sehraya Rojavayî ji alîyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve weke xaka dawî ya ne-xweser a Afrîkayê, ya ku dekolonîzasyona (dawî li mêtingehkarîyê anîn) wê hê jî temam nebûye, tê hesibandin.

O. Q.

1 Nivîsa Khadija Finan a bi navê "Alozîyek, pevçûna Sehraya rojavayî hildiperike", *Le Monde diplomatique*, çile 2006

## XELEFÎ Û SELEFÎYÊN LI KOREYA BAKUR

# Xanedana Kîm, an jî du laşên qral

BRUCE CUMINGS *

Guftûgoyên koma Şeşan –Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Japonya, Koreya Başûr, Çîn, Rûsya û Koreya Bakur–, ên ku piştî mirina Kîm Jong-il qut bûbûn, ji bo bênukleerkirina welêt ji nû ve dest pê kirin. Herçendî serokê nû Kîm Jong-un serdanên xwe yên gelemperî yên ji bo artêşên cihêreng zêde dike jî, birayê wî yê mezin ji Macaoyê, ku lê bicih bûye, ji niha ve behsa hilweşîneke ji nişkave ya rejîma Koreya Bakur dike.

Dema ku **Kim Jongê Il.** di 17ê çileya pêşîn (meha 12an) de mir, şans bû ku ez li Singaporê bûm. Bi vî awayî, ji mesafeyeke maqûl min karî ez gotin û şiroveyên beredayî yên şarezayên amerîkî temaşe bikim. Bisporekî Koreyê, ku xizmeta îdareya duyemîn a ***Bushan*** kiriye, di rojnameya *New York Times*ê de weha nivisî: *'Va ye dawîya Koreya Bakur hat'*. (1) Kurekî ecemî çawa dikare serî bi serokên heştê salî yên artêşeke hêzdar re derxe? Hinekan got: Ma wê *darbeyek* pêk neyê? Û paşê dîsa **Kim Jong Un** dikare bersiveke tund bide serbazan, da ku hişkbûna xwe isbat bike. Hinek fikarbar bûn ku 'hilweşîn' dikare rê lê veke ku serbazên amerîkî yên li Okînawayê êrişê bikin ku 'bombeya sist a nukleerî' bi dest bixin, (ku ev yek, bi salan e yek ji peywirên wan ên sereke ye.) Rayedarên îdareya **Obama** jê fikarbar bûn ku 'şerê desthilatê' derkeve, ku Wezîr **Hillary Clinton** sê sal berê, piştî axaftina tund a **Kim** ev yek bi lêv kiribû. Modêla wan wekî Sovyeta piştî mirina **Stalîn**, yan jî ya Çîna piştî **Mao** ye. Tiştê ku tê paşguh kirin ev e. Piştî ku di 1994ê de **Kim II** mir çi bû: Tu tişt nebû.

Di seredana min a pêşîn a Koreya Bakur di sala 1981ê de, ez firîyam Pekînê û min hêvî dikir ku bi rêya hesinî ya Trans-Sîbîryayê, di ser Yekîtîya Sovyetan re herim. Rayedarên konsulxaneyê got ku divê ez ji balyoza Sovyetê ya li Pyongyangê (paytextê Koreya Bakur) vîzeyê bistînim. Dema ku ez gihiştim pêlikên balyozxaneyê, konsolosekî hevalbend (an ku endamê KGB) ez dam rûniştin, konyak pêşkeşî min kir û pirsî ka ez ê li Pyongyangê çi dikim. Bêhtir konyak, bêhtir gotûbêj û paşê wî ji min pirsî ka ez di derbarê **Kim Jong Il** de, ku wê demê di Kongreya 6em a Partîyê ya sala 1980yê de hîna nû wekî xelefê **Kim Il Sung** hatibû ragihandin, çi difikirim. Min got: *"Bi rastî, karîzmaya bavê wî pê re tuneye. Pir piçûk e, dişibe heyvê û malovî ye. Bêhtir dişibe dîya xwe."* Wî jî got: *'Wey li minê, hûn amerîkî her tim li ser şexsîyetê difikirin. Ma hûn nizanin ka blokeke burokratîk li dû wî ye. Ew hemû bi wî re yan radibin, yan dikevin. -Ev kes pir baş dizanin vê yekê bikin. Divê tu di sala 2020ê de dîsa werî vira û bibînî ku kurê wî çawa cihê bavê xwe distîne''.*

Isbat bû ku ev gumankirina herî rast bû, ku min der barê vê dewleta tevlihev a komunîzm û desthilatdarîya malbatî de bihîst. Helbet ji bilî wê krîza dil ku **Kim Jong Il** di 69 salîya xwe de derbaz kir û bû sedem ku **Kim Jong Un** zûtir bibe xelefê wî. Gelê Koreya Bakur serdemeke hezar salî ya monarşîyê û sedsaleke dîktatorîyê -ya japonan a navbera salên 1910 û 1945- nas dikin, ku di merheleyên dawî yên kolonyalîzmê de koreyî mecbûr bûn ku bi împaratorê japonî biperesin û paşê jî hegemonyaya 66 salî ya malbata **Kim** hat. Li ser roja jidayîkbûna nevîyî, ya 8ê çileya pêşîn (sala jidayikbûna wî hîna jî razek e, yan 1983 yan jî 84 e) televîzyona Pyongyang dokumentereke yek seatî weşand ku tê de ew bi hemû fazîletên Koreya Bakur tê pîroz kirin û bi hemû cih û peykerên girîng bi nav dike, ku **Kim Il Sung** zîyaret kiriye, nemaze jî bi Çîyayê Ser Spî, volkanekî kevin a li ser sînorê Sino-Koreyî; kanîya gelê Koreyê; hin qadê şerê gêrîla yên li dijî japonan a salên 1930ê û cihê watedar a ji dayîkbûnê yê **Kim Jong Il** yê sala 1942. Lê belê yê herî balkêş, zimanê bedenî yê **Jong Un** bû: Dirêj, gir, devliken, xurt û ji niha de siyasetmedar e û wekî kesekî ku li malê ye û bi rola xwe ya ji nişkan ve hatî wêrek xuya dike: *'Xelefê ku jê tê hez kirin.'*

Wecê **Kim Jong Il** ê nexweş, ku çakêtekî şimitîna ser berfê li xwe dikir, li paş berçavkên qirase yên rojê hatibû veşartin. Di rû û tewra şexsî ya **Jong Un** de tiştê herî girîng wêneyê bapîrê wî yê salên 1940ê bû ku wê demê hatibû ser îqtîdarê. Di wêneyê de dihat dîtin ku heta cênikên wî, ew traş bûbû. (Belge fîlm jî Kim Il Sung bi heman awayê porê qusandî nîşan dida.) Mirov digot qey DNAyên wî bêyî ku xera bibin derbasî nevîyê wî bûne -û bêguman rejîmê jî dixwest, ku xelk bi vê yekê bawer bike.

Çanda Koreyê bi merasîm, rêûresim, wêje, helbest, zargotin û gotegotên li ser malbata qralîyetê tije ye -û nemaze jî, ka kîjan kurik dê bibe xelefê qral. Gelek ji wan di temen biçûkîyê de bûn qral. Qralê herî mezin **Sejong**, ku li jêr desthilatdarîya wî alfabeya yekgirtî ya koreyî hat weşandin, di sala 1418ê de dema ku hîna 21 salî bû hat ser kar û ji deshilatdarîya bavê xwe sûd wergirt. Wekî **Jong Un**, ew jî kurê sêyem bû; kurê mezin ji ber bêrûmetîyê ji Seûlê hat mişext kirin û kurê navîn jî bû keşîşê Budistanê. Kurê yekem ê **Kim Jong Il**, **Kim Jong Nam** dema ku bi navekî sexte xwest ku bi qeçaxî bikeve Japonyayê, hat girtin (tê gotin ku dixwest here Disneylandê) herkes ket ber şermê û biryar da ku li paytextê qûmarbazîyê yê cihanê Macaoyê bijî. Bi rastî derbarê kurê navîn de kesî tiştek nedizanî û ew di cenazeya malbata xwe de jî amade nebû.

### "Sixêfan ji lîderê me re nekin"

Gelek caran tê gotin ku asyayî jê nefret dikin ku 'rûyê' xwe wenda bikin. Ev peyv dikare bi awayekî çêtir wekî heysîyet-serbilindî, yan şeref were wergerandin. Di çavê koreyîyan de îtîbara neteweyê bi rûyê/îmaja serok ve girêdayî ye. Di 1989ê de dema ku ez ji balafirgehê vedigeriyam û em li ser gelek bîlbordên **Kim Il Sung** dipeyivîn, rêberê min hişyarîyek da min: *Tika ye heqaretê li serokê me neke.* (Niyeteke min a bi vî rengî tunebû, ji ber ku min nedixwest çûyîna xwe ya ji welêt bixim xeterê.) Îdeolojîya serok, him wê demê û him jî niha, ***"Juche," or chuch'e*** ye ku tê watêya *"di bîra kesekî de berîya her tiştî û serê her tiştî Kore heye"*. Lêkolînerekî Koreyê **Gari Ledyard** dinivîse ku karaktera duyem, ku digel peyva *-kukch'e-* an ku netewe were bi kar anîn, di wateya kelepûrî de bi wateya rûyê neteweyî, yan serbilindîya neteweyî tê bi kar anîn. **Ledyar** weha berdewam dike: *''kukch'e nikare were xera kirin, lê dikare were êşandin, dikare li ber şermê were danîn. Endamên civakê divê weha tev bigerin ku kukch'e neyê 'wenda' kirin. Ev wateya peyvê bi hest û exlaqê neteweyî ve girêdayî ye ku çavkanîya xwe ji psîkolojîya neteweyî distîne''.* Her kesek ku biçe seredana Bakur dê bibîne ku ev fikir hîna jî zindî ye -pir caran li ser abîdeyên serbilindîyê yên bi îhtîşam, lê belê herweha li cem xelkê jî bi hurmeta serbilindîya neteweyî.

Qralê dawî yê Koreyê, **Kojong** dema ku di 1863ê de li ser text rûnişt, hîna 11 salî bû. Heta ku ew kamil bû bavê wî -**Taewon** ku wekî desthilatdarekî hêzdar dihat nasîn- alîkarîya wî kir. Di dema desthilatdarîya wî de bavê wî îdeolojîya domînant (Konfuçyusîzma Nû) dubare hêzdar kir û wî li dijî wan împaratorîyên ku li derîyê Koreyê dixistin, siyaseteke hişk meşand û him li dijî Fransayê (1866) û him jî li dijî DYAyê (1871) şerên giran kirin. Piştî du salan serokatîya nû ya japon **Meiji** hindik mabû ku Koreyê dagîr bike. Ev di dema herî bilind a ***Qralîyeta Hermit*** de bû û *kukch'e* nemaze di desthilatdarîya **Taewon'gun** de serdest bû. Lê belê dema ku **Kojong** kamil bû, wî reformên nûjen li dar xistin, peyman girêdan û derîyên Koreyê ji bazigarnîyê re vekir û hewl da ku li hember hev du lîstîkên emperyalî nelîzin. Ev tişt dora çaryeka sedsalekê baş meşîya û dema ku di 1910ê de desthilartdarîya Koreyê hilweşîya, êdî nemeşîya. Li Muzexaneya Şoreşê ya Pyongyangê, li hember wê peykereke qirase ya **Kim Il Sung** heye, kesên ku diçin seredanê, pesnê **Taewon'gun** didin, dema ku ew abîdeyên dema wî dibînin, ku tên wateya berxwedana li hember bîyanîyê barbar û koreyî bi 'serkeftina' li dij fransiz û amerîkîyan serbilind dibin.

Di domahîya cenazeya vê dawîyê de, ku di rojeke zivistanê de bi rê ve çû, zavayên **Kim Jong Il, Chang Song-t'aek**, li paş **Kim Jong Un** meşîya; **Chang**ê, 65 salî serokê dezgehên herî hesas ên ewlekarîyê ye. Li paş wî **Kim Ki-nam** dihat, ku zilamekî heştê salî ye û bi nêzîkbûna xwe ya **Kim Il Sung** tê nasîn. Sê nifş li kêleka ***Lincoln Continental*** a kevin û bi zirx ya ji salên 1970yê digel tabûta **Kim Jong Il** dimeşîyan û li alîyê din ê lîmûzînê generalên bilind ên artêşa dewleta garnîzonê, ku xwedîyê artêşa çaremîn a herî mezin a cîhanê ye, ketibûn rêzê.

### "Raman her tiştî dîyar dike"

Merasîm wekî ya cenazeya **Kim Il Sung** bû, û wekî niha jî şareza û rayedaran heman şirove kir *Newsweek* ji bo nûçeya xwe serenavê "Cinawirê Bêserî" hilbijartibû û fermandarê leşkerî yê amerîkî, ku li Başûr e, gelek caran dubare kir ku Bakur dê *"hilweşe yan biteqe."* (2) Rûxana dema nêz a rejîmê jî di naverasta salên 1990ê de bûbû dirûşmeya CIAê. (Niha piştî bîst salan em dibînin û çend salên din jî bidin Komara Gel a Demokratîk a Koreyê, emrê wê dê bi qasî emrê Yekîtîya Sovyetan be.) Çend meh berîya mirina **Kim Il Sung**, min bihîst ku lêkolînerekî amerîkî yê li ser Koreya Bakur di konferansekê de dibêje ku dema ku **Kim** mir, xelk dê rabe ser pîyan û rejîmê hilweşîne. Lê berevajî, xelkê li kuçeyê, bi vê peyamê kenîyan wekî sala 1919ê, dema ku Qral **Kojong** mir, raperîneke neteweyî ya li dij japonan pêk hat.

Piştî mirina bavê wî **Kim Jong Il** wenda bû, ku ji ber vê yekê gelek gotegotên li ser îqtîdarê derketin. Lê belê wî weha dikir, ku prensek di dema rejîma kevin de divê bikiraya: Wi ji bo sê salan şîna bavê xwe girt. Di 50emîn salvegera damezirandina Komara Gel a Demokratîk a Koreyê a sala 1998ê de aşkere bû ku welat li jêr desthilatdarîya **Kim Jong Il** de bû. Wî herweha gelek cara dîyar kir ku komunîzma li Rojava ji ber qelsbûn û erozyona safbûna îdeolojîyê pêk hat. Koreya Bakur hişê **Marks** anî serê wî û careke din lingên **Hegel** gihandin erdê -wan digot *'hertişt ji alîyê fikir ve tê dîyar kirin'',* ku bi nivîsên Konfuçyusîzma Nû ya **Taewon'gun** li hev dike.



ZORO METTINI: **Genên veguhertî**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 60 x 50 cm

Dê balkêş be heger **Kim Jong Un** jî heman rîtuela şîngirtinê pêk bîne -heta niha nekir, ew çû seredana yekîneyên leşkerî û derket pêşîya raya giştî. Helbet dema ku berevanên kevin welêt bi rê ve dibin, ew jî tecrube ber hev bike ji bo wî baş e. Jixwe, hilbijartinên serokatîyê yên li Amerîka û Koreya Başur divê di dawîya îsal de pêk werin, (ku serokê niha yê koreyî, ku tundrewek e û bakûrî jê nerazî ne, nikare dîsa bibe namzed), serokê herî bilind ê Çînê **Hu Jin-tao** vedikişe û hilbijartina **Putin** a li Rusyayê ne dîyar e. Lê belê ew bê guman (û bilez) bû rûyê rejîmê ku kêfa xelkê ji **Kim Jong Il** pirtir ji wî re tê.

Dîsa jî, xebera sîxûrê min ê sovyetî bû û ez di warê dîmena gir a bedenî de xelet bûm: Çawa xuya bike bila bike, qral nikare tiştekî xelet bike -herçend wî di lîstîka golfê de gelek teyrê baz xistin jî (wekî ku zilamên **Kim Jong Il** idîa dikin) di metneke klasîk a ewropî de, *Du Laşên Qral* de **Ernst Kantorwicz** dinivîsîne ku du qral hebûne: Fanîyekî mirovê qels bûye qral û qralê ebedî yê bêkemasî jî heta dawîyê bû sembola monarşîyê. (3) Ji ber vê yekê koreyîyan **Kim Il Sung** kir serokê nemir, hemû kêmanîyên wî hatin jê birin û mozeleya wî niha avahîya herî girîng a welêt e. Rûyê dev li ken ê **Jong Un** dikare bi xelkê rojên **Kim Jong Il** ên 17 salên bi lehî, hişkî, aborîya xerab û xela, ku pêşî li mirina sed hezaran kes vekir, bide ji bîr kirin. Tenha serkeftineke **Kim** hebû: Bi destxistina çekên navokî. (Lê belê ev yek herweha ji ber doktrîna **Bush** a nezan û provokatîv, wekî êrişa pêşîgir ku Koreya Bakur digel Iraq û Îranê hevbendîya şer bi nav kir.)

Ji ber pozîsyona jina min a li Zanîngeha Virginiayê, em li kampusê di yek ji deh pavîlyonan dijîn, ku berîya 200 salan ji alîyê **Thomas Jefferson** ve hatine dîzayn kirin. Sedemeke aşkere ku ne dîrok e ku amerîkî li ser dîroka hilweşîyayî, dîroka bê eleqe meraqdar in. (Edîtor: Wekî gotina **'Georger W. Bush** dîrok e! ji ber ku niha nîne û lewma bê eleqe ye.) Dîsa jî ew li cem herkesî " **Camêr Jefferson''** e û wekî "mukemmel" tê dîtin. -Lê belê qulubeya brîket, ku koleyan berê alav malavên xwe xistinê, hîna jî li bexçeyê me ye. Heger em lê hay bin, yan nebin jî, em hemû mirov in, bi hev re dijîn û bêrîya rabihurîyeke bikêrhatî dikin. Xelkê Koreya Bakur dê bi tenê xêrhatina rûyekî xweş a desthilatdarîyê, ku nas dikin, an ku damezinêrê welêt "serokê bavo can' bikin, ku niha reankarne bûye. Dibe ku hîna negihiştîye sî salîya xwe jî, heger muxattabê min ê sovyetî rast be (ku ev sîh sal in xebera wî ye) em dê ji bo demeke dirêj rûyê **Kim Jong Un** bibînin.

* Gerînendeyê beşa dîrokê li zanîngeha Chîcago. Nivîskarê berhema *The Korean War: A History,* Random House, NewYork, 2010

1 Victor Cha, "China's newest province?", *The NewYork Times*, 19 kanûn 2011

2 18 tîrmeh 1994, çend rojan piştî mirina Kim Il-sung

3 Ernst Kantorowicz, *Du laşên qral. Ceribandina li ser olzanyarîya siyasî di Çerxa Navîn de*, Gallimard, Paris, 1989 (1re éd. : Princeton, 1957)

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

# Li Magrebê, sîberaktîvîst westîyayî ne

SMAIN LAACHER û CÉDRIC TERZI *

Serhildanên ereban kirin ku di medya û çapemenîyê de fîgura çalakvanîya-sîber [çalakvanîya kesên çalakîyên xwe li ser Înternetê pêk tînin, nota wergêr] derkeve holê, ev çalakîyên Înternetê li ser rewşa jîyana gel û li ser hîsa neheqîyê ya ku ev rewş dibe sedema wê, agahdarîyan dide. Çalakvanên-sîber ku bi piranî tecrûbeya wan a çalakîyan tuneye û rewşa apolîtîk ya tevlîbûna xwe derdixin pêş, ciwanên ji 20 heta 30 salî yên bajarî û dewlemend in. Lê belê zor û zexta li dijî gel ew kirin yek. Blogvanê tûnisî **Hamadi Kaloutcha** (1) wisa şirove dike: "*Di dema **Ben Ali** de em bi tenê sed, yan jî dused sîberçalakvan bûn. Bi tena serê xwe em li dijî hemûyan bûn. Polîsê Înternetê çi ji destê wî dihat dikir da ku bawerî bi me re çênebe. Lê di encamê de ev gef û tehdît gelekî bi kêrî me hatin: Em neçar hiştin ku bi cidiyeteke bêqusûr tevbigerin*".

Herçiqas nirxên hevpar ku wan dikin yek hebin jî, nasnameya sîber-çalakvanan gelekî girêdayî çarçoveya netewî ye ku tê de dijin. Li Fasê yên herî navdar muhendis yan jî rojnamevan in. Berevajîyê wê li Tûnisê sîber-çalakvan bêhtir endamên dinyaya huner û çandê ne. Niqaşên ku li Tûnisê pesnê "*şoreşa facebookê*" didin, ji bo fêmkirina rewşa blogvanên bi kelacan ku bêhêvî man alikarîyê nake. **Manichaeus** (2) wisa bi kurtasî rewşa fikra wan rave dike: *"Ew şînê digrin"*.

Ew bi rêya Înternetê pê hesîyan ku êdî nikarîbûn xwe li rejîmê ragirin û ku dikarîbûn bi awayekî eşkere rejîmê rexne bikin. Yên ku me hevdîtin bi wan re çêkir, hemû behsa rola destpêker ya *Tunezine***y**ê dikin, ***Tunezine*** kovareke muxalefetê ye ku di sala 2001ê de ji alîyê aborîzan **Zouhair Yahyaoui**, yekem "şehîdê sîber-çalakvan" (3) ve hatiye derxistin. Ji bo wan, ketina nav Înternetê dihat maneya tecrûbeyeke xwe dûrxistina ji sîstemê û rexnekirina wê, nexasim jî xwe dûrxistina ji civaka tûnisî bixwe. Bi heyecana îlhameke wêjeyî, hin blogvan kronîka jîyana rojane ya guman û êşên welatîyên xwe nivisîn. Vê yekê dîsa jî ew ji sansurbûnê, ji gefxwarinên polîsan û hin ji wan jî ji girtîbûnê neparastin. Weke **Fatma Arabicca**, ku mehkumkirina wê di sala 2009ê de bû sedema seferberîyeke neteweyî û navneteweyî û vê seferberîyê kir ku ew were berdan. (4)

Ji wê demê û vir ve, sîber-çalakvan dev ji rabûna li ber "***Amar 404***" (kesayeteke xeyalî ku bi peyama "***şaşî 404***" nahêle bikarhênerên Înternetê bikevin malpereke Înternetê) berdan û êdî timî henekê xwe pê dikin. Em dikarin bêjin di bihara 2000ê de tekoşîna wan gihişt asteke nû, wextê sansurê bi ser tevahîya bikarhênerên facebookê de girt. Wan bi kampanyayeke îmzeyan a li ser Înternetê ji deh hezaran zêdetir îmze peyde kirin. Wê demê hin sîber-çalakvanan biryara bi awayê fermî xwestina destûreke xwepêşandaneke li dijî sansurê girt. Di wê demê de tukesî nikarîbû li daxwazeke bi vî rengî bifikire, xwepêşandan jî dê 22ê gulanê pêk bihata. Piştî ku polîs bi ser wan de hat, wan dev ji xwepêşandanê berda, lê belê bang li tevahîya welatîyan kirin ku li ser rêya sereke ya Tûnisê kom bibin û kirasên spî li xwe bikin. **Yassine Ayari**, yek ji organîzatorên vê seferberîyê, vê serpêhatîyê weke *"werçerxekê"* dest nîşan dike.

Hemû bi heyecan vedibêjin ka wan çawa wêneyên polîsan ku guleyên rastîn li xwepêşandêrên ciwan dibarînin, peyde kirin û çawa ew [li ser Înternetê, nota wergêr] belav kirin. Wê demê wan xwe bi hesta kûr a piştgirîya neteweyî giranbar hîs kir û vê hestê ew daxistin nav kolanan û kir ku li ber komputerên xwe bi şevan hişyar bimînin, da ku wêneyên xwepêşandanan û hovîtîya polîsan li ser Înternetê belav bikin.

Wexta mirov wê demê bi bîr tîne, dikare bibêje ku ev serpêhatîya kolektîf dişibîya kêlîya yekbûna civakekê ku hema bi şûn ve ji hev veqetîya. Daxistina **Zeynel Abidîn bin Elî** ji desthilatdarîyê herçiqasî bi seferberîyeke neteweyî hatibe pîroz kirin jî, çûyina wî di heman demê de bû vegera civakeke parçebûyî. Bêyî sembola dijmin, sîber-çalakvanan xwe kir raqîbên siyasî. Têkîlîyên wan ên navxweyî êdî tijî bûn ji reqabetê, şik û bêbextîyan. Yek ji blogvanên ku di medyayên Rojavayî de cihê herî pêşî digire, **A Tunisian girl** (6), wiha şirove dike: *"Dijmin êdî ne eşkere ne, em êdî tê dernaxin ka kî dijminê kê ye. Va ye: Em niha parçebûyî ne. Hin blogvan pişta hev digirin, lê hin nagirin"*. **Hamadî Kaloutcha** jî gelekî li ber xwe dikeve: *"Ji 14 çileya 2011ê ve Înternet veguherî kaoseke giştî ku em tê de nikarin bifikirin. Di nav şerên alîyan de ji me re zehmet e em dengê xwe bidin bihîstin"*. Divê mirov bi bîr bixe ku tevnên civakî yên Înternetê hejmareke pir mezin a endamên nû girtin nav xwe. Di nav wan de jî yên gelek muxalifên derengmayî, kesên ku agahîyên derew belav dikin, yên ku dîmen û wêneyên çêkirî belav dikin, hene. Encama vê yekê ***kakofonîyek*** [wexta di heman demê de ji her alîyî ve dengên cihê tên, mirov acîz dikin û tutişt nayê fêm kirin] e ku nayê terîf kirin.

Kelecana yên ku şirove dikin ji tecrûbeya sîber-çalakvanên tûnisî bihurî. Lê belê herçiqasî li dijî bawerîyên hişk ên hevpar ên ku li derveyî Tûnisê xwe ferz kirin bin jî, hawara wan hêjayî bîhisitinê bû. Wexta hukûmet, medya û lêkolînêrên rojavayî blogvan weke temsîlên rewa yên gelê tûnisî li ber raya giştî bi pêş xistin, belkî ji bo yekitîya hêzên pêşverû tiştekî baş nekiribin.

* Sosyolog, endamên Navenda Lêkolîna Tevgerên Civakî (CNRS-EHESS)

1 Wê ev nav li xwe kiriye http://fr-fr.facebook.com/Kaloutcha.Hamadi

2 http://manichchaeus.blogspot.com ev blogvanê ku yek ji yekem sîber-çalakvanan bû piştî kanûna 2010ê dev ji çalakîyên xwe yên li ser Înternetê berda, ji ber ku li gor wî tevnên civakî yên Înternetê têra xwe bi vê rola xwe rabûbûn

3 **Zouhair Yahyaoui**, piştî êşkenceyan di zindanê de grêva bîrçîbûnê da dest pê kirin û di dawîya 2003ê de bi şert hat berdan. Di 13ê adara 2005ê de dilê wî sekinî û jîyana xwe ji dest da, hingê 37 salî bû

4 http://fatmaarabicca.blogspot.com Ev serpêhatî dikin ku **Fatma Arabica** ji alîyê sîber-çalakvanên tûnisî ve weke sembolekê were dîtin, tevî ku medyayên bîyanî behsa wê nakin jî

5 http://mel7it3.blogspot.com

6 www.atunisiangirl.blogspot.com

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

## ZÊDEGAVÎYA TÊKOŞÎNA DIJQORSANÎ

# Masîgirek ji Somalîyê di torên dadê de

RÉMI CARAYOL *

Di destpêka çileya paşîn a 2012ê de ji gelê Somalîyê sêzdeh kes ji hêla hêzên deryayî yên Brîtanyayê ve bi sûcbarîya korsantîyê hatin girtin, di heman demê de dadgerîya Spanyayê fermana hepskirina şeş somalîyên din da ku gumana korsanbûnê li ser wan hebû. Wekî London û Madrîdê, Parîs navgînên bi destsivikî encaman digirin, dide xebitandin da ku Okyanûsa Hindê "pasîf bike", pirî caran jî guhnedana mafên mirovan berdêla vê yekê ye.

Ji 30ê çirîya paşîna 2011ê û pê ve **M. Abdulahi Ahmed Guelleh** azad e. Wê rojê, hinekî berîya duwanzdehê şevê li Parîsê çavdêrên navenda binçavkirinê ya Santêyê ew kirin der, çend meh bû ew li wir girtî bû. Wî bixwe nedixwest biçe. Ditirsiya… îro jî ev zilamê ji Somalî yê 36 salî hema hema qet Fransaya ku ji sê salan zêde ye wî gav avêtiyê nas nake, ji ber "bûyerên korsantîyê" li avên deryayên welatê xwe hat kelepçe kirin û qeydkirin.

**M. Guelleh** piştî azadbûna xwe li banlîyoya Parîsê di oteleke erzan de dimîne, somalîyên ku li Fransayê bi cih bûne, heqê otela wî didin. Newêre ji odeya xwe ya biçûk derkeve ku şeva mana lê 38 euro ye. Parêzerê wî yê Grandmaisonê parêzer **Florent Loyseau** dibêje: *"Bi temamî nizane çi bike, li xwe maye heyirî. Her tişt jê re bîyanî ye li vir, di serî de ziman"*.

Gotina hetirî bixwe jî, hê kêm e: Li Fransayê wî ji bilî dîwarên girtîgeha xwe, gardîyanên xwe û şideta ku li hemberî hevalên wî yên girtî dihate kirin pê ve tu tişt nedît. Parêzer berdewam dike: *"Rewşa wî bêrê nedîtî ye. Li welatekî ye ku nedixwest bihatayê, tu belgeyên wî yên nasnameyî nînin, tu şopa ketina wî bo nav welatê nikare jê biçe, nîne."*

*"Va ye tiştê ku diqewime, dema ku em destûra artêşê didin, zilaman li welatê wan bigire û bi bayê bezê ji kokên wan bike, bêyî jêpirsîneke pêşî bike ji bo ku wan darizînin",* parezerekî din ê ji dosyayê berpirsîyar xemgîn dibe.

**M. Guelleh** di destpêka 16ê îlona 2008ê de, bi somalîyên din re, tevî pênc hemwelatîyên xwe li peravên Somalîyê li ser bakeştîya şanzdeh metre ku navê wê *Carré-d'As* e, ji hêla leşkerên fransî ve hate girtin.

Piştî çardeh rojan, jin û mêrekî fransî –M. **Jean-Yves** û **Mme Bernadette Delanne-**, ku heya Fransayê ev keştî parastin, li vê herêma zor a korsantîyê wekî rehîne hatin girtin. (1) Di dema êrişê de, yekî somalîyî hate kuştin û şeşên din jî hatin girtin. Hefteyekê, -li benda ku bi riya hewayê bigihêjin Parîsê- dê ji alîyê artêşa fransî ve bi hemû zelûlî û nedîyarîya xwe ve bên girtin. (2)

Ji wan tenê du kes tevlî êrişa *Carré-d'As bûbûn;* yên din tevlî herikîna guherîna ekîb û îskeleyên perava afrîkayî bûn. **M. Guelleh** nekarî şeva berê mudaxale bikira: Li quncik masî digirtin û korsanan jê xwest masîyan ji bo wan bigire, berîya ku bikin ku bi şevê li keştîyê bimîne.

Piştî desteserîya demî ya sih û heşt mehî ya şeş zilaman a ku nemaze dirêj û pir dijwar bû (3) –li Belçîkayê di bûyerên bi vî rengî de di heşt mehan de biryar da; li Hollanda di hejdeh mehan de; Spanya di nozdeh mehan de… -, paşê di encama rûniştinên pazdeh rojan ên li salona hejmar 3 ya mehkemeya Parîsê, **Guelleh** hate berdan, li pênc gunehbarên din ji çar salan heya heşt salan ceza hat birîn, gelek kêmtir ji cezayê ku dozger ji bo wan dixwest.

Di dawîya vê dozê de -li Fransayê yekemîn doza bi vî rengî bû-, ku ji 15ê çirîya paşîn heya 30ê çirîya paşîn dewam kir, a rastî êdî ji gumanê re cih nema. Ev şeş zilamên ku ji hêla birêveberîyê ve wekî terorîstên tirsnak hatin nîşan dan, bi piranî ji memûrên biçûk ên ku rajêrîya fermanên peredarekî yê ku nasnameya wî baş dihat zanîn (esîlzadeyekî xwecihî) belê tu caran fikar nedikirin.

Ev yek bi dilê rehîneyên kevin bixwe bû. Li mehkemê Delanne, deryagerekî kevin, bixwe behsa ecemîtîya wan dike. Bi awayekî ji awayan korsanên ava nerm in. Hevjîna wî li gotinên wî zêde dike: "*Wan berê tu tedbîr negirtibûn. Li ser wan tiştek tunebû* [ji xeynî çekan, nota redaksîyonê]." Û herdu qal dikin ka çawa dema hêrsa Delanne rabû, ne xema nobetdarên wan bû. Rehîneyê fransî bi we rêzikên hişk danîne (li kamarayê qedexekirina kişandina cixareyê û xwarina li guwerteyê) û kesên ku ew revandine hînî teknîkên masîgirtinê kirine… Dema li benzînê digeriyan wî şîret li wan kiriye da ku alîkarîyê ji masîgirên nêzî xwe bixwazin.

Di encama roja dawî ya daniştinê de berîya ku gel şahidîyê li sehneyeke surealîst bike ya ku tê de qurbanan êrişkarên xwe himbêz kirin, ji wan re "*jîyaneke nû û dilşad*" daxwaz kirin, **Delanne** daraza xwe bixwe radigihîne. **Geulleh**? *"Min her tim got ku tu elaqeya wî bi revandina me re nîne."* Yên din bixwe, ew sûcdar in, lê belê ew wan wekî "zarokên kûçeyan ên ku di bin mezinahîya bûyera kirî de mane" dihesibînin.

### "Prosedura neadetî"

Rêveberî bexşandina sûcê jin û mêrê malbata **Delanne** û ya jurîyê pir kêm teqdîr dike. Dozgerîya ku li ber biryarê rabû, wisa dinirxîne ku cezayên aşkerekirî yên bi beraeta **Guelleh** re dest pê kir, *"ne li gor girîngîya pir mezin a bûyera korsantîyê ye ku kir civaka navneteweyî –û bi taybetî Fransa– derfetên girîng ên eskerî seferber bike"*.

Li gor parêzeran, ev nîşana dawî mîna li xwe mikurhatinekê xuya dike. "*Em êdî ne li qada dadê ne, lê di nav rêveberîya siyasî ya vê bûyerê de ne*", henekên xwe dike parêzer Loyseau de Grandmaison. Parêzer –hemû memûrên ciwan ên daîreya dewletê- eşkere dikin ku ev "prosedureke neadetî", "fermaneke wezîfê" ye ya ku tê de pir kêm bûyer ji ber rewşa polîtîk û civakî ya Somalîyê derketibûn holê, bi kurtasî, "*dozeke polîtîk*".

Dibêjin nexwe çawa dibe ku axaftina serokkomar Nicolas Sarkozy ya ku pê destdirêjîya Fransayê li peravên Somalîyê ya 16 îlonê pîroz kir, kete nav dosyayê?

Rast e ku beraeta **Guelleh**î, heke li dadgeha temyîzê jî were pejirandin, wê mîna piştrastkirina rûreşkirina helwêsta Parîsê ya li herêmê xuya bike, li herêmekê ku li gor li xwe mikurhatina endamekî konsolosa Somalîyê li Parîsê, lê "*herkes bawer dike ku destûra wî heye hertiştî bike*".

* Rojnamevan


1 Philippe Leymarie, "Fîloyên Rojavayî li Hemberî Korsanên Somalî", Le Monde dîplomatique, Mijdar 2008

2 Şermezarkirina prosedureke îllegal, parêzer ev bûyer bir ber Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê

3 Ji serma qufilî gihiştin û çawa gihiştin ji hev hatin veqetandin, girtîyên din li wan dan, ji bilî serdanên parêzerên xwe tu hevdîtineke din nekirin, ji malbatên xwe bi tenê pir kêm agahî girtin û mecbûr man du salan bisekinin da ku bikevin hucreyên girtîyên din ên ji Somalîyê tê de û bi vî awayî ji îzolasyonê xilas bûn

Wergera ji fransî: Sevda Orak


**Pirtûka Çiya Mazî "BAHOL" derket**




Di "Bahol"a Çiya Mazî de dîsa çîrok hene. Lehengên çîrokên "Bahol"ê rahiştine bahol û tûrikên xwe ku rewşa welatê wan, rewşa erd û axa wan û derûnîya mirovên li ser xaka wan tê de ye û bi rê ketine. Van lehengên ku jîyana wan bi raz û nepen in; li welatê xwe, li çi alîqîne, bi çi bêhnteng û kêfxweş bûne, bi çi giriyane û tahde û pêkûtî dîtine û bi rê de li çi rast hatine, giş bi zimanekî şayik û watekûr, bi îronîyek qerfok û qurfok vedibêjin û destên xwe li ba dikin ber bi xwendevanan ve.

**Weşanxaneya Evrensel**

**Buha: 4 TL**

**Navnîşana ji bo xwestinê:**

Kamerhatun Mahallesi,
Alhatun Sokak, No: 25 Tarlabaşı
Beyoğlu –İstanbul

Tel: 0 212 255 25 46
0 212 255 25 87


www.arsivakurdi.org

## HÎNDEKARÎYEKE BÊHÎNDEKAR

# Di nav telekolejên meksîkî de

ANNE VIGNA *

Li demeke ku gewreşirketên narkotîkê tevahîya herêmên welêt dixin bin kontrola xwe, jarbûna dewleta meksîkî serê Waşîngtonê jî diêşîne. Ew di heman demê de pir bala xwe dide ser qada perwerdeyê ku tê de stratejîyên teknîkhez ên Meksîkoyê yên ji bo "daxistina fiyetan" zêde bi serê mirov nakevin.

Dersê cebîrê diqede û weke her carîkê, dengê *jingl*ekê tê. Ev herwiha nîşanek e ku hemû şagird li benda wê ne: Beşa reklamê. Spota pêşî malbatên li pêşîya rêzeke xanîyan nîşan dide. Dengekî off (voix off) bi serbilindî vê bangê dike: *"Vê hukûmetê ji bo yên herî xizan sê mîlyon xanî ava kirin !"*. Dûre beşeke din a hêjayî filmeke xwedî butçeyeke mezin: Sûcdarên xwedî rûçikên bêoxur û tirsnak êşûazarê didin canê zilamekî zincîrkirî. Deng ji nêz ve tê: *"Parastina mafên mirovan pêşekîyeke hukûmeta federal e"*. Ji bo zarokên gundê ***Amatlan*** a ***Quetzalcóatl***, saet li duduyê li başûrê ***Meksîko***, naverojeke nû ya dersan berî çend kêlîyan dest pê kir.

Em niha li nav dilê ***Dewleta Morelos*** in. Li vê derê, tam berî sed salan, di dema şoreşa 1910ê de gundîyên dabûn pey **Emiliano Zapata** perwerdeyeke belaş û baş dixwest. Li vê derê weke li gelek gundên din ên meksîkî, ders bi navgîna televizyonên bi peyk –ji ber vê yekê navê wan bûye "tele-kolej"– tên belav kirin.

### Gava dendemîtî dibe asayîtî

Bi sêl û bistên xwe yên wergir ên li ser banan, tele-kolej ji dûr ve tên nasîn. Li hundir, dîwarên spî yên du sinifên dersan hema bêje xipûxalî ne. Nexşeyeke Meksîkayê ya li tenişt texteyekî ku êdî ji bo wî tebeşîr bîranîneke têra xwe şîlo ye, hatiye daleqandin. Li nîvê sinifê televîzyonek li cihekî bilind hatiye danîn û pazdeh deqeyan carekê dersekê diweşîne (dûvre beşa reklamê tê). Hijdeh xwendekarên kolejî, ku ji sê astan pêk tên, ji alîyê du mamosteyan ve hatine dorpêç kirin. Bi dîtina we ev mamoste ji bo çi ne? *"Şûna televîzyonê digirin"* gava ku televizyon xira dibe, *"û ev yek jî gelek caran diqewime"*, **Ricardo Ventura**, gerînende û mamosteyê sinifên navîn (asta ku dibe berdêla sinifa pêncemîn a fransî) wisa gazinan dike. Û bi rastî jî, piştî çil deqeyên weşanê, sînyala peykê qut dibe: Dibistan ji bo îro êdî girtî ye.

Di saeta pêşî ya serdanê de, çavdêr dikeve nav şik û gumanan. Sinifa pêşî baş guh da dersê, lê belê şagird pir jî ne kêfxweş in, ji livûtevgerên pêşkêşvana ku ji studyoya xwe ya li paytextê îdîa dike ku erdnîgarîyê fêrî wan dike. Di vê navberê de şagirdên asta sêyem (sinifa çaremîn a fransî), ên li heman holê ne, di xew re diçin, an jî qelemên xwe dicûn. Berîya ku dersa wan were weşandin, divê ew li bendê bimînin ku dersên sinifa yekem û duyem biqedin. Ne pirtûkek li ber wan heye, ne jî egzersîzeke piçûk da ku di van deqeyên vezelandî de sûdê jê wergirin. Hin ji wan carna li ekranê mêze dikin. Yek ji wan vê şiroveyê dike: *"Dersên sala bihurî"*. Erê, lê bêyî deng!, ê ku hatiye kêm kirin da ku şagirdên sinifa pêşî bixebitin …

Bi mêzekirina ji bo kêlîyekê li televizyonê, perwerdekar tê derdixe ku dersa sinifa duyem hê nû xilas bûye û ew ê niha jî bi sinifa yên mezintir re mijûl bibe. Ew pirtûkên dîrokê amade dike, lê belê pêşkêşvana ciwan, bi muzîk û lîstikên ronahîyê, dîyar dike ku êdî wextê *"ewçend dihat payîn"* yê dersa matematîkê ye. Di vê navberê de perwerdekar lêborîna xwe dixwaze û dibêje: *"Bernameyê ji me re bi Înternetê dişînin, lê belê min nekarî e-maila xwe bibînim"*. Vê carê şagird çi bigire wê sê deqeyan bişixulin: Wergira peykê xira dibe, herkes derdikeve tenefusê. Di vê rewşê de gelo mamoste wê bê televizyon dersê bide? *"Na, ev ders wê di nav hefteyê de careke din were weşandin. Bi her halî ji bo perwerdê wergirtina desteka vîzuel baştir e"*.

Li kolejên adetî, heşt mamosteyên bijarte mijarên cihêreng li hev parve dikin. Li tele-kolejan, tenê kesek heye. Di teorîyê de, saetên dersan eynî ne (ji 8ê heta 13ê), lê belê roja serdana me ji ber pirsgirêkên girêdanê dersan saet 10ê dest pê kir. Û di sê saetan de, şagirdan zêde ders nedîtin: Hinan ji xwe re wêne çêdikirin, hinan bi telefonên xwe yên mobîl li muzîkê guhdarî dikirin û komeke piçûk jî dibistan paqij dikir. Her du mamoste careke din dibêjin ku ders wê dotira rojê ji nû ve bên weşandin û hingê ew ê bikaribin hertiştî ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Lê belê dotira rojê wergira peykê nexebitî û mamosteyan, berîya ku şagirdan bişînin malê, meşek organîze kir. Ev, herî hindik, nêzî du dehsal in ku ev model a ku di 1968ê de li Meksîkayê hatiye afirandin, li nêzî tevahîya welatên Amerîkî tê pêk anîn. Doktora pedagojîyê ya li Zanîngeha Pedagojîk a Neteweyî, **Etelvîna Sandoval** rewşê wiha rave dike: *"Heta ku kolejên nû bihatana saz kirin, ev formul di destpêkê de weke pêkanîneke wextî hatibû fikirîn, lê belê bi demê re bû mayînde. Bi wê çendê ku niha êdî ji her pênc kolejîyan yek jê li tele-kolejan qeydkirî ye"*. Çawa Partîya Tevgera Neteweyî (rasta lîberal) hat ser desthilatê, hejmara tele-kolejan jî hilkişîya: Di serdema serokatîya **Vicente Foks** de (2000-2006) ji sedê 117 zêde bû û ji 2006ê, dema hilbijartina **Felîpe Calderón** ve heta niha du qatan zêdetir bû. Îro ji sedî 20ê kolejîyên dewletê (ango 1.3 mîlyon zarok) li ber televîzyonan perwerdê dibînin, bi taybetî jî li gundewarîyê û kevîyên bajaran.

Herçendî tele-kolej didin zanîn ku di ezmûna Televîzyona Enlace de encamên herî xirab hatine bi dest xistin jî, li gor nirxandineke neteweyî ya her sal li hemû dibistanên dewletê û yên taybet ên welêt tê kirin, li ser zehmetîyên ku şagird li wan rast tên, pir kêm lêkolînên kûr hatine kirin. Li gor lêkolîneke ku di sala 2000ê de ji alîyê lêkolînera Enstîtuya Neteweyî ya Nirxandina Perwerdê, **Annette Santos** ve li ser 59 tele-kolejên derdorên cihêreng ên civakî ve hatiye kirin, (1) piranîya şagirdan di espanyolî û matematîkê de nagihîjin asta herî nizim a têgihîştinê û li kolejên adetî û teknîk rewş hê xirabtir e. Lêkolîner Santos encamê bi van gotinan îfade dike: *"Tele-kolej bi awayekî pir xuyayî û beloq ne-yeksanîya civakî zêde dikin: Şagirdên herî xizan encamên herî xirab bi dest dixin"*. Ji vê jî xirabtir, herêmên ji derfetan herî bêparmayî zêdetir "tele-kolejên yekpare" ava dikin, ango ast û sinifên cuda hemû bi hev re bi tenê ji alîyê yek mamosteyî ve tên bi rê ve birin. Wezareta perwerdê bêyî ku gotinê zêde direj bike rasterast li xwe mikur tê ku ev demûdezgeh ji derfetan bêpar in: Di dema teşxîsên dawî yên ji hêla wezaretê ve hatin kirin, di sala 2003ê de ji van dibistanan li 5 hezar û 180an, ango ji sedî 30ê wan, aletên televizyonê tunene; li 2 hezaran jî … elektrîk tuneye. (2)

Ev kêmasî didomin, lê belê wezîr soz dide ku hemû kemûkurî wê bên telafî kirin. Xatûn **Bernaldez** soza ku dide wiha tîne ziman: *"Serok Calderón bernameya bi navê "derfetên dijîtal ji bo herkesî"afirand û ev bername wê bikaribe zemîneke wisa çêbike da ku hemû tele-kolej di paşerojê de bi Înternetê ve bên girêdan*. Tevî vê yekê jî ne mumkun e mirov bikaribe bawer bike ku ji bo vê bernameyê butçeyeke ewqas mezin bê veqetandin, ne jî di çarçoveya teqwîma dîyarkirî de ev bername bê bi cih anîn. Serdema desthilata Felîpe Calderón jî di vê navberê de wê di kanûna 2012ê de biqede. Lê belê ji bo lêkolînerê Enstîtuya Înternetê ya Zanîngeha Oxfordê **Cristobal Cobo Romanî**, yê ku li ser teknolojîyên nû yên di perwerdeya Meksîkayê de gelek lêkolîn kirine, *"bi temamî ramaneke xeyalî ye ku mirov îdîa bike ku tele-kolej wê bikaribin bi lezeke wisa Înternetê bi kar bînin. Meksîka wê di demeke nêz de bi pirsgirêkên hê demdirêjtir re jî rû bi rû bimîne. Li Ewropayê, pirsgirêkên me yên wisa li herêmên gundewarîyê hê jî hene, tevî ku girêdana Înternetê gihîştiye asta zêdetirî ji sedî 65ê axa welêt"*.

Dîyar e ku çareserkirina pirsgirêkên dezgehî ancax bi berdêla kulfeteke pir giran a madî dikare pêk were. Halbûku, di navbera 2001 û 2008ê de, rêjeya hilberîna hundirîn a grûz, (PIB) a ji bo perwerdê terxankirî % 5.3 dakete % 5ê . (3) Ji 2006ê ve, eger em bi nimûneyeke muqeyesekirinê bidin, butçeya ji bo polîsan şeş qet hat zêde kirin. Li gor lêkolîneke 2010ê ya li ser rewşa dibistanên Meksîkayê, Rêxistina Hevkarî û Pêşketina Aborî (OECD) dest nîşan dike ku lêçûna ji bo her şagirdî/ê pir li bin ya welatên endam e: 2111 dolar li dibistana seretayî, beramberî sê qatan, ev hejmar 6741 dolar e ji bo endamên din ên OECDyê. (4) Li dibistana navîn, asta ku tele-kolejan jî dide ber xwe, ev rêje beramber 1ê 4 e: 1 814 dolar ji bo her şagirdî/ê li Meksîkayê, beramberî 7 598 li welatên endamên OECDê. Li alîyê din, rêxistin alîkarîya ku di nav pergala dewletê de ji malbatan tê xwestin, li van lêçûnan zêde dike. Li Amatlanê gerînende li xwe mikur tê ku *"malbat bi xwe berdêla hertiştî didin, ji kaxezên avrêjxaneyê bigirin heta bigihe fatûrayên elektrîkê. Ti çareyeke din jî di destê me de tune: Ji bo berdewamkirina perwerdeyê tu butçeyeke me tine"*.

### "Ji perwerdekarîyê bêhtir dîyardeyên xweser mijara gotinê ne"

Herçendî Rêveberîya Calderón di warê perwerdeyê de bêlivûtevger nema jî, tedbîra wê ya sereke malbatên ku zarokên xwe li dibistanên taybet qeyd dikin, ku bi qasî 2.3 mîlyon şagirdan in (beramberî 23.1 mîlyon şagirdên li dibistanên dewletê) xistin nava fikaran. 15ê sibata 2011an serok dîyar kir ku mehaneyên tên dayîn, wê êdî ji bacan bên daxistin – ev daxwazeke berê ya Dêra katolîk e. Lê belê **Octavio Rodriguez Araujo** vê yekê wiha şirove dike: *"Tiştekî wisa ji bo çîna navîn a civakî xelatek e, lê belê ew di heman demê de ji bo welêt jî felaketeke nû ye, ji ber ku pê re, wê neyeksanî û bêdadîyên civakî zêdetir bibin"*.

An na, hewldanên hukûmetê, yên di bin navê "Hevgirtina neteweyî ji bo kalîteya perwerdê" hatine kom kirin, pir dişibin bernameya amerîkî ya bi navê ***"No child left behind"*** ("tu zarok li kevîyan nehatine hiştin"), ku ji alîyê yek ji pêşengên ku ew dida amade kirin, kevnecîgira wezîr **Diane Ravitch** ve jî, balkêş e ku, dihat rexne kirin.(5) Armanc? Bi "xelateke" diravî handana dibistan û mamosteyên ku di ezmûna televizyona *Enlace* de encamên herî baş bi dest dixin. **Sandoval** vê yekê jî wiha îzah dike: *"Di encamê de ev yek hê jî tê wateya zêdetir kûrkirina neyeksanîyên heyî: Dibistanên seretayî û tele-kolej li nav xizanan wê hertim xwedî derfetên kêmtir bin, lewre xizan berdewam di ezmûnê de encamên herî xirab bi dest dixin"*.

### Mamosteyên neçarî karûbarên dilxwazîyê dibin

Ji bo rayedaran, berpirsîyarên rewşa heyî mamoste ne. Bisporên perwerdeyê bixwe, berevajîyê vê yekê, ji înkarkirina pirsgirêkên ku mamoste bi wan re rû bi rû dimînin, gilî û gazinan dikin. Romanî vê yekê wiha tîne ziman: *"*Mirov nikare "bi yek çavî temaşeyî her kesî bike". Li qadê, mirov rastî rewşên pir cihêreng tê, û pirî caran jî li mamosteyên ku xwe sedî sed dane karê xwe rast tê*"*.

Ev rewş li tele-kolej a bi navê **José Vasconcelos**, a li bajarê Nezahualcóyotl jî bi heman rengî ye – "Neza", weke ku ev nasnav lê hatiye kirin: "serhişk". Ev dezgeh neynika xizanîyeke pir berbiçav a vî bajarê xwedî milyonek şênî ye, li dozdeh rawestgehên metro yên li navenda dîrokî ya Meksîkoyê: Banên li ber hilweşînê, dîwarên bêsewax, camekanên şikestî. Avahîyên pir piçûçik bi sedan şagirdan tên dagirtin. Hewşa li pişt avahîya dersxaneyan jî berî demeke nêz hat biçûk kirin, dema li beşeke wê kantîneke prefabrîk hat ava kirin, *"bi xêra dêûbavên ku hatin di çêkirina wê de bûn alîkar"*, tîne ziman gerînende **José Figueroa**. Ew jî berî 43 salan, çawa ji dibistana normal derçûye, ji bo civîneke bi armanca avakirina yekemîn tele-kolejan, hatiye vexwendin. Ji wan rojan bi qasî tê bîra wî *"*wê demê, derfetên wan ji yên li Nezayê ne zêdetir bûn, lê belê qet nebe, bernameyên ku ji alîyê profesorên Zanîngeha Pedagojîk a Neteweyî ve dihatin amade kirin, pir baş bûn*"*. Îro, heşt mamosteyên kolejê hema hema televîzyonê qet bi kar naynin. Ew dersan weke li kolejên adetî didin: *"Helbet, ji bo vê, pêdivî bi amadekarîyê heye; lê belê şagird ji televîzyonê ti tiştî fêr nabin. Ev bername bi rastî jî eybeke mezin in. Tiştê tê kirin, ji pedagojîyê bêhtir efektên taybet in"*.

Weke li hemû tele-kolejan, li vir jî ders tenê danekî rojê tên dayîn. Îca, ji bo bilindkirina asta şagirdan, mamoste çalakîyên der-dibistanî amade dikin. Bêyî ti derfetên bicihanîna çalakîyan jî, wan giranî daye telafîkirina van kêmasîyên dewletê… Bi pergala xebata bi dil. Bi bikaranîna helbest an jî şanoyê, ew zendûbendê xwe ba didin ji bo ku şagirdan demeke dirêjtir li dibistanê ragirin. Bi vî awayî, dezgeha wan di ezmûna **Enlace** de encamên baştir bi dest dixe.

Di vê navberê de hukûmet hê jî giranîyê dide teknolojîyê. Ew pir bi coş xwe davêje ser tiştê ku ew weke "nûjen", "nûgir" û … "erzan" bi nav dike. Li alîyekî dewlet bi darê zorê dibistanên gihandina perwerdekaran digire, li alîyê din *Enstîtuya Latîno-amerîkî ya Ragihandina Perwerdeyî* (ILCE), rêxistina taybet a ku bernameyan difiroşe tele-kolejan, xwe amade dike ku rêbazeke dîjîtal a ji bo pêşdebirina qabilîyetên wan, derîne pîyasê. Gerînendeya Enstîtuyê Patricia Cabrera li ser mijarê van agahîyan dide me: *"Em niha ketina nav ponijîn û fikirîna li ser naverokên perwerdeyî yên ku mamoste bikaribin bi rêya telefona mobîl, an jî **iPadê** wergire. Em herwiha ketine nav hewldana têgihîştinê ka em ê çawa wê materyalê bi rêya **Facebook** û **Twitterê** belav bikin; ev e mijara danûstandinên me yên ku niha li gel wezaretê didomin"*.

Çareserîyeke teknolojîk ji bo biserûberkirina kêmasîyên pergala perwedeyî ya meksîkî: Gelo nebe ku ev ezmûn berê jî hatibe ceribandin?

* Rojnamevan

1 Annette Santos, "Oportunidades educativas en telesecundaria y factores que las condicionan", *Revista latinoamericana de estudios educativos*, Centro de estudios educativos, Mexico, 2001

2 "Situación actual de la telesecundaria en México", Subsecretaría de Educación Básica, 2003

3 Komîsyona Aborî ya Neteweyên Yekbûyî ji bo Amerîkaya latîn û Karaîban (CEPALC), kanûn 2010

4 "Mejorar las escuelas: Estrategias para la acción en México", Rêxistina Hevkarî û Pêşketina Aborî (OCDE), Paris, 2010

5 Binêrin: Nivîsa Diane Ravitch a bi sernavê "Zû-çerxkirina Wezîreke Amerîkî", *Le Monde diplomatique*, cotmeh 2010

Wergera ji fransî: Baran Nebar

... Dotira rojê, Buroya Federal a Saloxdarîyê (FBI) malpera jidûrvebarkirinê "Megaupload" asê dikir, û bi awayekî hevpar a navnedîyar, bersiv da: Malperên Qesra Spî, yên Wezareta Dadê ya amerîkî û Universalmusic bi taybetî zirar û ziyan dîtin. Ji New Yorkê heta bigihîje Qahîre û Tunisê, ji tevnên Înternetê heta bigihîje kolanan, çandeke nû ya dijraberîyê derket holê û bi gewde bû. Yên ku zext lê dikirin, niha bixwe di heman demê de berfirehî û sînorên desthilatîya xwe keşf dikin.

## SÎBERAKTÎVÎZM, BENEKÎ NÛ YÊ KEVANA DIJRABER

# Anonymous, ji mîzaha dibistana navîn ber bi çalakîya siyasî

FELIX STALDER *

Salên çûyî, li dij şirketên navneteweyî û hikûmetên neteweyî bi bikaranîna rumûza "***Anonymous***" erişên dîjîtal ên bi bandor pêk hatin. Ev êriş hemû li ser navê azadîya xwe derbirînê û edaleta civakî pêk hatin. Çapemenî cihekî gelek piçûk da van êrişan da ku wan aşkere bike, berevajî wê, ***Anonymous*** wisa hat nîşan dan ku ji alîyê "hacker"ên elît, yan jî ji alîyê toreke nûciwanên nezan ve tê kirin û ew wekî gefeke terorîstî ya bi mebesta tinazeke pozbilindîyê hat bi nav kirin. Bi rastî ev binavkirin bi giştî xelet nebû, ji ber ku her yek ji wan alîyekî vê tevgerê nîşan dida, lê bêlê wan karaktera navendî ya ***Anonymous***ê paş guh kirin, an ku ev karakter ne yek e, lê zêdetir e û ev karekî kom yan torekê nîne, lê ya girseyekê, a rast karê girseyan e ku hevkarîyê dikin.

***Anonymous*** dikare wekî mînakeke tûj be, lê belê ji hêla girîngîya wê ve ew jî wekî protestoyên din e, ku li seranserî Rojhilatê Navîn, Ewropa û li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bi rê ve diçin. Lê belê ji teşegirtinên rêkxistinî yên van tevgeran û pergalên siyasî cudatir, ***Anonymous*** aşkeretir e. Ji alîyekî ve rêkxistinên hîyerarşîk li ser esasê temsîlkirinê hatine ava kirin, ku tê de serek bi rêya tayînkirinê tên meşrû kirin, an ku bêhtir bi rêya hilbijartinan û ew dikarin li ser navê dengdarên xwe bipeyivin û tev bigerin. Lê belê gendelî, îltîmas û zevtkirina dezgehan vê meşrûbûnê qels dikin. Ji alîyê din de jî rêxistinên bêserok hene, ku bi tenê fikra xwe dibêjin û di warê beşdarbûna rasterast a di projeyên şênber de prensîpa temsîlkirinê paşguh dikin. Pircurebûna wan dihêle ku ew biryarên xwe di şûna piranîyên formel de, bi lihevkirineke qels bigirin. Bi ya nihêrîna dezgehên siyasî yên avakirî, ev teşeyên nû yên rêxistinan hema hema nepenî ne û ji ber vê yekê pir caran bi matmayî dîyar dikin ku tevgerên protestoyî tu daxwazên berbiçav nakin, ku ên li ser desthilatê pê re mjûl bibin.

### Girseyên Civakî

Girseyeke civakî ji takekesên serbixwe pêk tê ku rêbaz û qaîdeyên basît bi kar tînin da ku xwe ji bo hewldaneke hevpar bi awayekî horîzontal bi rêk bixin. Wekî ku damezirînerê ***Partîya Korsanan a Swêdî***, **Rick Falkvinge** dest nîşan dike *"Tevlihevbûn bi lîyaqatê tê, ku girse li ser çalakîya bi rêxistinbûnê çawa biryarê dide û tevdigere. Ji ber ku hemû endamên girseyê dilxwaz in -ew li wê derê ne, ji ber ku ew pê bawer dikin ku girse dikare ji bo guherînê bibe amûrek- û tenha rêya serkêşîkirina girseyê îlhamdayîna bi rêya bizavan e."* (1) Bi vî awayî hêza girseyê ji hejmara endamên wê û mebesta tevgerê û herweha ji hewldanên serbixwe peyda dibe. Girse hemû bi awayekî wekhev dest pê dikin. Bangek ji bo çalakîyê û ji bo destpêkirina çalakîyê hebûna hin çavkanîyan. Medyanasê medyaya civakî **Clay Shirky** sê şert û mercan dest nîşan dike, ku tevgereke weha sist vehewe û dest bi çalakîyan bike: ***Sozdan, amûr û bazar*** (2) ***Sozdan*** banga ji bo çalakîyê ye. Sozdan divê ne tenê bi hejmareke krîtîk a xelkê ve girêdayî be, lê belê herweha divê pêbawer û pêkan be. Çavkanî û stratejî jî ***amûr*** in ku pê dikarin soza xwe bi cih bînin. Îro amûrên ji bo tevbikaranîna hewldanên dilxwazan li ser Înternetê amade ne, an ku amûrên wekî forumên *online, wiki* û *chat*, ku dikarin xwe bigihînin hemû dînamîkên civakî. ***Bazar***, wan şertan dest nîşan dike, ku divê kesek berî ku di qada hevbeş a çalakîyê de beşdar bibe, qebûl bike. Dema ku ev her se pîvan ji bo kesên hejmareke zêde li hev werin -divê sozdan cazîb bin, amûr li ber dest amade bin û bazar ne pir zehmet be- tevkarî dest pê dike. Bi demê re, her yek ji wan sê pîvanan dikare biguhere û girse dikare mezin bibe, berê xwe biguherîne, yan jî ji hev bikeve. Da ku girseyên bi vî rengî tesadufî û temenkurt nebin, hewcedarî bi hêmaneke çaremîn heye, an ku asoyeke hevpar, ku rexnegirê çandî **Brian Holmes** rave dike: *"Ev hêman dihêle ku endamên bela wela yên torekê xwe li ser esasê gerdûneke hevpar a xeyalî û watedar bi rêk bixin".* (3)

***Anonymous*** komeke girseyan e ku her yek ji wan derdora bangeke dîyarkirî ya çalakîyê kom bûne û li ser hewldanên şexsî yên ji bo armanceke hevpar ava bûne. Her girseyek di warê cezbkirina tevkarên xwe de ji yên din cuda ye û li ser esasê serhevdeya sozdan, amûr û bazara xwe ava dibe. Lê belê ew di warê hevkarîyê de yekgirtî ne ku li jêr heman nasnameya vekirî tevdigerin, ku ji çend slogan, grafîk û referansên çandî pêk tên. Her kesek dikare vê nasnameyê wekî maskeyekê li xwe bike, lê belê anonîmbûn bi tenê wê demê watedar dibe heger ew di rabuhurîya xwe de bi çanda tinazekî badayî, dijberîya otorîterîzm û fikra axaftina azad deng vede.

### Goşeyên tarî yên Înternetê

Li hember hemû hewldanên *'medenîkirina Înternetê'*, ku herî dawî di meha gulanê de di kombûna G8 de ji alîyê **Nicolas Sarkozy** ve hat pesend kirin, goşeyên tarî, ku her tişt lê diqewimin, hebûna xwe berdewam dikin. Li ser malpereke bi Anonymous têkildar, **4chan.org, ku** di 2003ê de hat ava kirin û di warê teknolojîyê de basît e, lê dîsa jî "web forum"eke gelek populer e, xelk bêyî ku xwe qeyd bikin, dikarin wêne û nîvîsarên xwe bişînin û bi vî awayî li ser Înternetê anonîm bimînin. Malper bi tenê şandinên anonîm teşwîq nake, lê herweha beşa wê ya herî çalak *forum /b/-Random* di warê naveroka şandinan de tu qaîdeyan danayne. Hafizeyeke malperê jî nîne ku hemû şandin, ku ji wan re bersiv nayên nivîsandin, di lîsteyê de diçin xwarê û talîyê tên jê birin. Ev tişt pir caran di nav çend deqîqeyan de pêk tê. Tu tomar nayên hilanîn, yan parastin. (4) Tenha hafizaya bîra bikarhêneran e û bi vî awayî tiştê ku bi hêsanî neyê bibîranîn û dubare kirin wenda dibe. Da ku pêşî li jibîrkirinên zû were girtin, di rojekê de bi sedan şandin wekî banga çalakîyê tên bi nav kirin. Wekî mînak pêşnîyara êrişkirina ser gotareke ***Wikipediayê***, ku li jêr wê dibêje gotara 67em ku hatiye pêşnîyar kirin, hat hilbijartin. Heger ev yek bikeve serê xelkê wê demê girseyeke piçûk a li ser vê gotarê peyda dibe. Bi tenê ji bo pê şabûnê. Ji ber pêwîstîya zindîgirtina tiştan a bi rêya dubarekirinê û beşdarbûnê, bi demê re çandeke hevpar derket holê ku ji kesayetî û çavkanîyan qut bûye û bi çend hêmanan ve hatiye girêdan ku ji alîyekî kesekî xwedî zanista bingehîn ve dikare were berhev kirin û guhertin. Di çarçoveya van bangkirin û operasyonan de, çandeke ***"ultra-yekgirtî ya kîrkujinan"*** derket holê. Ev yek ji alîyê beşdarekî ve ji antropolojîstê çanda nexweşên Înternetê re (geek culture) hatibû gotin. (5)

Di pênc salên dawîyê de ***Anonymous*** veguherî ***Anonmous***, an ku di nasnameyeke hevpar de nûnerekî basît ê teknîkî. Ji ber çanda sosretîyê ya anonîmbûnê, asoya hevpar a vê nasnameyê, ji ber dilsozîya hêzdar û hetta tundrew a azadîya axaftinê û ji ber dijberîya hemû otorîteyan, ku hewlê dide ku wan axaftinan kontrol bike, ku wekî derewên durû tên têgihiştin, peyda bû.

### Navenda balkêşîyê

Ne tesaduf bû, ku di zivistana 2008ê de hin kesan di kampanyayeke li dij ***Dêra Scientolojîyê*** de (ku ev dêr bawer dike ku mirov hebûneke yezdanî ne) dest bi bikaranîna vê nasnameyê kir. Şerê *hacker* û *Scientolojîyê* deh sal berîya wê dest pê kiribû. Hackeran derfet dida ku agahîyên navxweyî yên sextekarî û manîpulasyonê belav bibe û dêrê jî bi awayekî bê rehm hemû derfetên xwe bi kar anîn da ku van agahîyan bitepisîne, îtîbara şexsî ya kesên rexnengir xera bike. Piştî ku dêrê xwest pêşî li belavkirina vîdeoyekê bigire, ku tê de endamekî bilind ê dêrê lîstikvan **Tom Cruise** gotinên beredayî dike, ***Anonymous*** jî tev li vê yekê bû. Wekî bersiva gefxwarinên asayî yên serlêdana rêyên hiquqî, vîdeoya nîv-cidî hat weşandin, ku tê de Anonymous hilweşîna dêrê ragihand.

Piştî demekê nîqaş di kanalên chatê de- ku bingeheke jêrxaneya hevkarîya spontan û rast demî- sor bûn û serhevdeyeke taybet a sozdan, amûr û bazarê hat gotûbêj kirin û asoyeke hevpar hat ava kirin. Bi vî avayî ne bi tenê çalakîyên li Înternetê hatin bi rêk xistin, herweha rojeke gerdûnî hat plan kirin û sepandin. Di 18ê sibata 2008ê de li zêdetirî 90 bajarên Amerîkaya Bakur, Ewropa, Awistralya û Zealandaya Nû xwepêşandan hatin li dar xistin. Piranîya xwepêşandêran maskeyên **Guy Fawkes** li xwe dikirin, ku niha gelek navdar bûye, da ku bikaribin xwe ji tolhildana pêkan a dêrê biparêzin. Hebûna wan a serbilind û bêarîya wan, nebûna daxwazên siyasî telafî dikir, ku galgaleke girîng hebû ku dêr dikare her kesekî ku biwêre rexne li hember dêrê bigire, biperçiqîne. Cara pêşîn hin girseyên Anonymous li derveyî Înternetê kom bûn û xwe bi çalakîyên siyasî yên bi bingeh bi rêk xistin. Şabûn êdî veguherî tiştekî cidî. Di domahîya du salan de xwepêşandanên bi vî rengî bi berdewamî bû armanca sereke ya Anonymous. Di îlona 2010ê de girseyeke din Anonymous di dora kampanyaya *'Operation Payback'* de peyda bû, ku wan dest bi êrişên li dij şirketa hindî *Aiplex Software* kir, ku ji bo hilweşandina malperên parvekirinê yên wekî *The Pirate Bay* hatibû kirê kirin.(6) Êriş pir bi lez li dij malpera MPAA (Komeleya Fîlmên Sînemayî yên Amerîkayê) û malperên rêxistinên din ên mafê telîfê berbelav bûn. Dirûşmeya kampanyayê ku digot: *'Ew navê korsanî lê dikin, lê belê em navê azadîyê lê dikin'* di derdoreke fireh de bi hêzdarî deng veda.

Di domahîya van çalakîyan de nasnameya siyasî û hişmendîya teknolojîk/taktîkî ya Anonymous wekî girseyên polîtîze bûyî berfireh bû. Di çileya pêşîn a 2010ê de, piştî ku pêşî lê hat girtin ku *Wikileaks* bikaribe bexşandinan werbigire, *Operation Payback* careke din berê xwe da pirsê û malperên *MasterCard, Visa, PayPal* û *Bank of America* sabote kirin. Di çileya paşîn a 2011ê de Anonymous berê xwe da malperên hikûmeta Tûnisê. Ev yek ji alîyê bloggerên tûnisî ve wekî piştgirîyeke navneteweyî hat têgihiştin û bi saya baldarîya medyayê ya li ser Anonymousê raya giştî ya navneteweyî berê xwe da raperînên erebî. (7)

Di domahîya sala 2011ê de girseya Anonymous qat bi qat zêde bû û bangên bêhejmar ji bo çalakîyan hatin kirin, hin ji wan, ji wan kesan bû ku li dû navê xwe digerîyan, hin ji wan jî ji wan kesan bû ku dixwest ji bala medyayê sûdê werbigirin. Lê belê ev yek nebû sedem ku girseyên din cezb bike. Di 23ê tebaxa 2011ê de Anonymous vîdeoyek belav kir û tê de banga dagîrkirina ***Wall Streetê*** kir. Ev yek ji fikra ***Weqfa Adbusters*** a kanadî dihat ku, çend meh berîya wê dabû dest pê kirin. (8) Beşdarbûna Anonymousê bi awayekî berbiçav profîla vê fikrê bilindtir kir û pê re alîkarî kir; dînamîk ber bi wan deran ve kişand, ku lê înîsîyatîfên serbixwe ji bo çalakîya pêşnîyarkirî vedihewîyan. Di 17ê îlona 2011ê de li wê derê dagîrkirineke bêdem a Wall Streetê dest pê kir.

### Gelo bizav gihişt sînorê xwe yê dawîyê?

Sosretî û biriqandina Anonymous dihêle ku dirûşmeyên weha werin afirandin û xîtabî hesta hevbeş a gelekan dike -wekî hevkêşîya qorsanîya medyayê ya digel azadîyê, ku li jorê hatibû behs kirin- lê dîsa jî ev dirûşme ji bo wan kesan, ku dixwazin ji alîyê hêzên desthilatdar ve cidî werin girtin, zêde radîkal in, nemaze jî ji bo wan rêxistinên sîvîl, ku fonên baş werdigirin. Ev radîkalbûn ji nişkan ve biriqî, lê belê enerjîya potansîyel, ku dihat pîvan, bi îhtîmala herî baş bersivên sist wergirtin. Ev yek tevkarî tê de dike ku çarçoveya wan mijaran, ku dikarin li cem raya giştî werin nîqaş kirin, berfirehtir bibe. Ev çarçove ji ber mijarên siyasî yên herikîna sereke hatibû teng kirin û heta newekhevîyên civakî, ku hatin bin xêz kirin, wekî demode û beradayî dihatin dîtin.

Lê dîsa jî, di yelpazeyeke fireh de ji bo hemû hêzan, rêxistîbûneke weha spontan di cîhana dezgehî de ji bilî rêgehên xerabker nikare ji xwe re cihekî bibîne. Niha ev rêxistin nikare û jixwe nake armanc jî dezgehên alternatîf damezirîne. Lê belê di pêkanîna asoyeke hevpar û muxalîf de tevkarîyê dike, ku ev aso dikare di warê hevkarîya çalakîyên dahatûyê de hêsanîyan peyda bike. Vê rêxistinê ji niha de dîwarên ku qewî dixuyan derizandin. Guherandina van derzan bo tiştekî avaker dê bibe karê yên din. Lê ji bo niha ***Anonymous*** bi awayekî serkeftî qada pêkan berfirehtir kir.

* Di Zanîngeha Hunerî ya Zurîchê de mamoste, di Enstîtuya Teknolojîyên Nû yên Çandî de lêkolînêr


1 Falkvinge, Rick. Girsenasî: *Girse çi ye?* (08.01.2011) http://falkvinge.net/2011/08/01/swarmwise-what-is-a-swarm/

2 Shirky, Clay (2008). Her kes li vir e: *Bê rêxistin hêza birêkxistinê T*. New York, Weşanên Penguin

3 Holmes, Brian. Swarmachine. *Continental Drift Blog* (21.07.2007) http://brianholmes.wordpress.com/2007/07/21/swarmachine/

4 Stryker, Cole. Destana serkeftina Anonymousê: Artêşa Cîhanê Çawa Em Bi Dest Xistin. Overlook, New York, London, 2011

5 Coleman, Gabriella. Anonymous – Ji Lulzê heta Doza Hevpar. The New Significance. (09.05.2011) http://www.thenewsignificance.com/2011/05/09/gabriella-coleman-anonymous-from-the-lulz-to-collective-action/

6 http://torrentfreak.com/4chan-ddos-takes-down-mpaa-and-anti-piracy-websites-100918/

7 Ben Mhenni, Lina *Keçika tûnisî, Blogên Şoreşê*. Weşanên Indigene Paris, 2011

8 http://www.vancourier.com/Adbusters+sparks+Wall+Street+protest/5466332/story.html


Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Ji qewlê xelatwergirê Nobelê Leon Lederman, Li Rêxistina Ewropî ya ji bo Lêgerîna Nukleer a li Genevê, lêkolîner ketine pey peydekirina "Hûrcewhera-Xwedê". "Hûrcewhera Higgs", ku ji navê fîzîkzan Peter Higgs hatiye, wê bikaribe rê ji ravekirina xweserîyên gerdûnê re veke. Şopajotina hûrcewhera bêdawî wê bikaribe bi xwe re fîzîkê jî raguherîne da ku bibe xwedî hêza ronîkirina bigewdebûna kozmosê …

## Gerdûnzanist, zanista gerdûnî, dîsîplîna serhildêr

# Sê hîpotez ji bo yek Big Bangê

Aurélien Barrau *

Kozmolojî zanisteke tevahîya gerdûnê ye ku hewl dide kozmozê ji destpêka wê heta dawîya wê, eger tiştekî wisa hebe, terîf bike. Ew zanisteke taybet e. Serpêhatîya "sazbûna gerdûnê" helbet… tiştek e ku nikare bê texlîd kirin, ev yek dike ku pêvajoya adetî ya piştrastkirin û kontrolkirinê bi awayê ji nû ve çavdêrîya pêvajoyên wekhev ne mumkin be. Bi ser de jî çavdêr parçeyekî wê sîstemê ye ku dixwaze terîfa wê bike, ev yek nahêle ku weke divê, çavdêr xwe ji bûyeran dûr bixe û bi awayekî bêalî û objektîf wan binirxîne. Û li alîyê din, "şertên pêşî", yanî rewşa pêşî ya sîstemê ku weke nuxteya destpêkirina veguhertina wê tê hesibandin, hîn sir in. Lewre jixwe ne berîya "sîstema gerdûnê" ne jî piştî wê heye. Tevî vê jî, divê bê hesibandin ku hêzên di kêlîyên pêşî yên dîroka kozmolojîyê de tevdigerîyan, ji hêzên ku li ser rûyê erdê hatin ceribandin gelekî xurtir in û ku berevajîyê adetê, ya ku tê zanîn "rewşa dawî" ya tişta tê analîz kirin e –û ya ku lêdigerin rewşa wê ya pêşî ye. Lê belê tevî van zehmetîyan (û hinekî bi saya wan), kozmolojî bû zanistek, heta bû zanisteke qethîbûn û vebirîbûnê. Modela standard a ***Big Bangê***, yanî ya gerdûneke ku ji 14 mîlyar salan ve mezin dibe, îro bawerîya mirov bi xwe tîne ji ber ku bi hêmanên saxlem tê rave kirin.

Di warê çavdêrîyê de, gelek sedemên bêqusûr kirin ku fikra gerdûneke ku mezin dibe xwe di sedsala 20ê de ferz bike. Galaks ji hev dûr dikevin, hebûna hêmanên kîmyayî yên pirhejmar di gerdûnê de pêşdîtinên fîzîka nukleer ên di senaryoyeke weke ***Big Bangê*** de erê dikin. Û wisa xuya ye naveroka kozmozê bi demê re diberide, eger ew statîk û bêdawî bûya ev yek nikarîbû pêk were. Û di dawîyê de, rohnîya fosîl ku bi rastî yekem rohnîya gerdûnê ye bi tevahî çawa ku jê dihat hêvî kirin, wisa tevdigere. Ev hîm fotonan diweşîne, ango tîrêjên ronahîyê ku ji her alîyê ezmên ve tên, ku di sala 1965ê de hat kifş kirin, îro pir bi endazyarîyeke heta niha nedîtî ji alîyê satelîta ewropî ***Planck*** (1) ve tên analîz kirin. Ev weşîna tîrêjên ronahîyê îsbata dema germahîyeke zêde ya gerdûnê ye ku piştî ***Big Bangê*** qewimî û bi vî awayî xetên sereke yên modelê jî piştrast dike. Bi ser de jî ew dike ku şopa pir girîng a fîzîka gerdûnê were parastin: Kêlîyên herî pêşî, hêdîka, li razên xwe hemûyan mikur tên.

Li gel van bingehên ku xwe dispêrin ezmûnan, modela ***Big Bangê*** bi avakirina çarçoveyeke teorîk ya hêja xwe da der: Îzafîyeta giştî, ku terîfa kûr û rast ya mekan û demê dike. Ew nîşan dike ku –û ev yek bi xwe şoreşeke mezin e– dem û mekan êdî ne ew cîh e ku bûyer lê diqewîmin, lê belê nîşan dide ku ew bi xwe bûyerek in. Yanî bi gotineke din, dem û mekan dînamîk dibin: Mezinbûna gerdûnê ne ji cîhguhertina madeyên di mekên de pêk tê, lê belê ji bigewdebûna mekên *bixwe* pek tê. Jixwe mirov dikare di vê çarçoveyê de bi rastî li ser kunên reş bisekine. Wextê stêrkeke dêw bi awayê supernova diteqe, cîhek di mekên de çêdibe ku ewqasî dagirtî ye ku tu tişt nikare jê derkeve. Struktura qulikên reş ewqasî tevlihev e ku tê de mekan dibe zeman û zeman vediguhere mekên. (2) Yanî mirov dikare bibêje ku mekan bi ser ve diçe, bi ser taybetîya navendî ku dawîya demê destnîşan dike! Kunên reş ku teorîya îzafiyetê heta bi asta wê ya herî jor dibe, rê li ber fenomenên dijwar vedikin. Mesela leza cismekî ku dikeve nava kuneke reş ji alîyê çavdêrekî cîran ve weke leza herî bilind (leza ronahiyê) wê bihata hesibandin, lê belê ji alîyê çavdêrekî li dûr ve wê weke leza herî kêm (yanî sifir) bihata hesibandin.

Tevî ku modela em behsê dikin bêqusûr nîne û li ser sê pirsên yekser disekine.

Berî her tiştî, em nizanin ka piranîya gewdeya gerdûnê ji çi pêk tê? Ya ji vê jî xirabtir, em dikarin dest nîşan bikin ku ev "maddeya reş" ji pirîskên ji alîyê fîzîka enerjîyên bilind ve hatin terîf kirin, pêk nayê. Yanî gumana me dualî ye: Li alîyekî kozmolojîk e ji ber ku hêmana sereke ya gerdûnê ye û li alîyê din jî madeyî ye ji ber ku divê pirîskên nû yên nehatî kifş kirin, werin dîtin. Ravekirinên mumkin, gelek in. Ya ku zêdetir bawerîya mirov bi xwe tîne îhtimala hebûna sîmetrîyeke nû ya avakêr a xwezayê ye (jê re supersîmetrî dibêjin): Têkilîyekê di navbera pirîskên ku madeyê pêk tînin (quark, elektron…) û yên ku dibin navgîna jihevdanûstandinê (mesela pirîskên elektromuxlandîs yan jî yên nukleer). Ji vê hîpoteza delal wê hebûna madeyên giran û sabît ku mumkin e madeya reş a gerdûnê pêk tînin û ku ji madeyên xuya dikin şêst caran zêdetir in, derketa holê. Ev dîtin, ku bi saya bilezkerên pirîskan ve derketin holê –bi taybetî bi saya **Large Hardon Collider** (LHC) ya *Navenda Ewropî ya Lêkolînên Nukleer* (CERN) ku li Cenevreyê ye –îro pirsgirêka sereke ya fîzîsyen û kozmologan e. Heta niha LHC bi ser tu îsbata hebûna supermetrîyekê ve nebû. Berevajîya vê versîyona "herî mutewazî" ya vê teorîyê jî li derve hat hiştin.

Paşê, berîya dehsalekê, çavdêrîyên bawerî bi wan tê nişan dan ku mezinbûna gerdûnê her diçe bi leztir dibe. (3) Eger hêza yekane ku heta astên bilind tevdigere, hêza erdkêşîyê be û ew hêzek e ku ber bi xwe ve dikşîne, çawa dibe ku gerdûn bileztir dibe? Ji ber ku hêza ku mirov difikire sedema vê bilezbûnê ye du caran ji hêza madeya reş mezintir e, pirsa me kir dibe sedema çalakvanîyeke xurtir a teorîk û çavdêrîyê.

Di dawîyê de, ***Big Bang*** bixwe, weke kêlîya avaker, tiştekî ku qet naye fêmkirin e. Maneya vê destpêka neavakirî *("avakirineke di demê de, lewre hebûna avakerekî, yanî Xwedê!" : Gotinên **Pie XII** di sala 1951ê de gotî, hesabên dihatin kirin bi bîr dixist)* û di warê matematîkê de şêlo çi ye? Di demeke ku teorî êdî hew rewa bû, ew pêşdîtineke îzafiyeta giştî ye. Sedema êdî ne rewabûnê ya vê teorîyê hêsan tê fêm kirin: Ew ji dersên mekanîka kuantîk û fîzîk a mîkrokozmozê dibihure. Ev ders nîşan didin ku di pîvana piçûk de her tişt bêdewamî dibe, ku pirîskên bingehîn dikarin di heman demê de li cîhên cuda bin, û ku divê têgeha teorîya îhtîmalê (sedemeke rê li ber encameke muhtemel vedike) şûna fikrên teqez (sedemek rê li ber encameke teqez vedike) bigire. Lihevanîna îzafîyeta giştî û fîzîka kuantîk tiştekî gelekî zehmet e ku hema hema sedsaleke aqildarên mezin hewl didin, bikin. Nêzîkatîya herî timambûyî ya ku pêdivîya wê bi îhtîmalên ku her tiştî serûbinî hev dikin nîne, bêguman a erdkişandina kuantîk a bi xelek e. (4) Ev xelek avahîyek e ku ne di nav mekên de ye, belê mekên bixwe pêk tîne. Qaşo ew ji "atomên" piçûk ên bingehîn ku em tê de dijîn, pêk hatiye.

Wexta em navê gerdûnê lê dikin, ev model nêrîna me ya kozmolojîk bi awayekî radîkal diguherîne: Big Bang, ku taybetmendîyeke safî ye, jê dibe û *"guhertineke mezin"* şûna wê digire. Bi gotineke din, wisa tê fikirîn ku "berîya Big Bangê" tiştek hebû, mekanekî şidiyayî ya ku wexta tijîbûna wê giha asta herî bilind, guherî û rê li ber mezinbûna îroyîn a gerdûnê vekir. Bi ser de jî, ji ber ku vê guhertina mezin di ronahîya fosîl de şopên ku em dikarin bi dest bixin li pey xwe hiştine, ev teorîya birêkûpêk û ji alîyê matematîkê ve baş hatiye terîf kirin, dikare were ceribandin.

Lê nêrîneke din jî heye, teorîya tayan (5), ku dihêle mirov pirsa giran a hebûna gerdûnên pirhejmar bike. Li gor vê teorîyê, qaşo di encama înflasyonê -yanî pir zêde mezinbûna "bejna" gerdûnê di kêlîyên pêşî de -ne gerdûneke bi tenê, belê hejmareke bêdawî gerdûn-glok hatine afirandin û ev gerdûn-glok li gor qanûnên fîzîkê yên cihê (ku ji alîyê tayan ve hatine dîyar kirin) ava bûne. Îhtîmal e ku ev ta ji yên ku gloka em tê de dijîn bi rê ve dibin gelekî dûr û cihê bin. Piştî ku **Nicolas Copernic**, **Charles Darwîn** û **Sigmund Freud** derb li îmaja ku mirov li ser statuya xwe ya "kesê hilbijartî" avakiribû xistin, birîneke nû ya ezperestîyê vebû: Gerdûna me bixwe ye ku ji cihê xwe yê bilind ket erdê û ku êdî weke parçeyekî ku naşibe tu tiştî ku hebûna wî di nav vê "pirgerdûnîya" fireh de îhtîmalek e. Li deverên din dinyayên bê ronahî, dinyayên bê made, dinyayên dehalî… Belkî her gerdûn-glok xwedî ***Big Banga*** xwe û alîyên xwe be. Belkî her tişt, an jî hema hema her tişt mumkin e. Qaşo di nav vê avahîya dikeve nav hev ya pirgerdûnan de, em di nav yekê ji wan de ne ku tê de hebûna tevlihevî, yanî jîyanê mumkin e -warekî gelekî piçûk ku tê de fizîkê şiklekî narîn û dijwar girt, şiklê ku em fizîkê pê nas dikin. Bêguman erda em li ser dijîn bi tu awayî pirgerdûnîyê bi giştî temsîl nake. Ev ne teorîyek e, lê belê pêşdîtina hin teorîyan e, lewra herçiqas pir spekulatîf be jî bi maneya klasîk a peyvê ev model dikare were test kirin. Wisa tê fikirîn ku berevajîya li cem mirovan adet e ku li ser efsaneyên yekbûn û birêkûpêkbûnê avabûyî ye, ya reel bêhtir piralî ye. Ev yek rêûresma fikreke paralel a atomîstên yewnan heta bi hin fîlozofên analîtîk weke **François Rabelais, Gottfried Wilhelm Leibniz, Ludwig Wittgenstein** yan jî **Jacques Derrida** bi bîr dixe.

Ev hîpotez pêdivîya hişkbûna fizîka adetî mandel nakin. Lê belê ew belkî derîyên nû vedikin. Ew tên ser sînoran da ku wan bihelînin, ji holê rakin; ew bi îhtîmala jihevdexistinekê re rûbirû ne. Guman jê nayê birin, ev e ya ku mijara hêvîyên me yên elaqedarî zanista fenê dîyar dike. Ev nêzîkayî ferz dike ku mirov bi baldarîyeke nişmî bi wan kitekitên rêûresmê ew jibirkirî, bi wan mijarên li ser wan lihevnekirî, bi nakokî û bi nederan dakeve. Ew han dide da ku mirov fizîkê weke avahîyekê ji hev derxe û wî mafî bidiyê ku ew ne yekane şêwazê rastîyê yê rast be. Dibe ku mesele îro qat bi qat zêdekirina awayên muhtemel ên têkilîyên me yên bi rastîyê (rastîyan) re be. Cihêrengî û pirrrengîya harîqulade ya dinyayê bêguman pirrengîyeke nû di awayên me yên serwextbûna li wê de ferz dike. Nebûna xeyalê timî ji zêdebûna fikrên wêrek bêhtir zirar li zanistê kiriye.

Fîlozof **Gilles Deleuze** weha nivîsîbû: *"Liberxwedan afirandin e"*. Bi tevahî li ser vî awayê fikir, îro afirandina zanistî xwe pêk tîne (yan jî diviyabû xwe pêk bîne): Liberxwedana li dijî fikrên heyî, li dijî elaqedarnebûna siyasî ji bo lêkolîna sereke, li dijî hêsanîya konformîzmê, li dijî zêdekirina mercîyên notdayînê yên hem pir zivêrker in û hem jî sethî ne, li dijî înflasyona sosret a burokrasîyê, li dijî bi awayekî birêkûpêk îtxalkirina qalib û dogmayên lîberal, li deverên ku wê bivênevê têk biçin; li dijî xizanbûna giştîkirî ya ku destekê dide bicîhkirina sîstemeke di warê întellektuel de pêşîlêgir. Der barê mijarê de **Carlo Rovelli** (6) vê fikra li jêr derdixe pêş: *"Serhildêrîya nifşên berîya me ya li hemberî nêrînên berê heyî yên der barê dinyayê de, hewldanên wan ên ji bo fikirîna li rûyê dinyaya me çêkirin. Nêrîna me ya der barê dinyayê de û rastîyên me, xewnên wan ên pêkhatî ne. Tu sedem nîne ku mirov ji paşerojê bitirse: Em dikarin liberrabûna xwe, texeyûlkirina dinyayên din ên mumkin û gera li wan dewam bikin*".

* Astrofîzîsîyeneke Laboratuwara fîzîkê ya jêratomîk û kozmolojîyê (CNRS), profesora zanîngehê Joseph Fourier û endama Enstîtuya Zanîngehî ya Franseyê.

1 *Binêre* li malpera www.planck.fr

2 Jean-Pierre Luminet, *Le Destin de l'Univers (Çarenûsa Gerdûnê)*, Gallimard, Parîs, 2010

3 Ev vedîtin bi xelata Nobelê ya ji bo fizîkê ya sala 2011ê hat xelat kirin

4 Martin Bojowald, *L'Univers en rebond (Gerdûna Diguhere)*, Albin Michel, Parîs, 2011

5 Steve Gubser, *The Little Book of String Theory (Pirtûka Piçûk a Teorîya Tayî)*, Princeton University Press, 2010

6 Carlo Rovelli, *Qu'est-ce que le temps? Qu'est-ce que l'espace? (Dem çi ye? Mekan çi ye?)*, Bernard Gilson edîtor, Parîs, 2004

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

## Wênesazê vê hejmarê

# Zoro Mettini



Di 1949ê de li Amûdê ji dayik bûye. Ji ber sedemên polîtîk a malbata xwe di 1964ê de bi malbata xwe re koç kiriye Lûbnanê. Wî 1969ê Akademîya Hunerên Bedew a Beyrûdê beşa wêne û peykerê qedandiye.

Demek wek mamosteyê dersa wênesazîyê xebitîye. Di 1972ê de bi sedan kesên din re beşdarî pêşbirka akademîya huner a Amerikayê bû û xelata duyemîn wergirt. Di 1973ê de wek rêveberê hunerê yê kovara "*Weekend*" xebitî û bû endamê *Peyana Hunermendên Rojava*. Di 1974ê de jî bû endamê lijneya rêveberîya vê peyanê. Di heman salê de wek nîgarkêş di firmaya reklamê "*Worltrade*" de xebitî.

Di 1976ê li Berlinê bi cîh bû û li vê derê dest bi xebatê kir. Bû endamê *Yekitîya Wênesazên Alman* û endamê lijneya rêvebir a wênesazên ***Steglitz***ê. Di ***Volkschochschule***yê bi salan dersên peyker û wênesazîyê da.

Bi gelek hunermendên bi nav û deng re xebitî. Hin ji wan ev in: Xwediyê xelata Oskarê, filmçêkerê alman **Hans-Jürgen Kiebach**, Cigerxwîn**, Henry Moore,** Nûredîn Zaza, **Hemreş Reşo**, Prof. Waldemar Grzimek û **Prof. Erich Fritz Reuter.**

Di 1987ê de li ***Steglitzê***, *Maseya Çandê* pêşbirkek li dar xist. Di vê pêşbirkê de hunermend **Mettini** xelata yekemîn a dekora dikê wergirt. Di 1972ê de di pêşangeheke têkel de êrişî wêne û peykerên wî kirin ku mijara wan azadî, wekhevî û mafê çarenûsî ya gelan bû.

Hunermend **Zoro Mettini** hunera xwe û felsefeya xwe ya jîyanê li ser mijarên azadî, wekhevî, aştî , xweza û jîngehê ava kiriye û di heman demê de xwedîyê kesayetîyeke balkêş e. Wek mînak 63 salî ye û li gel vî jîyê xwe berdewam beşdarî maratonên 10 km dibe.

Mirina hevjîna wî **Birgit Vogt** -ku di heman demê de menejer û şêwirmenda wî bû jî- li ser wî tesîreke pir mezin kir. Li pey mirina hevjîna xwe, 10 sal navber da xebatên xwe yên hunermendîyê. Paşê di 2010ê de bi pêşangeheke enstelasyonê dîsa dest bi xebatên xwe kir.

**Zoro Mettini** hunermendekî *surrealîst* e. Hunermendên surrealîst hêza xeyalên xwe tevli bûyer û fenomenên li dorhêla wan diqewime, dikin û bi awayekî surrealîst berhemên xwe yên hunerî diafirînin. Zoro Mettini jî di nav hunermendên kurd de nûnerê vê grupê ye. Li cem hunermendên surrealîst ji kesan zêdetir hêza xeyalê û raman giring e.

Di afirandinên balkêş û surrealîst de, ji naveroka jîndeyên di wêneyan de ne û ji tiştên tên teswîr kirin zêdetir, ketina nav dinyaya ku bi xeyalan hatiye afirandin taybetmandîyekê dide hunermendan. Hunermend **Zoro Mettini**, azadî, wekhevî, xweza û jîngehê bi felsefeya hunera surrealîst pêşkeş dike.

Taybetmendî, hêzeke bilind a xeyalê, tesîrkirin û fikirandina temaşevanan di xebatên hunermend **Zoro Mettini** de taybetmendiyeke hevbeş e. Hunermend tiştan bi xeyalên binehişîya xwe ji xwezayîtîya wan bi cihê dike û bi şiroveyeke taybet û xeyalî pêşberî me dike.

Berhemên wî di vê radeyê de ji yekbûna estetîka derdora derve û estetîka wî ya hundurîn pêk tên. **Zoro Mettini**, me bi berhemên xwe yên ku ji senteza dinyaya rastîn û dinyaya xeyalan pêk hatine, rûbirû dihêle.

Di berhemên **Zoro Mettini** de tiştên ku em dixwazin têbigihîjîn û şirove bikin ne bi tenê ew tişt in yên ku heta niha em fêrbûne, di heman demê de têgihîştin û şirovekirina dinyaya xeyalên nepenî ya hunermend e jî.

Zoro Mettini li derveyî Almanyayê beşdarî gelek pêşangehan bûye. Hinek ji van ev in: Beyrûd, Londra, Paris, Malmö, Helmstedt, Rotenburg, Hamburg, Berlin, München, Zürich û Lausanne.

Hunermend li Berlinê dijî. Ji bo agahdarîyên zêdetir hûn dikarin li malpera www.mettini.de binêrin.

## PIŞTÎ PÊNCÎ SALAN DANEZANA PORT HURON

# Danezana ku hindik mabû Amerîkayê biguherîne

ALEXANDER COCKBURN *

Têkoşîna li dijî nijadperestîyê, li dijî avhewaya îdeolojîk a şerê sar, an jî li dijî civaka berxwarinê: Di berbanga salên 1960ê de, komên radîkal li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pir zêde dibin. Tevgera Xwendekarên Zanîngehan a ji bo Civakeke Demokratîk bêyî ku bê payîn serkeftinekê bi dest dixe. Danezana Tevgerê ya berî nîv sedsalê, weke belgeyeke pêbawer a dij-çanda amerîkî tê zanîn.

Berî 50 salan komeke xwendekarên li rojavaya navendî ya Amerîkayê, belgeyek weşand, ku serenavê wê ***'Danezana Port Huron'*** bû. (1) Ev belge, manîfestoya damezirînêr a tevgera *Xwendekarên ji bo Civakeke Demokratîk* (SDS) bû. Heger hûn dîroka rabûnên sala 1960ê yên li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bixwînin, ku di van 30 salên dawîyê de hatine nivîsandin, hûn ê qet nebe carekê wekî rêxistineke ser sekûka radîkalîzmê rastî pesindana ji bo SDSê werin -ji ber têkoşîna li dij cudagerîya nijadî, nemaze li Başûr, ji ber xwepêşandanên li dij şerê Wîetnamê û jê firehtir hewldana salên 1960ê yên ciwanan ji bo şkandina qeyd û bendên lihevkirina şerê sar, ku fikirîna azad felc kiribû û bûbû sedem ku li cem hemû rêxistinên çepgir ên Amerîkayê yên wekî tevgerên kedkaran, dêr û zanîngehan, tirsa tasfîyebûnê ya ji ber ***McCarthyite*** (panîka sor an ku paranoyaya komunîzmê) peyda bibe.

SDS di sala 1960ê de hat damezirandin û di havîna 1962ê de nêzîkî ***Michigan Town*** a li ***Port Huron***ê ya li ser sînorê amerîkî-kanadayî, çar saetan dûrî bakurê ***Detroit***ê, kongreya xwe ya pêşîn li dar xist. Di vê kombûnê de manîfesyoyek hat pêşkêş kirin, ku ji alîyê xwendekarekî kevin ê Zanîngeha Michiganê –**Tom Hayden**– ve hatibû pêşnîyar kirin û manîfesto ji alîyê komîteyê ve hat nirxandin û talîyê wekî ***Danezana Port Huronê*** ji cîhanê re hat aşkere kirin.

Manîfesto weha dest pê dikir: "Em mirovên vî nifşî, di rehetîyeke herî nizim de mezin dibin, niha li zanîngehan dijîn û bi awayekî narehet li wê cîhanê dinihêrin ku em wekî mîrat werdigirin. Dema ku em hîna zarok bûn Dewletên Yekgirtî Yên Amerîkayê dewlemendtirîn û hêzdartirîn welatê cîhanê bû: Bi tenê ew xwedî bombeya atomê bû, ji şerê modern tu cara neditirsîya, yek ji pêşengên Neteweyên Yekgirtî bû, ku me bawer dikir ku dê bandora rojavayî li seranserî cihanê belav bike... Lê belê, her ku em mezin bûn, rehetîya me ji alîyên hin bûyeran ve hat xera kirin, ku pir mezin bûn. Serê pêşî, piçûkxistina mirovahîyê ku bû sembola têkoşîna Başûr a li dij kevneperestîya nijadî, em mecbûr kirin ku em dev ji bêdengîyê berdin û dest bi çalakîyan bikin. A duyem rastîya ***Şerê Sar*** ku bû sedema hebûna bombeyan û di nav me bixwe, hevalên me û bi mîlyonan kesên din de hişyarîyek çêbibe; me hemûyan xetereke hevbeş par ve dikir; em dikarin her wext bimirin...

"Dema ku van probleman û problemên din rasterast zext li ser me kir, yan jî hişên me xera kirin û bûn fikarên me yên subjektîf, me nakokîyên tevlihev û acizker ên Amerîkayê dîtin... û me hêdî hêdî hîs kir ku tiştê ku me wekî serdema zêrîn a Amerîkayê didît, di rastîyê de berjêrbûna serdemekê ye...

"Ev fikir pêşengîya karê me dike: Dibe ku em nifşê dawîyê ne ku xwedî tecrubeya jîyanê ye. Lê belê em hindikahî ne –piranîya mirovên me hevkêşên demî yên civaka me û cîhanê wekî parçeyên weha dibînin ku heta hetayê bi rê ve diçin.

Dema ku mirov van hevokên wekî wahîy dixwîne, teqez matmayî dibe ku di 1962yê de di dawîya veguherîna ***Şerê Sar*** de şiroveyên weha têkçûyî hatine kirin. Wê demê, çardeh sal bûbûn ku Serok **Truman** mîlîtarîzasyona aborîya amerîkî ya piştî ***Şerê Sar*** dabû dest pê kirin. Heta sala 1950yê şêwirmendên leşkerî yên amerîkî li ***Îndo-çîn*** bûn, heta naverasta 1950yê potînên emperyal ên amerîkî reformên li ***Guatemala*** û ***Îranê*** perçiqandibûn. Di 1961ê de Serok **Eisenhower**, salek berîya ***Danezana Port Huron***, xatir ji serokatîyê xwest û hişyarîya xwe ya navdar ragihand: *"Divê em li dij nufûza neheq a sanayîya leşkerî rawestin. Potensîyela karesatî ya destguhertinê ya îqtîdarê heye û dê her hebe.. Divê em...hişyar bibin... talûke heye ku polîtîkaya giştî bixwe bibe hêsîra elîtên zanyarî û teknolojîyê."* (2)

Bi rastî jî heta dawîya salên 1950yê, an ku serdema cemedî ya ***Şerê Sar***, herî kêm li kampûsekê, dest bi hejînê kir. Di 1956ê de li Zanîngeha Kalîfornîyayê ya li Berkeleyê rêkxistina li dij temrîna îcbarî ya leşkerî ya li kampûsê (ROTC) bi grêva birçîbûnê dest pê kir û di 1962yê de bi awayekî serkevtî bi vetokirina rêveberîya zanîngehê bi dawî hat. **Joe Paff** ku li Berkeleyê zanistên siyasî dixwend, niha tê bîra wî ku di dema hatina wî de ***Berkeley*** cihekî çawa aloz bû: "Amerîkaya navendî bi rengên xakî yên li ser pantorên reş û yaxeyên bi qumçikên xwarê û cilên Oxfordê dihejîya. Ew hema bêjin wekî unîformayekê bû. ROTC mecbûr dikir ku zilam her hefte carekê cilên serbazî li xwe bikin; kurikên gir ên ji bo qebûlkirinê zor didan derîyê kampûsê; hilbijartinên ji bo dezgeha xwendekaran jî wekî henekekê dihat dîtin (*Heger werim hilbijartin ez dê Sather Gateê bişînim fezayê da ku li wê derê digel heyvê bikeve pêşbazîyê*.) Endamên fakulteyê ku dihat bawer kirin ku sondaxwarina dilsozîyê bin pê kirine, hatin tasfîye kirin. Di atmosfereke weha muhafazakar, ortodoks de û bi 'Zilamên Rêxistinê' yên **William Whyte**, kampusê biryar da ku ew êdî li ser 'mijarên derveyî kampusê' napeyivin û divê xwe ji 'ajîtatorên ji derve' biparêzin.

Heta 1961ê, **Paff, Malcom X** vexwend da ku di gulana 1961ê de li kampusa Berkeleyê axaftinekê bike, lê belê rêveberîya zanîngehê **Malcom X** red kir û got dibe ku ew mîsyonerek be û hewlê bide ku xwendekaran bîne ser ola îslamê. *"Me di deqqeya dawîyê de ji wî re cihek dît, ku ji bo danasînê wext nemabû û di salonê de bi tenê cihê 160 kesan hebû. Axaftina wî mirov dihejand û min heta wê demê axaftineke weha neasayî guhdarî nekiribû. Wî jîyana herkesî heta dawîyê guherand. Dema ku mirov jê pirsek dikir, wî zoq li çavê wan dinihêrt û pirs dubare dikir û paşê bi kûrahî bersiv didayê. Piştî demeke gelek kurt êdî xelk ditirsîya ku pirsên ehmaqane bikin. Hemû reşik bi hev re rûdiniştin û haya kesî jê nedibû dema ew diçûn. Piştî mehekê, nîvê reşikan axaftinên **Malcom X** dubare dikirin"*.

Salên 1960ê rê li ber gelek bûyeran vekir. Xwendekaran berê xwe da Başûr da ku li wê derê digel *Komîteya Hevkarîyê ya Bê-Şîddet a Xwendekaran* (SNCC) bixebitin, ku ev rêxistin di 1960ê de hatibû damezirandin. Bi vî awayî ***Danezana Huronê*** ji esmana daneket û bi giştî ne nû bû. Lê belê tu belgeyeke radîkal a ji wê serdemê tirsa ku li cem ciwanan peyda bûbû weha baş û aşkere ranedigihand, ew her têdikoşîn da ku xwe ji muhafazakarên salên 1950yê rizgar bikin. Profesor ditirsîyan ku xelk wan wekî çepgir bi tilîkan nîşan bidin. Di beşên zanista siyasî de, karên rewşenbîrên mezin ku di antolojîyan de bi başî dihatin edît kirin, hatin sterîlîze kirin.

***Daxuyanîya Huronê*** bi fikara tenê mayînê û bîyanî hiştinê deng veda. Ji lîberalîzm û sosyalîzmê wêdetir ev yek mijareke bingehîn a xwe naskirinê û bicihanîna potansîyelê bû -ku weha xuya ye ev fikir ya **Paul Goodman** bû, ku yek ji damezinêrên ***Gestalt terapîyê*** û nivîskarê pirtûka anarşîst a bi navê *Absurdîya ku Mezin Dibe* ye. Ev pirtûk li cem ciwanên her du alîyên Atlantîkê gelek dihat xwendin. (3) Beşa daxuyanîyê ya bi serenavê *'Civaka Wêdetir'* nîşan dide ku dora xwendekarên nû yên hişyarbûyî bi pêla *'wekhevbûnê'* hatiye girtin, ku civakê hemûyê hişeke xelet a desthilatdarîyeke bîyanîhiştî nîşan dida. Peywira çandî ya xwendekaran ew bû ku rewşa rast a heyî nîşan bidin, ku di bin karên bi mûçeyê bilind a çîna karkeran û valahîya piştên makîneyên mezin û keştîyên masîgîrîyê yên havîngehan û li ber golan bûn. Di piranîya *'Civaka Wêdetir'* de kedkarên rêxistinkirî peyda bûn, an serokatîyên sendîkayan *Notên Aborî û Fîlozofîyê* yên **Marks** nexwendin, da ku cureyên li dervehiştinê bi lêv bikin. (Karek ku SDS pêşnîyar dike ku bîne cih.)

Beşeke gelek kurt a bi navê *'Aborî'* ku ji çend paragrafan pêk dihat, weha dest pê dike: "Gelek kesên ji me li benda teqawidbûneke rehet in...' û Amerîkayeke hevwelatîyên dewlemend nîşan dide ku narehet in di nav xwe de kesên xizan bibînin. Ev roj niha wekî utopya tê guhê mirov û xweşbîneyeke hewceyî xaleke girîng bin xêz dike, ku nivîskarên ***Daxuyanîyê***, herçend di destpêkê de dibêjin ku dawîya *Serdema Zêrîn a Dewlemendîyê* hatiye jî, xwedî hesteke gelek kêm a kapîtalîzmê bûn -kêmanîyek e ku hema hema li cem hemû aborîyên mezin ên wê demê peyda dibû. Bi tenê piştî heft salan, an ku 1961ê çîna karker a amerîkî -di tebeqeya wê ya jorê de, ku piranî ji spîyan pêk dihat- gihîşt dîyarê xelatên kapîtalîzmê: Heqdest û alavên wekî makîneyên mezin ên rehet ên bi dekorasyonên luks, makîneyeke duyem ji bo jinên wan, ku niha makîneyên wan tune ku pê herin derve û bixebitin, alavên li malê ku nedihiştin ew li malê biwestin, mûçeyên teqawidîyê, sîgortayên tendurustîyê û piştî 1965ê ***Medicare*** -sîgortaya tenduristîyê ya civakî ji bo kesên ser 65 salan. Bi salên 1970yê û pê ve em hemû berjêr çûn.

Beşa herî hêzdar a di ***Daxuyanîyê*** de li ser *'binkeyên sanayîya leşkerî'* bû, ku tê de dihat idîa kirin ku **Eisenhower** wekî pêşengekî ji **Goodman** bêhtir hêjayî bawerîyê ye.

Beşa *'Alternatîvên Bêalîkarîmayînê'* bang li xwendekarên dilsoz dike ku li deverên ku bi deryaya xemsarîyê û materyalîzma ji halê xwe razî hatiye dorpêç kirin, stratejîk werin bi cih kirin. Çawa bandor li ser guherînê bê kirin? *"di dibistan û zanîngehên li seranserî welêt, çepeke mîlîtan dikare hevdilên xwe hişyar bike"* (lê belê taybetmendîyên çepeke alîgir nehatiye dîyar kirin.) " Ew (çepa nû) divê teşe bide hestên bêalîkarîmayîn û xemsarîyê, da ku pê bikarin çavkanîyên siyasî, civakî û aborî yên pirsgirêkên xwe bibînin... Lê belê pireya bo îqtîdara siyasî, dikare bi rêya hevkarîyeke rasteqîn a herêmî, neteweyî û navneteweyî ya navbera çepa nû ya ciwanan û *Civata Alîgiran,* ku hişyar dibe, were ava kirin".

Tiştê ku di daxuyanîyê gelek tê pêş bawerîya bi demokrasîya beşdarîyê ye -têgihek ku ji civaknasê radîkal **C. Wright Mills** hatiye stendin- û wekî bersiva her tiştî tê dîtin. Bi tecrûbeya pêncî salan em niha dikarin li xweşbînîya daxuyanîyê bibişirin, ya ku dibêje çawa ewqas hêsan em dikarin *'atomê zexim bikin'* û li her derê reaktoran ava bikin, mîlîtarîzmê têk bibin û enerjîya hêsan û erzan hilberînin. Daxuyanî bi awayekî enerjîk tirseke ji ber Almanyayeke yekbûyî radigihîne û vê yekê bi bawerîya ***'Dîwar'*** û ***'Şerê Sar'*** ê mayînde destek dike. 'Sanayîdarkirina Dinyayê' wekî meseleyeke 'esaletê' tê dîtin û bawer dikin ku divê Amerîka teknolojîya xwe bi comerdî par ve bike.

### Nebûna berdewamîyê

Lê belê, di nav ewqas dilpakîyê de divê em wê yekê jî bibînin ku di axaftina **Port Huron** a sebaret bi ***Şerê Sar*** bandoreke çawa li ser çepgirên kevin ên wekî **Michael Harrington** û **Irving Howe** heye ku wekî rewşenbîrên New Yorkê tên bi nav kirin. (4) Ên bihêrsketî *Daxuyanî* rexne kir, ku ew bi ecemîtîya ciwanîyê potansîyela şerût a Yekîtîya Sovyetan piçûk dibîne û wan têkilîyên xwe yên dezgehî yên digel SDSê birîn. Li vê derê, di nav herdu serdeman de xeteke cudaker hebû. Yek ji wan ew bû ku nifşekî nû peyda bû ku heta dawîya salên 1960ê Împaratorîya Amerîkî, wekî ku bi qasî Yekîtîya Sovyetan xebîs be, şermezar bikira.

Ev der ne cihê wê ye ku heta parçebûna wê ya wekî koman, ên wekî ***Wethermen*** a sala 1969ê merhele bi merhele vebêjim. Heta merheleya niha SDS di dehsalan re derbas bû, ku piranî bi nivîsan stratejîya bingeheke bilind ava kir; li gor dîrokên SNCC, yan jî ***Panterên Reş*** serketinên xwe bi awayekî mubalexe kirin, ku serokên wan koman nedikarîn bi nêzîkbûneke akademîk binivîsin ji ber ku piranîya wan ji alîyê polîsan ve hatibûn kuştin. Pêta di hişê wî zilamî de, ku serê pêşî reşnivîsa Daxuyanîyê nivîsî, çi bû? Di 1964ê de **Tom Hayden** li *Newarka New Jerseyê* civatên xizan bi rêk dixist, piştî çend salan ew digel jina xwe **Jane Fonda** çû Hanoiyê û paşê jî bû endamê hilbijartî ya qanûnçêkera dewletî ya Kalîfornîyayê.

Di domahîya çar mehên çûyî de me şahidîya tevgera ***Dagîrkirina Wall Streetê*** (OWS) û kampên wan ên li seranserî welêt, ji New Jerseyê heta Oaklandê kir, ku niha ji alîyê polîsan ve hatine belav kirin. Berdewamîya wan a rewşenbîrî û rêxistînî nebûn. SDS dikarî xeteke fikra **Marks**, ên dema wî ya destpêkê û fikrên salên şêstî yên **Frantz Fanon, Paolo Freire, Gunnar Myrdal** bişopîne. Lê belê niha zehmet e ku di navbera SDS û OWSê de domdarîyek were dîtîn -dibe ku ev yek ji ber veguherîna kapîtalîzma amerîkî û berjêrçûna çepa rêxistî be. Nivîskarên ***Daxuyanîya Huronê*** xwe wekî pêtên berxwedana tenê ya şevên tarî yên xemsarîya amerîkî didîtin. OWSî xwe wekî nûnerê 99 dersedî ya li hember 1 dersedî dibînin.

### "Wijdanên me yên rizîyayî"

#### *Beşek ji "Danezana Port Huron"*

Em ji wî nifşî ne, ku di nav rehetîyeke dîyar de hatine mezin kirin, îro li zanîngehê qeydkirî ye û bi fikar li dinyaya jê re mîrate maye, dinêre. Dema ku em zarok bûn, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê welatê herî dewlemend û herî xurt ê dinyayê bû: Yekane welatê xwedîyê bombeyên nukleer, welatê ku şerê modern herî kêm zirar lê kirî, mîmareke Neteweyên Yekbûyî ya ku me yeqîn dikir wê bandora rojavayî li seranserê dinyaya me belav bike. *(...)*

Û paşê pêre pêre dema ku em mezin bûn, rehetîya me bi wan bûyeran xira bû ku zêde zivêrker bûn û nedibû mirov wan nebîne. Zilma hîlebarkirî û rûmetşikên a mirovî bi destê mirovan, li Başûr bi têkoşîna li dijî hişkebawerîya nijadperest bi awayekî zelal derket pêş, vê yekê kir ku piranîya me kirasê bêdengîyê ji ser xwe bavêje û dest bi çalakîyê bike. Hukmê fetisînok ê şerê sar, ê ku nîşana wê bombeya nukleer bû, kir ku em bîrewer bibin ku em, hevalên me û bi mîlyonan "kesên din" ên neberbiçav ên ku ji ber rastîya xistina me ya tehlûkê ya hevpar, dikarîbûn aniha, yan jî kêlîyeke din bimirin. *(...)*

Van rastîyan û yên din çiqasî zêde êriş dianîn ser me, wijdanên me serûbinî hev dikirin û vediguherîn pirsgirêkên bi me ve girêdayî; me jî ewqasî dest pê kir, çavên xwe li nakokîyên dilnerehetkir ên amerîkaya xwe vekin. *(...)* Hisa ku dibêje, dibe ku em nifşê dawîyê bin ê ku wê bi jîyanê tamişkî bibe, pêşengîya çalakîya me dike. Lê belê em hindikayîyek in: Piranîya mezin a gelê me hevahengî û tewazûna demî ya civaka me û dinyaya me weke çerxekê dibîne ku şaş nabe û heta hetayê wê dewam bike.

**A. C.**

* Hevgerînendeyê ‘’malpera agahîyên alternatîv’’ a www. counterpunch.org

1 Bi awayekî sergirtî îşaret bi Danezana Serxwebûna Dewletên Yekbûyî tê kirin.

2 John F. Kennedy, sê rojan piştî hatina ser wezîfeyê, rabû rahişt mîrasa retorîk a selefê xwe. "Sazûma eskerî-pîşesazîyî" li gel vê yekê, berevajîyê vê rewşê, wê ji holê ranebûya. Kennedy pir bi hesasî tevgeriya ji bo "derengmana amerîkî" a di warê fuzeyên balîstîk de telafî bike –helbet ev derengmaneke xeyalî bû, ji ber ku Yekîtîya Sovyetan ancax di 1960ê de karî bibe xwedîya heman cure fuzeyan.

3 Piştî ku di 1960ê de hat weşandin, *Growing Up Absurd* ("Mezinbûna bi awayekî tewş") bi lezeke mezin li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bû pirtûka herî zêde firotî, berîya ku li gelek welatên Ewropayê jî (Almanya, Îtalya) serkeftineke mezin bi dest bixe. Lê belê tevî vê çendê jî, ew li Fransayê qet nehat weşandin.

4 Koma ronakbîrên di nîvê sedsala XXemîn de bi gewde bû, marksîst e, lê bi çavekî rexnegirî berê xwe dide Yekîtîya Sovyetan.

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

# ÇAND Û HUNER

BI PROF. DR. CELÎLÊ CELÎL RE
LI SER XEBATÊN KURDNASÎYÊ HEVPEYVÎNEK

# Kurtedîroka kurdnasîya li Sovyetê

SEYÎDXAN KURIJ *

**Prof. Dr.** Celîlê Casimê Celîl di 1940ê de li Êrîvanê hatiye dinyayê û heta sala 1992yê li zaningehên cur bi cur yên li KYSS li ser dîroka tevgera azadîxwaz a Kurdistanê lêkolîn kirine. Birêz Celîl piştî ruxandina KYSS warguhêzî Awusturyayê bûye û xebatên xwe yên kurdnasîyê li bajarê Wienayê domandiye.

Em di gulana 2011ê de bi hev ra beşdarî konferansa kurdolojî ya Zanîngeha Hekarîyê bûn. Min ev hevpeyvîn li Hekarîyê pê re kir.

**Tu dikarî behsa xebata xwe ya di warê kurdnasîyê de bikî?**

Min di 1954ê de li Ermenistanê xwendina xwe ya deh salî temam kir û heman salê jî bo Zanîngeha Êrîvanê fakulteya dîrokê hatim qebûl kirin. Min ji 1954ê heta 1959ê di fakulteya dîrokê de beşa dîroka giştî ya Ermenistanê xwend. Esas min dixwest ez beşa Îranî bixwînim, lê wê salê beşa Îranî xwendevan nedigirtin. Min di dema xwendinê de xwe dabû ser kurdnasîyê. Li serenserî Sovyetê, wisa jî li Ermenistanê di hemû unîversîteyan da hevalbendîya zanyarîyê ya xwendevanan hebû. Ew hevalbendî di zanîngeha me da jî hebû. Ji sala pêşin ez bûm çalakvanekî vê hevalbendîyê. Me her sal konferansa zanyarîyê pêk dianî. Her carê li vir min di derheqa dîroka Kurdistanê de gotarek pêşkeş dikir.

**We di fakulteya dîrokê ya Ermenistanê de li ser tevgera Şêx Ubeydullah teza xelaskirina fakulteyê nivisî?**

Belê, êdî min dikaribû di warê kurdnasîyê de xebat bikira, lewra tiştekî nû bû. Heta hingê di derheqa tevgera Şêx Ubeydullah de tu xebat nehatibû kirin. Min li hemû çavkanîyên heyî kola, xebateke zanistî û objektîf amade kir. Lewra fakulteyê teza min a bilind qebûl kir. Min di 1959ê de li Êrîvanê Fakulteya Dîrokê xelas kir.

Berî çend salan di Akademîyên Moskova û Lenîngradê de kursîyên kurdnasîyê hatibûn damezirandin. Birayê min **Ordîxanê Celîl** jî pey xelaskirina fakulteya filolojîyê, ango ya edebîyatzanîyê ya Unîversîteya Êrîvanê, çûbû Lenîngradê. Pêşîyê Ordîxan li Ermenistanê di Akademîyê da bû, ew ji bo xwendina bilind, ango doktorayê çûbû Akademîya Lenîngradê. Ewî têza xwe ya doktorayê li cem akademîk **Î. A. Orbellî** li ser ***Kela Dimdimê*** dinivîsî. Gava li Lenîngradê kursî bona dîroka kurda vebû, Orbellî xwast ez biçim Lenîngradê beşa kurdnasîyê de xwendina xwe berdewam bikim. Min teza xwe şand Akademîyê. Şêwra Zanistî ya Akademîyê xebata min nirxand û biryar da kû xebatek hêja ye û ez di warê kurdnasîyê de xebatên xwe bidomînim.

**Di Akademîya Êrîvanê de beşa kurdnasîyê hebû?**

Belê, di Akademîya Êrîvanê de çend kurdzan hebûn, lê wan li enstîtuyên cihê cihê kar dikir. Wek mîsal **Hecîyê Cindî** di Enstîtûya Edebîyatê de, **Emînê Evdal** di Enstîtûya Etnolojîyê de, **Ordîxanê Celîl**, wek asîstan di Enstîtuya Dîrokê de kar dikir. 1957ê li Akadêmîya Zanistî ya Ermenistanê Sektora Rohilatzanîyê hat vekirin. Tevî beşên tirkolojî, îranîstîk û yên mayîn, beşa kurdzanîyê jî vebû û hemû kurdzanên belabûyî civandin, wekî tevayî di vê beşê da kar bikin.

Ez di sala 1959ê de çûm Lenîngradê min li ser tevgerên azadîxwaz ên kurd yên ji sala 1850 heta 1880yê lêkolîn kirin. Netîceya lêkolînên xwe min wek teza doktorayê pêşkeşî Şêwra Zanistî ya Akademîyê kir. Di sala 1963yê de teza min hat pejirandin û min mafê doktorîyê wergirt.

Beşek ji xebata min ya doktorîyê bi navê ***Serhildana Kurda ya Sala 1880***, ango li ser serhildana **Şêx Ubeydullahê Nehrî** li Moskovayê wek pirtûk di 1966ê da hat çap kirin.

Di 1964ê da ez vegerîyam Êrîvanê û min li beşa kurdzanîyê dest bi xebatê kir. Ermenî li ser dîroka Kurdistanê ya berî Yekemîn Şerê Cîhanê pir hesas bûn. Gava navê tirkan û kurdên Bakurê Kurdistanê dihat gotin, ew pir eciz dibûn, lewra ewana tirk û kurdên bakur wek dijminên xwe didîtin.

***Min li Ermenistanê di rojnameyekê de li ser pirtûka Xalfîn bi rûsî nirxandinek nivîsî. Di nivîsara xwe de min bi erênî behsa pirtûka Xalfîn kiribû. Berî ku ez werim Akademîya Êrîvanê kar bikim, komîsyonek amade kiribûn û bi gef û hêrs pirtûk wek lêkolîneke şaş û bi çewtîyan ve dagirtî nirxandibûn***

Ji ber wê, gava ew pirtûka min li Moskvayê hat çap kirin, li Êrîvanê dijminatîyekê li dijî min dest pê kir. Lewra min **Şêx Ubeydullah** wek serokekî kurdan, wek kesekî neteweperwer, serokek, ku ji bo azadî û serxwebûna kurdan serî hildaye, nîşan dabû. Wan digot, Şêx Ubeydullah feodal e, paşverû ye, şêx e, nikare serokatîya tevgereke neteweyî bike. Di nav ermenîyên ku dijîtîya min dikirin, yek-du kurd, hevkarên min jî hebûn; wan nangermî dikir û piştgirîya wan dikirin.

Min du salan (1964-1966) di Akademîya Êrîvanê de li ser dema osmanîyan xebat kir. Ez di xebata xwe de li ser rewşa polîtîk, aborî û sosyal a kurdan a salên 1800-1850ê sekinîm. Salên lêkolînê ji bo min demek dijwar bû, lewra li gor dîtina ermenîyan, kurdan wê demê ermenî zêrandine, bindest kirine.

Zanayên ermenî hemberî dîroka Kurdistanê ya berî Şerê Cîhanê yê Yekem hesas bûn. Di sala 1963yê da li ser dîroka Kurdistanê, pirtûka **H. A. Xalfin** ya bi navê ***Tekoşîn ji bo Kurdistanê*** hat çap kirin. Min li Ermenistanê di rojnameyekê de li ser pirtûka **Xalfîn** bi rûsî nirxandinek nivîsî. Di nivîsara xwe de min bi erênî behsa pirtûka Xalfîn kiribû. Berî ku ez werim Akademîya Êrîvanê kar bikim, komîsyonek amade kiribûn û bi gef û hêrs pirtûk wek lêkolîneke şaş û bi çewtîyan ve dagirtî nirxandibûn.

**Komîsyonê çima nirxandineke negatîf li ser pirtûka Xalfîn kiribû?**

**Xalfîn** li ser dîroka Kurdistanê, li ser serîhildanên kurdan ji bo azadî û serxwebûnê bi awayekî objektîf nivîsîbû. Ewî serîhildanên kurdan erênî û wek tevgerên neteweperwer, tevgerên ji bo azadî û serxwebûnê nirxandibû. Xalfîn dostê kurdan bû. Ew dîtinên Xalfîn ne bi dilê zanyarên ermenîyan bû.

Li Êrîvanê piranîya kurdên ku di warê dîrokê de kar dikir, li ser dîroka nû, salên piştî şerê cîhanê yê yekem kar dikir. Wek mînak, **Karlanê Çaçanî** li ser dostanîya kurdan û ermenîyan lêkolîn çêdikir, **Şerefê Eşîr** û **Şekroyê Xudo Mihoyan** li ser tevgera kurdên Kurdistana Başûr kar dikir, **X.M. Çetoyev** li ser kurdên Sovyetê dinivîsî.

Min teza xwe ya profesorîyê di sala 1991ê de li Moskovayê pêşkêş kir. Teza min li ser ***"Dînamîk û Qedemgirtina Tevgera Azadîya Kurdistanê ji Sedsala Nozdem Heta Şerê Cîhanê yê Yekem"*** bû.

**Tu di teza xwe de li ser çi sekinî?**

Wek ji navê teza min jî tê fam kirin, ez li ser dînamîka li ba tevgera kurd sekinîm. Wekû tê zanîn tevgera kurda ya nû bi dîroka mîrnişînan dest pê dike. Hingê mîran serokatîya tevgerê dikir. Mîran dixwast sînorên xwe û desthilatdarîya xwe berfireh bikin û dewleteke ava bikin. Piştî hilweşandina deshilatdarîya mîrnişînan, serokatîya tevgerê ket destê şêxan. Dûra di dawîya sedsala nozdeh û destpêka sedsala bîstê de tevgera kurdan ber bi neteweperwerîya modern diçe, edî rewşenbîrên kurd rola xwe dilîzin, kovar û rojnameyan derdixin, rêxistinan ava dikin, bernameyên neteweyî didin ber xwe.

Tevgera dawî ya berî Şerê Cîhanê yê Yekem ***"Serîhildana Bedlîsê"*** bû , di 1914ê de, ku min nivîsî û ez li wir sekinîm. Lê ew teza min nehat çap kirin.

**Min li ser serîhildana Bedlisê nivîsarên te xwendine.**

Rast e, salên nodî min ji bo kovara ***Armanc***ê çend nivîsarên balkêş nivîsîn. Di nav wan de li ser serîhildana Bedlîsê jî nivîsar hebûn. Di pirtûka min de ku nehîştin li Ermenistanê çap bibe, behsa serîhildana Bedlîsê heye. Ermenîyan dixwast ez wê beşê jî ji pirtûkê derxim. Şertek jê ew bû. Wan digot, ew serîhildan li hember ermenîyan bûye. Li ser wê min bi navê ***"Nirxandina Serîhildana Bedlîsê bi Çavkanîyên Ermenîyan"*** nivîsarek bi ermenî weşand, îzbat kir ku dîtinên wan ên li ser serîhildanê çewt in. Li ser vê nivîsara min, ew îqna bûn, kû serîhildana Bedlîsê ne li dijî ermenîyan, lê li dijî tirkan bûye.

***Lê piştra gazî min kirin, gotin, divê tu cumleyekê li pirtûkê zêde bikî. Min got, çi ye? Gotin, divê tu binivîsî ku şeş wîlayetên osmanîyan, erda Ermenistana dîrokî ye. Ew wîlayetên Wan, Bedlîs, Hekarî, Dîyarbekir û yên mayîn bûn, ku dihatin digihîştin heta Rewandûzê. Min ew qebûl nekir.***

Min lêkolîna xwe ya yekem li Êrîvanê di salên 1964-1966ê de nivîsîbû. Li Ermenistanê çap nekirin, min şande Moskovayê, li wir weşandin. Lêkolîna duda di navbera salên 1966-1968ê de nivîsî. Nivîsa min, birin, anîn, rexne girtin, lê dawîyê di 1979ê da qebûl kirin ku wek pirtûk çap bikin û ji bo wê dan çapxaneyê. Lê piştra gazî min kirin, gotin, ***divê tu cumleyekê li pirtûkê zêde bikî.*** Min got, çi ye? Gotin, divê tu binivîsî ku şeş wîlayetên osmanîyan, ku ji bo xaçparêzan divê reform bihata pêk anîn, ew erd erda Ermenistana dîrokî ye. Ew wîlayetên Wan, Bedlîs, Hekarî, Dîyarbekir û yên mayîn bûn, ku dihatin digihîştin heta Rewandûzê. Min ew qebûl nekir.

**Ji wan 6 wîlayetan qesta te Peymana Berlînê (13 Tirmeh1878) ye?**

Belê, di bin desthilatdarîya Osmanîyan de rewşa xaçparêzan nebaş bû. Hem desthilatdarên Dewleta Osmanî, hem jî feodalên kurd û selefxurên ermenî zilm li wan dikirin. Ji alîyê din ve manîfaktur, sen'etkarî di destê wan da bûn, ewana bi giştî karên tîcaretê û fînansê dikir, banka û karûbarên peran di destê wan da bûn, wan bi faîz pere didan.

**Paşê te ew pirtûk da çap kirin?**

Belê, wê demê **Bavê Nazê**, **Dr. Welato**, **Qadir**, kurdên ji Sûrîyeyê li Moskovayê hîn dibûn. Wan hersêkan lêkolîna min wergerandin erebî, wek pirtûk li Şamê (1984), paşê jî li Bêyrûdê (1986) çap kirin. Mînakek destnivîsa xwe min dabû **Enwer Qadir Caf** jî. Ewî wan salan li Lenîngradê li ser **Mewlewî** doktora çêdikir. Wî pirtûk wergerand ser soranî û bi xwe ra bire Stokholmê. Rewşenbîrekî hêja **Elîşêr**, ew pirtûk wergerand kurmancî û çap kir[1].

**Tu dikarî bi giştî behsa xebatên kurdolojîyê yên dema Sovyetê bikî?**

Kevneşopîya kurdolojîyê li Rusyayê dirêj e. Xebatên di warê kurdolojîyê de di destpêka sedsala 19ê de bi xebatên **X. Abovyan**, Alexander Jaba, **I. Bêrêzin**, P. Lerch, **N. Chanîkov**, Bazîl Nîkîtîn, **V.F. Minorski** û yên mayîn dest pê kiriye. Li Rûsyayê Navenda Kurdolojîyê li Akdemîya Zanistî ya Qralîyetê li Petersburgê hebû.

Wekî tê zanîn îngilîzan di destpêka sedsala nozdehem de ji ber berjewendîyên xwe yên siyasî, aborî û leşkerî di warê kurdnasîyê de dest bi xebatê kirin. Wan dixwast kurdan, civata kurdan ji alîyê sosyolojî, dîrokî, etnolojî, olî û ziman û çandî nas bikin. Di destpêkê de piranî kadroyên wan bispor û zanayên leşkerî bûn, piştra kesên zana û mîsyoneran jî di warê kurdnasîyê de hin xebat kirin.

***Rûsan jî di heman demê de li ser kurdan lêkolîn çêkirin û wek pirtûk weşandin. Gava şoreş çêbû û bolşevîk bûn desthilatdar, her tişt sekinî, bû sifir. Her tiştî ji nû va dest pê kir. Piranîya zana û lêkolîneran reviyan çûn derveyî welêt.***

Rûsan jî di heman demê de li ser kurdan lêkolîn çêkirin û wek pirtûk weşandin. Gava şoreş çêbû û bolşevîk bûn desthilatdar, her tişt sekinî, bû sifir. Her tiştî ji nû va dest pê kir. Piranîya zana û lêkolîneran reviyan çûn derveyî welêt.

Desthilatdarîya bolşevîkan li ser her tiştî çarşeva îdeolojîk raxist. Her xebat divê di nav çarçeveya îdeolojîya dewletê de bihata kirin. Di vê çarçeveyê de gav avêtin gelek zehmet bû. Ew destpêkê ne ewqas xeter bû, lê di salên 1930ê de bû xetereke mezin. Alîyekî erênî ya vê çarçeveya îdeolojîk jî hebû. Lewra edî li ser dînamîka tevgerên neteweyî yên kurdan hat sekinandin. Civata kurdî ji alîyê rewşa aborî, sosyal û civakî ve hat nirxandin. Heta wê demê serîhildanên kurdî bi tenê wek kronolojîyê bûn; ango kengê dest pê kir, çiqas ajot, bûyer çi bûn û wek wê. Lê bi tesîra îdeolojîya Marksîzmê li ser sebebên civakî yên serîhildanên kurdî lêkolîn hatin kirin.

Lê tiştek hebû kû ji zanistê dûr bû, ji objektîfîyê dûr bû, ew jî dijîtîya olî bû. Hin nivîsarên li hember olê hatin belav kirin. Wek mîsal nivîsa **Ereb Şamîlov** ya bi navê ***"Derwêşên Kurda"***, ya **Basîlêvskîy** ,***"Rola sêktantîyê û derwîşîzmê ya sosyal-siyasî li Kurdistanê"*** û yên mayîn.

Di salên 1930ê de xebatên zimanzanîyê pir pêşva çûn. **Qanatê Kurdo** di wan salan de xebatên xwe yên li ser zimanê kurdî pêk anîn. Wek kom, di salên 1950yê de li Êrîvanê komek kurdzanîyê hate ava kirin. Li heman demê li Lenîngradê di Enstîtuya Rojhelatzanîyê da di bin serokatîya **I. A. Orbelî** de komeke kurdzanîyê hat damezirandin. Orbeli di dadigeha ***Nurnbergê*** de li ser ***gunehbarîya faşîstên cermenî li hemberî şaristanîya dîrokî û çandî*** raportek peşkeş kiribû. Ew akademîsyenekî gelek bi nav û deng bû, serokê muzeya Ermîtajê bû. Ermîtaj jî wek mûzêya Louvreê û Brîtanîkayê navdar bû. Birca qeyser xanîyê wê mûzêyê bû.

**Li Lenîngradê kîjan kurdzan hebûn?**

Qanatê Kurdo hebû. **Qanatê Kurdo** destê rastê yê **Orbelî** bû. Qanatê Kurdo zimanzan bû, lê kurdzanekî pir fanatîk bû. Xêncî kurdzanîyê li dinyayê tu tişt wî eleqdar nedikir. **Tsûkerman** hebû, zimanzan bû, **M. B. Rudenko** hebû, têza xwe li ser ***Mem û Zînê*** nivîsandibû. Çend destnivîsên kilasîk ên edebîyata kurdî weşandibûn. Du doktorên hêja hebûn, ji wana **Y. Î.Vasîlyêva**, ***Şerefname*** wergerand ser rûsî, yek jî **J.S. Musaêlyan** bû, li ser bîblîyografya kurdî û destxetên kurdî kar dikir. **Qanatê Kurdo** pir nivîsarên balkêş nivîsîn. Di wê demê de kê li ser kurdan tiştek negatîf binivîsanda, Qanatê Kurdo bersîva wî dida.

Di sala 1960ê de **Orbelî** mir, **Qanatê Kurdo** di dewsa wî de bû serokê beşa kurdolojîyê. Piştî salên 1960ê ji Iraqê gelek kurd hatin ji bo doktora kurdolojîyê. Ewana hem li Lênîngradê, hem li Moskvayê û hem jî li Bakuyê cîwar bûn.

**Li Moskovayê jî kurdolojî hebû?**

Berê kurdzan hebûn, lê piştra ku **Primakov** bû serokê ***Enstîtuya Oriyantalîst***, ewî ji kurdzana komek pêk anî. Di nav wan de Profesorên hêja **M.A.Hasretyan**, M.S.Lazarev, **A.A. Xalfîn** û yên mayîn hebûn. Salên 60-70yê êdî li Kurdistana Başûr tevgera netewî ya azadîxwaz a kurdî di bin serokatîya nemir **Mistefa Barzanî** de dest pê kiribû. Enstîtuta Moskvayê projeyeke mezin danî ber me pênc dîrokzanan, wekî em dîroka tevgera kurdan ya azadîxwazîyê, li sedsalên 19 û 20ê binivîsin. Me bi hev ra pirtûk amade kirin û dan çap kirin. [2] Ew pirtûk gelek zanistî ye. Wekî ez dizanim, xêncî me kesî li ser dîroka tevgera Kurdistanê ya hevgirtî û makkirî berî hingê çap nekiribû.

* Rojnamevan

1 *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan*, Weşanxaneya Jîna Nû, 1985, Stockholm, 200 r.

2 Yeni ve Yakın Çaida Kürt Siyaset Tarihi. / SSCB Bilim Akademisi Kürt Komisyonu. (Celîl, Lazarev, Jagalina, Hasretyan, Mihoyan)


# "Kurdish Reader" a Khanna Omarkhali

LOKMAN TURGUT *

Fêrbûn û fêrkirina kurmancîyê tevî gelek pirtûk û xebatên heta îro hatî kirin jî, ne ji bo kurdan û ne jî ji bo bîyanîyên hez dikin fêrî kurmancîyê bibin, têrker nînin. Nexasim bi îngilîzî pirtûka **Baran Rizgar** (1) têra xwe kevin e, ya **Peter Pikkert** (2) jî kurt û zêde sethî ye. Dersên **Michael L. Chyet** ên bi îngilîzî ku hîna weke pirtûk derneçûne, bixwe di warê ravekirina rêzimanê û rêbaza fêrkirinê û danîna dersan de têra xwe xurt in. (3) Ev ders jî di warê şêwaznivîsê de tevlîhev, carinan giran in. Ji ber vê yekê jî dema kesekî bîyanî, nexasim ingilîzîaxêvekî pirsa pirtûkeke baş a fêrbûna kurdî dikir, pirtûka rêzdar **Rizgar** û dersên **Chyet** heke peyda bibûna hêjayî pêşniyazkirinê bûn. Lê belê herdu jî ji bo wan kesan in yên ku nû fêrî kurdî dibin. Beşa diduyan a pirtûka ku li ser malpera Înternetê ya zanîngeha ***Harvard***ê hatî weşadin a **W. M. Thackston** (4) amadekirî bi kêrî kesên hindekî bi kurmancîyê dizanin tê. Lê belê ji bo zimanekî mîna kurmancî pir kêm e. **Khanna Omarkhali** (5) dawîya sala 2011ê li Almanyayê pirtûka xwe ya fêrkirin û berhevoka kurmancîyê ji bo ingilîzîaxêvan çap kir, ev pirtûk dikare kêmasîya di vî warî de hindekî be jî telafî bike û dikare ji bo amadekirina hînkerên ji bo kurdîaxêvan jî alîkar be.

Pirtûka ***"Kurdish Reader: Modern Literature and Oral Texts in Kurmanji*** *(Berhevoka denqên kurdî: Wêjeya Modern û Denqên Devkî yên bi Kurmancî)"* ya **Khanna Omarkhali** (Xanna Omerxalî) li Elmanyayê çap bû. (6) Beşa yekem ji heşt dersan pêk tê û mînakên ji wêjeya modern a kurmancî yên ji deverên cihê dide. Ji beşên *Siya Evînê* ya **Mehmet Uzun** heta bi beşên ji *Şivanê Kurmancan* a **Erebê Şemo**, ji beşên nivîsên **Firîda Hecî Cewarî** heta bi wergera beşeke *Mîrê Piçûk* a **Antoine Saint-Exupéry** di van heşt dersan de derdikevin pêşberî xwendevanan. Li vir helbet divê mirov rexneyekê li **Xanna Omerxalî** bigire, lewra wê di şûna ku wergera fransî ya *Mîrê Piçûk* (7) bi kar bîne, ji îngilîzî ji nû ve wergerandiye kurmancîyê. Ev yek weke rêbaza wergerê, ne di cîh de ye û çewt e. Belê ev çewtî zirarê li cewhera pirtûkê nake. Ev dersên beşa pêşî piştî mînakên ji wêjeyê hin temrînan jî bi xwendevanan dide kirin û dike ku ew çêtir demên lêkerên kurmancî û kesandina wan ji hev derxin.

Beşa duyem ji mînakên axaftin, yan jî berhemên devkî pêk tê. **Xanna Omerxalî** dîsa bi îhtîmam ji her devera Kurdistanê ya ku kurmancîaxêv lê ne, mînak kom kirine, ji Bakurê Kurdistanê, ji Başûrê Kurdistanê, ji Başûrrojavayê Kurdistanê, ji Çîyayê Şengalê, wekî din ji civakên kurd ên li Ermenistan, Turkmenistan, Azerbeycan û Xorasanê berhevokeke pir dewlemend a deqên kurmancîya devkî kom kirine. Di pirtûkê de li dawîya herdu beşan ferhengokên Kurmancî-Ingilîzî hene ku destûrê




dide xwendevanan bêyî bikaranîna ferhengeke din nivîsên di pirtûkê de tê bigihêje.

Beşa dawîyê ya pirtûkê jî ji xetên sereke yên rêzimana kurmancîyê re hatiye veqetandin. Xanna Omerxalî di vê beşê de ji dengsazîya kurmancîyê heta bi kesandina lêkeran, ji daçekan heta bi parkîtan bi zimanekî zelal rave dike û bi vî awayî xwendevanê/a pirtûkê ji gramera kurmancîyê haydar dike. Ev pirtûk ji bo dersdarên kurdî yên ku dersê didin bîyanîyan, nexasim jî ingilîzîaxêvan jî wê piştî polên destpêkê alîkar be, lewra ew ê bike ku bi kurmancîya gelek deveran bihisin û heta bi astekê jê fêm bikin.

Alîyekî din ê hêja yê pirtûkê ew e ku xwendevanên xwe li ser rewşa zimanê ku fêrî wan dike jî agahdar dike. Lewra cih dide pêşgotina Professor **Amir Hassanpour** a der barê rewşa kurdî de. Di vê pêşgotina **Hassanpour** de mijarên weke parçekirina siyasî ya kurdî, têkoşîna standardkirinê û fermîkirinê û dîroka fêrkirina kurmancîyê jî pirtûkê kamiltir dikin. Mirov dikare rêbaza vê pirtûkê li tevahîya kesên bi mijarê re elaqedar pêşniyaz bike.

* Rojnamevan, wergêr, lêkolînerê serbest, nivîskarê pirtûka ***Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekkarî*** (Wêjeya Devkî ya Kurdan a Herêmên Botan û Hekarîyê), Logos Verlag, Berlîn 2011.

1 **Baran Rizgar**, Learn Kurdish. Dersên Kurdî, a Multi-level course in Kurmandji, Bay Foreign Language Books, London 1996

2 **Peter Pikkert**, A Basic Course in Modern Kurmanji, Alev Books 1991

3 Sala 2000ê û 2001ê li Parîsê dema ku nivîskarê vê gotarê li INALCOyê di beşa Lêkolînên Kurdî de xwendekar bû, hingê Chyet bi van dersên amadekirî ders dida. Ev ders hem bi îngilîzî û hem jî bi fransî li ber destê wî hazir bûn

4 **W. M. Thackston**, Kurmanji Kurdish- A Reference Grammar with Selected Readings, li ser malpera http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_complete.pdf

5 **Khanna Omarkhali** (Xanna Omerxalî) li zanîngeha Gottingenê li Almanyayê di beşa Îrannasîyê de dersên kurdî dide û li ser mijara dîroka êzîdayetîyê de jî bispor e. Nivîskara pirtûka Êzdîyatî, weşanên Avesta, Stenbol 2007ê ye

6 Kurdish Reader: ***Modern Literature and Oral Texts in Kurmanji***, Harrasowitz Verlag, wiesbaden 2011, buhayê wê 29.80 euro ye

7 Bi navê ***Mîrzayê Piçûk***, Fawaz Husên ev pirtûk ji fransî wergerandibû û sala 1995ê di nav weşanên Nûdemê de derçûbû

## KURMANCÎYA 86 SAL BERÊ

# Kitêba "Grammaire Kurde"

MAHMÛD LEWENDÎ *

Nivîskarê kitêbê **Paul Beidar** e. Paul Beidar (**1887-1974**) papazekî keldanî ye. Ew gelek salan li Kurdistanê bi taybetî jî li herêma Bohtan û Behdînan li bajarên Cizîrê û Zaxoyê maye.

Nivîskar di vê kitêba xwe de ku bi fransî ye, li ser devoka kurmancîya Zaxo û Cizîrê rawestîyaye. Nivîskar di kitêbê de ji bo tekstên kurdî, alfabeya fransî bi kar anîye. Bo nimûne ji bo hin dengên kurdî weha nivîsîye:

| | |
|---|---|
| Ç | ***tj*** *(tjav:* ***çav****)* |
| Ş | ***ch*** *(chach:* ***şeş****)* |
| I | ***e*** *(mene:* ***min****)* |
| X | ***kh*** *(hhwa:* ***xwe****, khalace:* ***xelas****)* |
| Y | ***i, y*** *(yazda:* ***yazde****)* |
| S | ***c,*** *(kac:* ***kes****)* |
| E | ***ei, e*** *(cheir:* ***şêr****)* |
| E | ***a, e*** *(char:* ***şer****)* |
| C | ***j, g*** *(jar:* ***car****, giran:* ***cîran****)* |
| Û | ***ou*** *(dour:* ***dûr****, bou:* ***bû****)* |
| Î | ***y*** *(peinjy:* ***pêncî****)* |
| K | ***k, q*** *(ketab:* ***kitab****)* |
| Q | ***k, q*** *(akel:* ***aqil****)* |

Kitêb ji 8 beşan pêk hatîye. Di her beşî de bi kurdî tekstek dirêj û gotinên pêşîyan hene. Di beşê ewil de behsa alfabeyê dike ku li gor wî di zimanê kurdî de 33 deng hene.

Her heşt beşên kitêbê ev in:

1- Alfabeya Kurdî
2- Navdêr *(Le Nom)*
3- Rengdêr *(L'Adjectif)*
4- Cînav *(Le Pronom)*
5- Hejmar *(Le Nombre)*
6- Adverb, preposition, conjonction
7- Lêker *(Verbe)*
8- Helbesta Kurdî

Nivîskar li dawîyê cih daye ferhengokeke piçûk a kurdî-fransî (nêzîkî 800 peyv). Di kitêbê de 7 tekstên dirêj hene ku sernavên wan weha ne:

***1- Bohtan û Behdîna***
***2- Hakimek Zalim***
***3- Eşqîyayek***
***4- Mîrek û Marek***
***5- Mîr û Cotyar***
***6- Pira Zaxoyê***
***7- Wesîyeta Bavê***




*(Paul Beidar, Paris, 1926, 76 r.)*

Ligel wergera wan a fransî, nivîskar şerha naveroka tekstan jî kirîye daku ji alî xwendevanên fransî ve baştir bêt fêmkirin. Her weha piştî her tekstê an hin gotinên pêşîyan, li gor mijara tekstê behsa hin adet û toreyên kurdan jî kirîye. Bo nimûne, di rûpela 9an de piştî werger û şerha tekstê, piçekî ji alî dîrokî behsa mîrên Bohtan û Behdînan dike. Dîsa di rûpela 15an de behsa giringîya qelen dike û dibêje ku li nav kurdan qelenê keçekê (li gor salên 1925ê) nêzîkî 4000 frankî ye.

Di rûpelên 60, 61, 62an de jî behsek xusûsî li ser nêzîkîya zimanê kurdî û fransî ye. Nivîskar gotinên kurdî û fransî yên ku wek hev an nêzî hev in dane hember hev, ji wan hinek ev in:

| Kurdî | Fransî |
|---|---|
| min | *mon* |
| te | *ton/te/tu/toi* |
| wî | *lui* |
| pîyê min | *mon pied* |
| qîrîn | *crie* |
| pol | *epaule* |
| roj/rûj | *jour* |
| kengî? | *quand?* |
| ser | *sur* |
| pê/pî | *pied* |
| lêv | *levre* |
| kurt | *court* |
| didan | *dent* |
| kî | *qui* |
| ku | *que* |
| tu | *tu* |
| gran | *grande* |
| vêt (inf. viyan) | *veut* |
| mirin | *mourir* |
| no/na | *non* |
| ne/na/ni | *ne* |
| du | *deux* |
| şeş | *six* |
| heft | *sept* |
| neh | *neuf* |
| deh | *dix* |
| yazde | *onze* |
| dozde | *douze* |

Di kitêbê de ligel tekst û gotinên pêşîyan bê guman tiştê herî girîng ew e ku nivîskar navê 12 mehên salê nivîsîye (r:58) ku îro jî di nav xelkê de bi piranî her ew nav tên bikaranîn. Lê, îddîa wî ew e ku bêyî ***Gulan*** û ***Tebax***ê navên mehên din hemû ji zimanê asûrî hatine girtin (r:58).

Li gor **Paul Beidar** û **Maurizio Garzonî** (1) nivîsîne di nav kurmancan de navê her donzdeh mehan ev in:

| **P. Beidar** (1926) | **M. Garzoni** (1787) | **Fransî** |
|---|---|---|
| **Adar** | Adar | *Mars* |
| **Nîsan** | Nîsan | *Avril* |
| **Gulan** | Gulan | *Mai* |
| **Hezîran** | Xezîran | *Juin* |
| **Temûz/Tîrmeh** | Tîrmeh | *Juillet* |
| **Tebax** | Tebax | *Août* |
| **Îlon** | Êlûn | *Septembre* |
| **Çirîya Ewil** | Çirîya Pêşî | *Octobre* |
| **Çirîya Paşî** | Çirîya Paşî | *Novembre* |
| **Kanûna Ewil** | Kanûna Piçûk | *Decembre* |
| **Kanûna Paşî** | Kanûna Mezin | *Janvier* |
| **Sebat** | Swat(Suat) | *Fevrier* |

Dîsa li gor nivîskarî, di nav kurdan de ji bo her mehekê mamik (helbest) an stiranek hatîye çêkirin, her wekî:

***1. Kanûnê*** *w Kanûnê*
*Berf têt ji 'uzmanê*
*Qirra 'ebd û însanê.*

***2. Sebat*** *e, çi şer e w çi şewat e*
*Xwezî nêv meha da nehate.*

***3.*** *Hijdê bi* ***Adarê***
*Melyaket têt xwarê*
*Gazî dikit beharê.*

***4.*** *Tavîya* ***Nîsanê***
*Hêja ye malê Xurestanê.*

***5.*** *Heyva* ***Gulanê***
*Xweyê reza bi kul û kovanê.*

***6.*** *Yazdê bi* ***Hezîranê*** *serê havînê*
*Berê xwe bide zivistanê.*

***7. Temmûz*** *û* ***Tebaxê***
*Agir digirit axê*
*Dû dirabit ji şaxê.*

***8. Îlonê*** *zik têr e*
*Û dunya xêr e.*

***9. Çirîyê*** *w Çirîyê*
*Mal teyr û tajîyê*
*Mirov dibin xweşîyê.*

Li ser demsalan jî ev mamik hene:
*Bi* ***pahîzê*** *zû dake. Bi beharê zû rake.*
*Em hatin pahîza. Çêkin cihê 'ezîza.*

***

***Zivistanê, t****engava ber mirinê.*

***

***Beharê,*** *bereket têtе xwarê*
*Xelk dibin şikirdarê.*

***

***Havînê,*** *teyr gazî dikin meydanê*
*Borî roja Remezanê.*

Wekî me behs kir ku 7 tekst di kitêbê de hene. Ji wan, yeka ku li ser şerê mîrên ***Bohtan û Behdînan*** e, em bi herfên kurdîya îroyîn dinivîsin.

*Bohtan û Behdîna*
*Carek Mîrê Bohtan û Mîrê Bahdîna bi şer çûn. Her dû xwe pêk înandin bo derbek mezin. Cih(?) rabû ser piya û hewar çû hemî erda. şerrek giran qewimî. Mîrê Bohtan eskerek boş rakir û bir ser Bahdîna û mîrê wî cihî hat pêşîya û (wî?) herdû eskera hucûm kirin. Qawxek mezin çêbû. Erd mişt bû ji laşa û xwîn çû wek robara. Lawên Bohta hunera kirin, ê lê bi dûmahîkê şikestin û bû revek 'amî. Lawên Behdîna pê ketin bi qir û kuştinê û êleg nebû da (şer-N.M.) qut bikin. Wextê Mîrê Bohta ew dît sekinî, li xwe zivirî û gazî kir Mîrê Behdîna: "Mîr ji me vebe û bes were pê me, namûs ew e mirov hevalê xwe bişkênit, şerm e bo mîrek wek te xelkê şikestî biqelînit!" Dema ev qise Mîrê Behdîna bihîst, dilê wî şikest û halan-emir da bo eskerê xwe da bisekinin û ji Bohta vebin û rê dan wan xwe xelaskin.*

Herweha di kitêbê de 44 gotinên pêşîyan jî hene, çend nimûne ji wan:
*1-Yê girtî bi şîrî, bernadit bi pîrî. 2-Ne malê pirr û ne gerdenê stûr. 3-Yê xêrê naçin dêrê. 4-Pezê nêr bo kêr. 5-Yê nû hat, yê kevn dan xelat. 6-Dev dixwit, çav şerm dikit. 7-Kî ji nîverê bizivirit ne poşman e. 8-Yê ne li ber çav e, ne li ber dil e. 9-Şev êk e w diz hezar in. 10.Hindî pitir e, çêtir e. 11-Navek giran û gundek wêran. 12-Daweta mîra w agir ket feqîra. 13-Dewlet bi lez, rez û pez. 14-Aşê nezana Xudê digerînit. 15-Xudanê lezê her poşman e.*

*Zimannas, nivîskar

1 **Garzoni, Maurizio**; Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda, Roma, 1787, r: 56-57

www.zaravakurdi.org

# Înstîtutên Kurdî

Jan Bada

Înstîtut ji têgeha latînî *Instituere*, "damezirandin, saz kirin" tê û piranî di nav çarçoveya zanîngeh, akademîyan de cîyê xwe digire. Wek sazîya lêkolîn û zanistê ji bo bêşên cuda yên lêgerînê tê damezirandin.

Peyva înstîtutê wek "enstîtu" ketiye zimanê kurdî û yên Rojhilatê Navîn. Nasîna lêgerînên, lêkolîn û zanistîyên çand û zimanê kurdî bi sazîyên wek înstîtut ne xwedîya demeke dûredirêj e. Li gelek herêmên Kurdistanê xebatên zanistî bi navê "korî zanistî, kom, komik, komele" pêk hatine, peyva akademî jî ji peyva înstîtut hîn bêhtir tê nas kirin.

Ferqa înstîtut ji kom, komele, komik, civîn, ew e ku înstîtut zêdetir di beşên lêkolînî de tên bi kar anîn: Sazîyên bi awayê înstîtut hertim bernameyekê, rojevekê datînin pêş xwe ku li ser wê yekê kûr bibin, zelalîyekê peyda bikin. Ev yek dikare li ser gelek beşên cûr bi cûr be: Lêkolînên siyasî, stratejîk, aştî, ziman, wêje; li ser beşekî civakê mîna "gender", jin, perwerde, dîrok, civak, kevneşopî, derûnî, arkeolojî ûwd. Li ser çi be jî, lêgerîn û lêkolîn tê de heye.

Ev peyv herî zêde di dema vebûna "Institute Kurde de Paris" de ket rojev û zimanê kurdî. Dema ***Enstîtûya Kurdî ya Parîsê*** (1983) hat damezirandin, ji bo gelek kurdên akademîsyen (ku wê demê hejmara wan li dervayê welat kêm bû) hêvîyek peyda kir, gelek kesan nasnameya xwe pê re dît, helecan ket nav civakê; di wê demê de sazî, dezgeh û komeleyên kurdan gelek kêm bûn. Piştre gelek kesên siyasî, nivîskar, hunermend û rewşenbîr mecbûr man ku welatê xwe biterikînin û derkevin derva. Vê yekê bingeha gelek sazîyan û xebatên siyasî derxist holê. ***Enstîtuya Kurdî ya Brukselê*** (1989) (1) ji nav komeleyeke civakî derket û dest bi karê lêgerîn û amojgarîyê kir.

Lê berfirehbûna nasîna înstîtutê wek têgeh di nav girseya kurd de ma heta dema vebûna ***Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê*** (1992). Ji wê şûn ve ***Înstîtuta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist*** (1994) li bajarê Berlînê hat damezirandin û ev înstîtuta yekem e ku ne li gor navê bajarekî hatiye bi lêv kirin, xwe beşê bi ***Lêkolîn û Zanistê*** sînordar kiriye, lê ji hînbûnê ye ku kurd jê re jî dibêjin ***Enstîtûya Kurd ya Berlînê***. Paşê ***Înstîtuta Kurdî ya Stockholmê*** (1996) ji alîyê ***Înstîtuta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist*** hat damezirandin. ***Enstîtuya Kurdî ya Amedê*** (2004) ***Enstîtuya Kelepûrê Kurdî-Kurdish Heritage Institute***, Silêmanî û Duhok, (2003) hatin damezirandin. ***Institut für Kurdische Studien-Înstîtuta Lêkolînên Kurdî*** di 1988ê de hatiye ava kirin, lê fermî di 1995ê de hatiye damezirandin.

Hemû înstîtutên kurdî bi helwesta xebatên lêkolîn û zanistî ji bo çand û zimanê kurdî hatine damezirandin û gelek ji wan jî di karên xwe de serkeftî bûne; di vê derbarê de gelek berhem anîne holê. Fêr û têgihîştina girseya kurdan bi gelemperî ferq nexistiye navbera komele û înstîtutan, lê di salên dawîyê de ev yek hatiye guhertin û înstîtutên ku berhemên lêkolîn û zanistî nedane, zêde nehatine pejirandin. Piştî vebûna pergalên medya û ragihandinê bi taybetî jî televîzyon û pêşketina bikaranîna Înternetê rûmetdarîya dezgehên pişe û beşesaz zêdetir bûye.

Têgihîştina ji çîrok û dîroka devkî ber bi ya nivîsandi, belgekirin û girîngîya alavên hişmendîya netewbûnê rê li ber girîngîpêdana xebatên rewşenbîrîyê vedike û ev yek dide zelal kirin ku bê kar û xebatên raman, lêkolînên civakî û perwerdeya mirovan, pêşketin û serfirazîya gelan çênabe. Ev yek li tenişta sazî û dezgehên din, rola înstîtutan jî ronî dike.

1 Di Cotmeha sala 1978ê de, bi navê Têkoşer - Yekîtîya Karker û Xwendekarên Kurd li Belçîkayê û paşê di gulana 1989ê de, bi navê Enstituya Kurdî ya Brukselê ava bûye û ji alîyê wezaretên çandê ya fransizî (Herêma Civaka Fransiz li Belçîkayê) flamanî (Herêma Flaman li Belçîkayê) ve di nav çarçewa "perwerdekirina gelemperî ya daîmî" de, bi awayekî fermî hatiye pejirandin û alîkarîya madî distîne. (B. Chend agahdarîyên kurt li ser Enstituya Kurdî ya Brukselê, 30. Kanûn 2010, http://www.kurdishinstitute.be/kurdi/enstitu_kurdi/1785.html)

Enstîtuta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist (Almanya 1994)

Enstîtuta Kurdî ya Amedê

Enstîtuta Kurdî ya Silêmanîyê


## Jîyan bi kurdî xweş e!








# Naverok

SIBAT 2012




Rûdanên dawî li Kurdistanê
Ismail Beşikçi
R. 1

Hewldana çareserîya dîrokê ji bo lihevhatin û demokratîzekirinê
Prof. Dr. Ilhan Kizilhan
R. 1

Piştî Tobin
Serge Halimi
R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
R. 2

Zordar çawa biryarên xwe werdigirin
Joseph Sassoon
R. 5

Lihevkirina Berlînê
Anne Dufresne
R. 6

Tesbîtkirina sînorê jor ê hatinîyê
Sam Pizzigati
R. 7

Ferzkirina bêşê, azadîya geh li jor û geh li jêr
Bernard Friot
R. 8

Kî dixwaze RNYê bixeniqîne?
Anne-Cécile Robert
R. 9

Gava riz dibe berhema diravî
Jean Ziegle
R. 10

Krîz, riya jê xilasbûne ev e?
Laurent Cordonnier
R. 11

Stêrk, mûz û pereyê sexte
Maurice Lemoine
R. 11

Tirkîye û tercîhên welatên rojava
Kendal Nezan
R. 12

"Xaka şewitandî" ya Kurdistanê
Jean-François Pérouse
R. 13

Bi, yan jî bê Twîtter serhildana misirî
Navid Hassanpour
R. 14

Berxwedana tund a sahrayîyan
Olivier Quarante
R. 15

Xanedana Kîm, an jî du laşên qral
Bruce Cumings
R. 16

Li Magrebê, sîberaktîvîst westîyayî ne
Smain Laacher û Cédric Terzi
R. 17

Masîgirek ji Somalîyê di torên dadê de
Rémi Carayol
R. 17

Di nav telekolejên meksîkî de
Anne Vigna
R. 18

Anonymous, ji mîzaha dibistana navîn ber bi çalakîya siyasî
Felix Stalder
R. 19

Sê hîpotez ji bo yek Big Bangê
Aurélien Barrau
R. 20

Danezana ku hindik mabû Amerîkayê biguherîne
Alexander Cockburn
R. 21

ÇAND Û HUNER
R. 22



## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Postcode
Bajar: City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB